# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN - HEJMAR: 0 ÇILE 2020




BINPÊKIRINÊN DEWLETA TIRK LI EFRÎNÊ ........................................

DÎROKA TEVGERA SIYASî YA KURD LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ ........................................

KOÇBERÎ ........................................

WATEYÊN PERGALA EWLEHIYA NIŞTIMANÎ LI BAKUR Û ROJHILATÊ SURIYÊ ........................................

Sernivîser: **Ednan Mistefa**

Edîtorê nivîserê: **Taha Xelîl**

Desteya nivîser:

**Muhammed Kemal - Hejar Şakir - Rakan Şêxî**

Sêwiran: **Azad Mihemed - Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrlsrojava.com

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastiye**

**Hejmar 0 Payîz-2020**

**NAVEROK**

**Binpêkirinên dewleta Tirk li Efrînê ............ 6**

**Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê ............ 26**

**ÊLÊN DÊREZORÊ ............ 49**

**Koçberî ............ 64**

**Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ............ 89**

## Gotina hejmarê

Em weke Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS), gaveke nû û watedar diavêjin. Ew jî kovara bi navê (Lêkokînên stratejîk). Jixwe weke tê zanîn ku navenda me kovareke bi vî navî lê bi navekî giştî dê guncawtir e. Bi vê kovara me ya bi Kurdî êdî ew nav careke din were vejandin.

Jixwe ev jimara yekem a kovarê ye ku ezmûneke nû ye û dê astengî û gêmasî derkevin pêşberî mirov. Lê hêviya me ew e ku em dikaribin bi nivîsarên kovarê rastiyê diyar bikin bêyî alîgirî û sûdeke bigihînin kesê ku vê kovarê bişopîne. Ji hêleke din ve jî em jî sûdê ji xwendevanên kovarê bigirin ku nerînên xwe li ser kovarê û hem jî li ser mijar û lêkolînên ku tê de tên weşandin ji me re raber bikin. Jixwe ev jî karîgera sereke ya pêşketina kovarê ye ku bi nerîn û nirxandinên we em dewlemendtir dibin.

Welatê me di rewşeke gelekî nazîk re derbas dibe; ji hêlekê ve êrîşên hovane li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûrî, ji hêla din ve kar û xebatên yekkirina helwesta kurdî têne meşandin. Disa hûnandina lîstokan li rojhilatê firatê bi navê êlan li wan hereman. Ji ber wê jî di vê jimara kovara xwe de me cîh da mijarên girîng li gorî demê.

Mijara sereke ya vê jimarê bi herêma Efrînê ve girêdayî ye. Weke tê zanîn dewleta dagirker tirkiyê bi pişgiriya çeteyê xwe Efrîn dagirker kirin û binpêkirin û guhertinên demografî pêk anîn. Lêkolîna bi navê (Binpêkirinên dewleta Tirk li Efrînê) dê balê bikşîne ser van binpêkirinan û belgên ku wê tekez dike, diyar bike.

Jixwe encama biçav û sereke ya şer koçberî ye. Jiber vê yekê di mijara bi navê (Koçberî) dê li ser arîşeya koçberiyê raweste. Ew jî ji pênase bigire paşê sedem û cure ta çareseriya koçberiyê, digire dest.

Di mijareke din de weke xaleke girêdayî şer, ew jî bi mijare parastinê ve girêdayî ye, mijara ewlehiya welêt e. Nivîsara bi navê (Ewlehiya Niştimanî)

vê mijarê raduxe ber çav ku tê de çawa welatek dikare di ewlehiyê de jiyan bike.

Rewşa gelekî ji hêla ewlehiya navxweyî û ya bi derve re girêdayî ye, tevgera siyasî ango partiyên siyasî yên vî welatî misoger dike. ji ber vê yekê nivîsara bi navê (Dîroka tevgera siyasî ya kurdî li Sûriya) rewşa ramyarî ya Kurdin li Rojava û Sûriyê lêkolîn dike.

Nivîsareke din giring di vê jimarê de heye ew jî di bin navê (Êlên Dêrazorê) ye. Ev mijar ji bo gel hev naskir hêmayeke giring e. Bi taybet ku desthilat dixwazin gelan bikin dijminên hev. Li dijî wê hevnaskirin sînorên ku ava dikin dişke û gel xalên bi hevrejiyankirinê dibînin.

**Sernivîser**

.

## Binpêkirinên dewleta Tirk li Efrînê

Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS), ji destpêka damezirandina xwe ve, bûyerên ku li herêmê bi giştî û li herêma Efrînê bi taybetî rû didin, dişopîne. Ji destpêka sala 2018 an de, çalakiyên xwe bi awayekî xurt, li ser êrîş û dagirkeriya Efrînê teqez kir; Efrîna ku di bin sîwana Rêveberiya xweser ya ku ji sala 2014 an de, bi keda gelê herêmê hatibû damezrandin, di  atmosfereke ku ji demokrasî, aştî û ewlehiyê pêk dihat de, dijiya.

Navendê karîbû piraniya tawan û binpêkirinên dagirkeran, di derheqê niştecihên herêmê û dîmenên wê yên çandî, olî, siyasî, civakî, jîngehî, şûnwarî û dîrokî de, belge bike. Jixwe wan hêzan, rêgeza terorê li xwe girtine, pê niştecihên herêmê çewisandin. Her wiha ji bo ronîkirina wan kiryarên ku kareseteke mezin bi serê gelê Efrînê de anîbû. Navendê karîbû gelek tawanên belgekirî û bi zimanine cuda, bigihîne raya giştî ku ew jî bû xelekek ji xelekên lêkolîn û çalekiyên ku navendê ji bo piştgiriya ramanên aştî, demokrasî û biratiya gelan li herêmê pê radidibû, her wiha navend pir girîngiyê dide peyman û lihevkirinên ku civaka navneteweyî li xwe digire.

Navenda Lêkolînên Stratejîk, lêkolîna xwe di bin dırûşmeya “Paqijkirina nijadî û guhertina demografîk li Efrînê” pêşkêş dike. Armanca vê lêkolînê ronîkirina siyaseta mêtingerî ya zordar a dewleta Tirk û komên terorîst ên girêdayî wê. Ew siyaseta sîstematîk a ku bi rêve dibe; siyasetek sîstematîke, gelê herêmê ji hêla çandî, aborî, civakî, siyasî û bi karanîna siyaseta tirkkirinê ji xwe re dike armanc, ku mebest jê, vî gelî ji hêla maddî û manewî ve qir bike û têxe xizmeta ajandeyên rêjîma Erdogan a faşîst û paşverû ya ku çanda nefret û kîndariyê di nava gelan de belav dike, armanca wî ji bo bidestxistina rûmetekê jixwe re û ji hevkarên xwe re. Rêjîma Erdogan êrîşa xwe li ser Efrînê, bi bihaneya şerê terorê û parastina ewlehiya Tirkiyê, rewa dibîne. Lê ev dûrî rastiyê ye, ew bi xwe terorê li beramberî gelên herêmê û gelên Rojava –Bakurê Sûriyê, bi kar tîne. Ev gelên ku rojekê ji rojan êrîşî dewleta Tirkiyê nekirine. Erdogan, gefa

bikaranîna terorîzmê li dijî welatin mîna Siûdiyê,Yonanistan, Îraqê û hin dewletin Ewropî ku rê li pêşiya armanc û azwerên wî digire dide. Piştgiriya Erdogan ji bo rêxistinên terorîst mîna Cebhetul-Nusre, DAIŞ û hin komên terorîst ku navê Artêşa azad li xwe dikin, di nav wan de komên mafya Tirkî, eşkere ye. Bi dehan rapor hene, vê yekê piştrast dikin.

kiryarên rêjîma Erdogan û komên terorîst ên girêdayî wê ku bi tawanên kuştin, êşkence, revandin, destdirêjî, binçavkirin, koçberkirin, talankirin, wêrankirina samanên gel û werzên çandiyê û deverên dîrokî, guhertina deverên çandî û olî û dîrokî yên herêmê, reşkirina metiryalên hînkirinê, ev tev dikevin bin nave têgîna terorê û kiryarên komkujiyê. Heta bi miriyên herêmê rastî terorê hatin. Bi dehan goristan û mezelên nû hatin rakirin. Ji ber ku çekên wêranker bi kar anîn, bi sedan sivîl jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran birîndar bûn. Bê ku cudahiyê têxin navbera sivîl û çekdaran de. Ev tev ji alavên karîgerên di piroseyên paqijkirina nijadî û guhertina demografî de yên ku hîmê sereke di piroseyên komkujiyan de ne. rêjîma Erdogan hîn gefan dixwe ku dê heman kiryaran li herêmên Rojava-Bakurê Sûriyê ku dikeve rojhilatê Feratê pêk bîne. Hêj di kiryarên xwe yên sorkirin û terorîst de berdewam e. Ev tev pêk tên bêyî ku deste, rêxistin û hikûmetên ku bi parastina mafê mirovan erkdar in, tiştekî bikin da ku tawanên li dijî mirov, derdor, dîrok û aştiyê rawestînin. Her wiha da ku nehêlin careke din li herêmên dîtir dubare bibe. Tu dibêjî qey çav li ser pabendiyên civaka navneteweyî yên di rêya rêxistinên wê, peymanên wê, biryarên ku armanca wan aştî û vegeşbûn li ser asta cîhanî ye, tên girtin.

### *Binpêkirina mafên mirovan li herêma Efrînê*

Rêjîma Tirkiyê û grupên çekdar ên girêdayî wê milîsên çekdar ên Sûriyê ku hin ji wan Sûrî ne û hin jî ji welatin dinin, zagonên navnetewî, mirovî û mafên mirovan, di şerê xwe yê bi navê \`Şaxê Zeytûnê\` de, binpê kirin. Van hêzan bi serkêşiya Erdogan, li statûya dîmokratîk a tekane û ewleh di erdnîgariya Sûriyê de, xist û niştecihên herêmê ji xak, xanî, gund û bajarên wan qewirandin û penaberî deverine din kirin ku, mercên jiyanê yên herî biçûk lê peyda nabin û sivîl bi awayekî giştî jixwe re kirin armanc, da ku berxwedanê bişkînin karwanên alîkariyan jî topbaran kirin. Her wiha sivîlên dixwestin ji herêmên şer dûr bikevin jî topbaran dikirin. Rêjîma Erdogan bi dehan tewankarên derveyî sînorên zagon û dadweriyê bi kar anîn. Erdogan

bû sedema hilweşandina xanî, samanên sivîlan û beşek ji xaka dewleteke din dagir kir û êrîşî hêza wê dewletê kir. Wan milîs û hêzan dest bi operasyoneke girtin, binçavkirin û îşgencekirinê li dijî Kurdan bêyî dadwerî û bêyî ku cudahiyê bike di navbera mezin, biçûk, jin û rewşa tenduristî de, kir. Hemû sazî û dezgehên xizmetguzariyê topbaran kirin (embarên av û xwarinê, jeneratorên kehrebê, nexweşxane, cihên şûnwarî, stargeh û dibistan) hin ji van kiryaran ji hêla rêxistina mafê mirovan a li Cezîrê[1] ve, dema serdana wê ji Efrînê re di 17.02.2018`an de, hatin belgekirin: **"...di gund û bajarokan de berê topbaranê dan avahiyên sivîlan û avahiyên ku ne armancên leşkerî ne; wekî dibistan, mizgeft, navendên tendirustî, saziyên xizmetguzarî, cihên şûnwarî, avahiyên bingehîn û grûpên tenduristiyê yên ku bi hewara sivîlên birîndar ve diçûn, wekî Heyva Sor A Kurdî û Xeça Sor ( ku ta dîroka 21. 2. 2018 hejmara kuştiyan gihaşt 196 û ya birîndaran 625an) Her wiha di dîroka 7`ê Reşemiya 2018`an de îstgeha zelalkirina avê li gundê Metîna yê girêdayî navçeya Şera û bendava Meydankê û sê cihên şûnwarî topbaran kirin..."** di rapora Komîteya Mafparêz a ku destdirêjiyên li Efrînê belge dike ev rapor di Konê " Ev dever Efrîn e" li Qamişlo hat amadekirin, wisa hat gotin[2]: **" Di dîroka 7`ê Reşemiya 2018an di saet 1`ê sibehê de, Îstgeha zelalkirina avê li Efrînê hat topbarankirin û di encamê de ziyanên diravî yên mezin pêk hatin û av li ser sivîlan hat qutkirin. Tê zanîn ku berî wê jî bendava Meydankê hat topbarankirin û di encamê de ziyanên diravî pêk hatin û av li ser sivîlan hat qutkirin..."** Ta niha jî kiryarên kuştin, binçavkirin, qewirandin û diziya mewdanan bi awayekî tirsçêker berdewam e. Ev ji bilî ku bi dehan sivîl bê alîkariyên tendirustî, fêrkirin û jiyankirinê mane û mercên jiyanê li hemberî penaberên ku ji bajarên din hatibûn Efrînê, zehmet bûn. Jixwe tu statûyeke siyasî di bin siya dgirkeran de nîne ku demokratîk be û mafên mirovan biparêze. Di dîroka 20.01. 2018`an de, hêzên Tirkiyê û milîsên tundrew yên girêdayî wê, şerekî dijwar li Efrînê pêk anîn. Gelek cûreyên çekan bi kar anîn. Bi fetwa

---

[1] rapora serlêdana Rêxistina Mafê Mirovan ji Efrînê re http://www.kmmrojava.com/2018/03/03

[2] Di dîroka 20.1. 2018 an hejmarek ji rêxistinên mafparêz û saziyên civaka sivîl dest bi operesyoneke alîgir ji Efrînê re kirin. navê wê operesyonê kirin " Ev der Efrîne" sedema wê jî operesyona ku Tirkiyê li herêmên Efrîn û Şehba di 20.1.2018an de dest pê kir. Di vê êrşê degelek sivîl birîndar û şehîd ketin û gelek ziyan li mewdan û avahiyên bingehî hatin kirin.

ku ji `Encumana Islamî ya Sûrî` û rêveberiya kar û barên olî li Tirkiyê derketiye, sivîl û saziyên xizmetguzariyê topbaran kirin. Vê êrîşê bi biryar û alîgiriya hikûmeta Erdogan ya rasteras destpêkir; bêyî ku tu guhdanê li zagon û peymanên navnetewî û mirovahî bike. Tevî berxwedana mezin ji hêla berxwedanan ve û çalakiyên diplomasî yên xurt ji hêla Rêveberiya Xweser, rêxistinên mafên mirovan, rojnemevan û niştecihên herêmê ve, pêk hatiye ve; di dîroka 18`ê Avdara 2018`an de hêzên Tirkiyê derbasî Efrînê bûn, piştî ku niştecihan li gorî biryara Rêveberiya Xweser ku bi awayekî demokratîk wan ew hilbijartibû, bajar vala kirin û berê xwe dan cihên ewleh. Ji ber ku hêzên dagirker tu girîngiyê nadin peymanên navnetewî û mirovahî û milîsiyên girêdayî wê jî tu danpêdanê bi sincên mirovahî nekin (mînak: kiryarên wan li Mûsil, Şengal, Reqa, Heleb û ji bilî wan) Her wiha bêdengiya navnetewî li ser destwerdanên ku di êrîşê de pêk hatin. lewma armanca herî girîng ji bo berevanan, parastina sivîlan bû. Di destpêka êrîşan de sivîlan berê xwe didan bajarê Efrînê (paytexta herêmê) û di her malekê de zêdeyî malbatekê bi cih dibûn, lê vê rê li ber rêjîma Erdogan negirt da ku topbarana xwe kêmtir bike. Berovajî wê ev yek weke derfetekê dît da ku projeya paqijkirina nijadî li herêmê pêk bîne û berevanan bi parastina sivîlan mijûl bike

Niha jî sivîl li Heleb û gundewarên wê tarûmar bûne û rastî astengiyan ji hêla rêjîma Sûrî ve tên; wekî neçarkirina ciwanan da ku tevlî milîsên girêdayî wê bibin, bi raporên kevin û nû yên li ser sivîlan ku li gorî wê sûcdarin, digire û îşkence dike da ku hin agahiyan ji wan bigire û farzkirina gelek diravan li ser sivîlan da ku rê li ber derbasbûna wan di berbendan de veke[3]. Kesên ku nikarîbûn ji Efrînê derkevin, rastî gelek kiryarên Kolberan (qaçaxçiyan) hatin. Kolberan ew sivîl bi pereyan tehdîddikirin û berê wan didan zeviyên mayînan. Lewma gelekan ji wan jiyana xwe ji dest da. Sivîlên din jî berê xwe dan Til Rifet, ku li wir Rêveberiya Xweser kemp avakirin; lê ev kemp gelek ji wan re divê da ku bighêjin asta jiyana asayî. Her wiha hin malbatan ji neçarî berê xwe dan xizmên xwe li bajarên Rojava- Bakurê Sûriyê, li wir jî astengiyan di dîtina xanî û kar de dibînin.

[3] hikûmeta Sûriyê nahêle ku niştecihên Efrînê birevin û alîkariyan wergirin. https://www.hrw.org/ar/news/2018/04/08/316683

Rêjîma Sûriyê ragihand ku ew derbasbûna Tirkiyê di xaka xwe de napejirîne, lê helwesta wê ji daxuyanên ragihandinî derbas nebû. Sedema wê jî serweriya Rûsiyê li ser biryarên Siyasî li Sûriyê`ye. Jixwe rêjîma Sûriyê jî bi kujariya derheqê mirovahiyê de, tewanbarkirî ye û tenê berjewendiya desthilatdariyê jê re girîng e, sivîl gelekî jê re ne girîngin. Destûra Sûriyê ku rêjîm bi xwe li ser damezirandina wê rawestiyaye, hat binpêkirin, weke mînak: Di destûra Sûriyê ya ku di 2012`an de hat sererastkirin[4]de, di benda 11`an de wisa hatiye: **" Artêş û hêzên çekdar saziyeke niştimaniye û li ser parastina ewlehiya xaka welêt û xweseriya wî ya herêmî, berpirsyar e. Ev artêş ji bo berjewendiyên gel, armancên wî û ewlehiya wî ya niştimanî, kar dike"** û di benda 32`yan de wisa hatiye: **" Dewlet parastina şûnwar, cihên şûnwarî û tiştên xwedî girîngiyeke hunerî, dîrokî û çandî, dike".** benda 38`an xala 2`yan: **" nabe ku sivîl radestî tu aliyên biyanî werinkirin"** her wiha hin bendên din jî hene.

Gelek rapor û giliyên belgekirî yên ku kiryarên Tirkiyê belge dikin û raporên ji raya giştî re, derketin. Lewma baldayîna li ser kiryarên hatine kirin û tên kirin pêwîst e, Ji ber ku ev kiryar rastiya armancên operesyona `Şaxê Zeytûnê` û stratejiya rêjîma Erdogan, diyar dikin. Ev kiryar bi kurtasî bi van tiştan tên nimandin: kuştin, binçavkirin, îşkencekirina li ser nasnameyê, qewirandina bi zorê, topbarankirina sivîl û mewdanên wan, topbarankirina nexweşxane, siwareyên hewarhatinê, cihên olî, saziyên xizmetguzarî û cihên şûnwarî. Her wiha îşkencekirina dîlan, destdirêjiya li terman, wênekêşana dîlan di rewşên xirab de û kuştinên meydanî. Her wiha bikaranîna hêzeke pir mezin (balafir, tang, top û rokêt) li dijî hêzeke ne li gorî xwe, neçarkirina sivîlan da ku di riya biçekirina penaber û çekdarên penaberbûyî re, weke sîxuran li cemê kar bikin. Bikaranîna çekên kîmawî, hêştina sivîlan bê pêdiviyên jiyanê yên sereke di riya topbarankirina embarên xwarinê, avê, kehrebe û Enternetê re, bikaranîna olê û neçarkirina Êzîdî û Elewiyan da ku li gorî nerîna Îxwanên paşverû, bibin Misilmanên Sunî.

---

[4] Destûra Sûriyê... http://parliament.gov.sy/arabic/index.php?node=5518&cat=423

**Binpêkirina zagonên navnetewî ji hêla Tirkiyê ve[5]:**

Rêjîma Erdogan hewldide ku kuştin, qewirandin, îşkencekirin û guhertina demografî ya li Efrînê pêk tîne, weke mafekî rewa ji hemû dewletan re da ku parastina ewlehiya xwe ya netewî bikin, dide xuyakirin. Lê dîroka Tirkiyê bi tewanên der heqê gelên Rojhilata Navîn û gelê wî bi xwe jî, dagirtî ye. Sê operesyonên paqijkirina nijadî yên navdar ku Tirkiyê der heqê Yûnaniyan pêk anîne hene. Ev operesyon ji dema dagirkirina xaka Yûnaniyan ya li rojavayî Anadolê dikeve û Yûnana niha û ta şerê cîhanê yê yekem û piştre jî ye(ji 1914`an ta 1923`an). Her wiha li dijî Ermenan ji berî şer û di dema şerê cîhanê yê yekem de 1915- 1917. Her wiha li dijî Kurdan li bakurê Kurdstanê ji dema dagirkeriya Tirkan ji Kurdistanê re û ta roja îro. Lewma tu pirsgirêk li ba rêjîma Erdogan nîne ku operesyonên paqijkirina nijadî li dijî xakên di bin destên wî de, pêk bîne. Ev yek niha li Efrînê jî ji hêla rêjîma Erdogan pêk tê. Kiryar û dagirkeriya Erdogan li gorî bendên Sîstema Roma ya sereke ji dadgeha tewanên navnetewî re,[6] ku di 17`ê Tîrmeha 1998`an de hat pêkanîn û li gorî hevpeymana Cinêf a çarem a der barê parastina sivîlan di dema şer de di dîroka 12`ê gulana 1949`an de, [7]dighêjin asta binpêkirina peyman û zagonên navnetewî û dighêjin asta tewanên cengê.

Kiryarên rêjîma Erdogan û sîxurên wê dikevin nav benda tewanên dijî mirovahiyê û tewanên şer ên girêdayî Dadgeha Tewanên Navnetewî. Hijmarek kiryarên kirêt li dijî mafên mirovan li ser gelê Efrînê, pêk hatin, her wekî: kuştin, qewirandin, komkujî, dîlkirin û kolekirin di riya serwerîkirina aliyekî desthilatdar û alîgir ji Erdogan re serdestî vîna gel û ji bilî van kiryaran ku di benda 7`an a Sîstema Roma ya sereke ji dadgeha tewanên navnetewî re, hetine diyarkirin. Di vê bendê de ev xal hatine nivîsandin: **" xala yekem: Mebesta sereke ji vê rêjîmê*;* Eger yek ji van karên li jêr bi**

---

[5] Sîstema Roma ya sereke ji dadgeha tewanên navnetewî re. - http://legal.un.org/icc/statute/arabic/rome_statute(a).pdf

[6] Encumana Ewlehiya Navnetewî biryara xwe ya di bin hejmara 93/808 derxist. Tê de biryara damezirandina dadgeheke tewanên navnetewî li Yogoslafiya berê ji sala 1991ê ve, hat standin. Ev dadgeh, dadweriya kesên ku tewanine kujare derheqê mafên mirovahî kirine de, dike.

[7] hevpeymana Cinêf a çarem a derbarê parastina sivîlan di dema şer de di dîroka 12ê gulana 1949an de… https://www.ircs.org.iq/wp-content/uploads/2014/04/J_4.pdf http://www.mofa.gov.iq/documentfiles/129844885646757133.pdf https://www.icrc.org/ara/resources/documents/misc/5nsla8.htm.

**awayekî plankirî an berfereh li dijî çi grûpeke sivîl pêk were, îcar ew tewaneke li dijî mirovahiyê ye: 1. Kuştina bi mebest 2. qirkirin 3. Kolekirin 4. Qewirandina niştecihan û neçarkirina wan da ku derkevin 5. Girtin an jî bi çi awayî ku berovajî regezên sereke yên zagona navnetewî, ambargokirina azadiya laşî 6. Îşkencekirin 7. Destdirêjî û kolekirina seksî an jî neçarkirina li ser ganweriyê...8. çewsandina grûpekê ji niştecihan ji ber sedemên nijadî, siyasî, netewî, etnîkî, çandî û olî an jî girêdayî cureyê zayendê li gorî benda sêyem, an jî sedemên din ên ku diyar e ku zagona navnetewî li serê erê nake...8. binçavkirina neçarî ji kesan re 9. Tewana veqetandina nijadî 10. Kiriyarên din ên weke van kiryaran ku nemirovahî ne û ziyanan dighînin laş û tenduristiya mejî an laşî... xala (4) qewirandin û neçarkirina sivîlan da ku derkevin, yanê guhestina kesên li herêmekê bi awayekî nerewa, bi qewirandinê yan jî bi awayekî neçarî bêyî tu sedemên ku ji hêla zagona nevnetewî ve pejirandî, hebin. Xala (9) tewana veqetandina nijadî, yanê kiryarên nemirovahî mîna kiryarên ku di benda yekem de hatine rêzkirin. Ev tewan ji hêla grûpeke nijadî tekane û sîstemeke dezgehî ve ku li ser çewsandin û desteserkirina plankirî li dijî grûpên nijadî yên din, pêk tê. Ev tewan ji bo mayîna wê sîstemê, tên kirin``.**

Dema em kiryarên rêjîma Erdogan di êrîşa wî li ser Efrînê de bişopînin em ê bibînin ku ev kiryar bi ramanên Mîkyavîlî yên ku di beşa pêncem de di pirtîka wî ya bi navê Mîr de hatine nivîsandin, hevseng in. Di vê pirtûkê de li ser çawaniya bidesthiştina deverên dagirkirî diaxive û sê rêbazên kontrolkirina welatekî dagîrkirî ku berê azad bû, rave dike; rêbazê yekem; hilweşandina herêmên dagirkirî û avakirina dewletekê li ser bingeha dewleta têkçûyî. Ya duyem; ew e ku dagirker li welatê dagirkerî bijî. Ya sêyem; welatê dagirkerî azadiya siyasî û serxwebûna xwe ya hundirîn bistîne, lê divê çîneke desthilatdar hebe ku ji dagirkeran re alîgir be û wêneya wî her tim spî bike, her wiha bac li ser vî welatî werin sepandin. Ev rêbaz baştirîn rêbaz e da ku herêma dagirkerî desteserkirî bimîne. Erdogan ev her sê rêbaz bi kar anîn, bi pêş xistin û li wan zêde kir bi tirsandina sivîlan û qewirandina wan ji herêmê. Em ê niha kiryarên ku hêzên dagirker bi serkêşiya Erdogan kirine ku berovajî bendên di sîstema Roma ya Sereke ji Dadgeha Tewanên Navnetewî û Hevpeymana Cinêf a Çarem re, diyar bikin: Qewirandin û dûrxistina bi zorê, guherîna demografî û paqijkirina

nijadî li dijî kurdan û ji bo ku vê yekê pêk bîne rêjîma Erdogan hejmarek rêbazên nesincî yên berovajî peymanên navnetewî û mirovahî, bi kar anîn. Tu caran nebûye ku dewleteke dagirker piştî dagirkirinê di cih de dest bi guherîna nijadî kiriye û di roja duyem de dizî û ji bilî wê pêk anîne. Tevahê cihanê li ser alavên ragihandinê ev kiryar dîtin. Erdogan di alavên ragihandinê de da diyarkirin ku hejmara Ereban li Efrînê %90 û ya kurdan %5; yanî armanca guherîna demografî ew e ku %95 ji Kurdên ku niştecihên herêmê yên resen in, biqewirîne. A ku vê siyasetê tekez dike ew e ku rêjîma Erdogan ya nerasteras di encumana xwecihî ya ku ji hêla wî ve li ser herêmê hatibû sepandin, danpêdan kir ku piraniya niştecihên herêmê Kurd in. Di vê encumanê de ji ber ku piraniya niştecihên herêmê Kurd in, rêjîma Erdogan piraniya kursiyan da Kurdên girêdayî wî; 11 Kursî ji Kurdan re, 8 ji Ereban re û ji Tirkmenan re kursiyek.

Di heman demê de ragihand ku ew ê sûriyên ku di kempên wî de ne, li Efrînê bi cih bike piştî ku niştecihên herêmê yên resen jê biqewirîne bi bihaneya ku ew terorîst in. Lewma ji roja yekem ya êrîşê ve, Erdogan sivîl bi awayekî plankirî û rasterast kirin armanc, her wiha xanî, zevî, cihên şûnwarî, cihên olî, nexweşxane, Firin û hemû tiştên ji jiyana sivîlan re pêwîst xira kirin, da ku wan biqewirîne. Her wiha gelek kiryarên weke kuştin, îşkencekirin û binçavkirin, ji hêla rêxistina Mafê Mirovan li Cezîrê û Riwangeha Sûrî ya Mafê Mirovan û ji bilî wan jî, hatin belgekirin. Niştecihên herêmê yên Êzîdî, neçar man ku penaber bibin ji ber gufên rêjîma Erdogan û ragihandina wê ku ew ê cîhadê li dijî niştecihên herêmê pêk bînin, nemaze ji ber ku Êzîdî berî niha li Şengalê ev tecrube bi ser wan de ji hêla grûpên tundrew ve, hatiye. Her wiha hejmareke mezin ji tîreya Elewî ji gundên xwe penaber bûn.

Ev kiryar tev li pêşiya civaka navnetewî, rêxistinên mafparêzî û hikûmeta Sûriyê pêk hatin. Ev jî berovajî benda heftemîn ji xala duyem beşa D ye. Di vê beşê de "qewirandina bizorê" wisa hatiye pênasekirin: **" guhestina bizorê ya mirovên ku li herêmekê bi awayekî rewa jiyan dikin, bi awayê qewirandin an jî bi çi awayê ku zagona navnetewî napejirîne, be."** Bendên 2,7 û 8 û benda 7 xala yekê ji sîstema Sereke ya Roma, "qewirandina bizorê" tewaneke cengê dihesibîne. Her wiha rêzxala 8 ji beşa B ji xala 2 ji benda 8an wisa dibêje: **" eger dewleta dagirker bi**

**awayekî rasterast an jî nerasteras niştecihên xwe biguhêze xaka ku dagir kiriye û niştecihên herêma dagirkirî tevan an jî beşekî ji wan di hunirê heman xakê de yan jî derveyî wê biguhêze an jî biqewirîne, destdirêjî û binpêkirineke metirsîdar e ji zagon û peymnên nevnetewî re ye."**Her wiha bendên 49 û 85 xala 1/4 û 147 ji Birotokola lêzêdekirî ya yekem ji hevpeymana Cinêf a Çarem ji sala 1949an, li ser qedexekirina guhestina bizorê ya tekane û ya bigiştî yan jî guhestina beşek ji niştecihên dewleta dagirker bo dewleta dagirkirî, tekez dikin.

Dewleta Tirk di warê paqijkirina nijadî û guherîna demografî de, xwedî pisporî ye. li herêma Efrînê vî rêbazî bi awayekî berfereh bi kar tîne. Dixwaze mayîna xwe li wir bi damezirandina bargehên leşkerî, tekez bike. Ew siyaseta xwe ji tecrubeya Osmanî berî 500 salî, digire; dema ku Kurdistan, Anadol, Ezmîr û ji bilî wê ji bajarên Yûnanî yên li ser berava rojava û başûrê Asiya biçûk dikevin, dagir kirin û niştecihên van herêman kuştin an jî qewirandin û kesên biyanî li şûna wan bi cih kirin. piştre jî operasyonên qirkirinê derheqê Kurd, Ermen, Fileh û Êzîdiyan de, pêk anîn. Lê operasyona herî mezin a ku li dijî Kurdan pêk hat, plana " Çeksaskirina Rojhilat" bû, ku ji hêla rêjîma Ataturk ve sala 1925`an, het amadekirin. Desthilatdarên Tirk ta roja îro jî parastina vê planê kirine. tişta ku niha li Efrînê pêk tê çi guherîna demografî be çi jî paqijkirina nijadî be, berdewamiya ji wê plana tewanbar a li dijî Kurdan e. Ya ku tekez dike ku ev kiryar bi awayekî plankirî pêk tê, guherîna rêbazê bikaranînê ye da ku qirkirin pêk were. Ev rêbaz berî êrîşê, dema êrîşê û piştî êrîşê ji hev cuda ye. sedemên vê guherîna rêbaz, ev in:

**Berî êrîşê:**

Ji destpêka damezirandina Rêveberiya Xweser a demokratîk li Rojava-Bakurê Sûriyê ve, kiryarên Tirkiyê li dijî wê ranewestiyane. Gelek ji van kiryar û destdirêjiyan hatine belgekirin, her wekî: gulebarankirin û îşkencekirina der heqê sivîlên nêzî sînorê wê, birina zeviyan, dorpêçkirina siyasî û aborî, şandina terorîstan û ragihandinê da ku li dijî Efrînê kar bikin ji bo sivîlan bitirsîne û wan neçar bike da ku penaberî Ewropa yan jî bajarên Sûriyê yên din bibin, her wiha hewl dida ku nakokiyan di navbera Rêveberiya Xweser û niştecihên Efrînê de derxe da ku bingeha wê ya gelêrî lewaz bike. Lê herêmê li beramberî vê siyasetê xwe girt. Siyaseta

Erdogan ji vî alî ve bi ser neket. Ji ber ku kesên alîgirê Rêveberiya Xweser penaber nebûn, lê kesên nealîgirê Rêveberiya Xweser penaberbûn û eger ew kes bimana dê bibûna alavek ji fitneyê re û li gorî berjewndiyên Erdogan kar bikirina. Vê jî alîkariya Rêveberiya xweser kir da ku bi projeya federaliya demokrat bang bike. Ev proje di rêya hilbijartinên demokratîk û rast ji hêla niştecihên Efrînê ku hejmara wan nêzî nîv melyonî ye, bi berferehî hat pejirandin. Weke encamekê ji biserneketina siyaseta Erdogan, xwe neçar dît; an vê rewşa heyî bipejirîne ji ber ku ev statû tu gufê li dewleta Tirk nake, yan jî bi awayekî rasterast êrîşî herêmê bike û li ser bingeha hişmendiya şofînîzm û paşverû, stratejiya armanc girtina Kurdan li hemû deveran, pêk bîne.

**Di dema êrîşê de:**

Ji rêjîma Erdogan re hejmarek rêbaz pêkan bûn; ji ber ku dewleta Tirk dê bi xwe projeyê bi awayekî fermî pêk bîne, li pêşiya rêjîma Erdogan çend rêbaz hebûn, wî jî ji hemiyan sûd wergirt bêyî ku tu berbendeke sincî û zagonî li hemberî wî raweste; nemaze bêdengiya navnetewî ya ku di navbera van armancan de dabeş e: fetisandina Erdogan di çirava Sûriyê de, qirkirina Kurdan û alîgirên Erdogan ên xwedî stratejiyek weke stratejiya Erdogan. Ramangerê Navnetewî Ebdela Ocalan wisa dibêje**: [8]"...Li ser gelên herêmê û neteweyên wê pêkanîn û kirinên digihîjin qirkirinê hene. Hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst bi girîngî berpirsiyariya van pêkanîn û kirinan dixin stûyê dewletdariya netewe. Lê ev rûyê rastiyê nîne, rastî tiştekî din e. Sermayeya hegemonîk û yekdestdariyên îdeolojîk bi xwe van elîtên dewleta netewe pêk tînin, wan hem di warê îdeolojî de, hem jî di warê eskerî û ekonomîk de bi gurçûpêç dikin. Mînak, faşîstên Tirkên Spî ên laîkgir ku ji qirkirinên li Anatolya û Mezopotamyayê berpirsiyar têne dîtin, hem di warê îdeolojîk de, hem jî di warê bi gurçûpêçkirina maddî de ji serî heta binî bi desteka hêzên hegemonîk ango Ingilîz, Franse, Elmanya û Emerîkayê hatiye avakirin. Eger desteka van hêzên hegemonîk nebe, hebûna Tirkê Spî ne pêkan bû. Jixwe weke çand ne Îslamiyet ne jî**

[8] Manifisto, Şaristaniya Dîmokrat. Pirtûka pêncemîn. Pirsgirêka Kurdî û çareseriya netewa dîmokratîk. Berevaniya di ber Kurdên ku ketine di navbera herdû diranên qirkirina çandî. Rûpela . Ebdela Ocelan,. Wergerandina Zaxo Şiyar. Çapa duyem. Rûpela 183

**Xiristiyanî yan Mûsewîtî xwediyê wê kapasîteyê nînin ku pratîka qirkirinê pêk bînin. Lê ev kapasîte li cem hêmanên moderniteya kapîtalîst heye, di nava xwe de digire. Lê bi awayê xuya dike, ji van qirkirinan bi giştî bi awayekî kategorîk Ereb, Tirk, Cihû û Kurd berpirsiyar têne dîtin..."**

**Rêjîma Erdogan di dema êrîşê de ev tişt pêk anîn:**

Topbarankirina sivîlan, mal û gundê wan û pêlên penaberan.

Bihaneya Erdogan ku wî sîvîl topbaran nekirine, tenê şelûkirineke ragihandinî bû. Bi dehan sîxurên wî di hundirê herêmê de û balafirên keşfê yên pêşketî, hebûn. Van balafiran karîbû cihên sivîlan û cihên şervanên berxwedanê diyar bike. Eger ev bihaneya wî rast be, dêmek çekên wî yê xwe bi wan serbilind dike bi kêr nayên, her wiha ev yek dibe alaveke şermezarkirinê li dijî rêjîma Erdogan ji ber ku tevî pêşketina çekên wî, cihên sivîlî û leşkerî ji hev dernexistin û herdu topbaran kirin. Yanê ev topbaran topbaraneke bê ser û ber bû. Ev yek jî şermezarkirina rêjîma Erdogan tekez dike û li ser komkujî û hilweşînê berpirsyar dike. Niha jî em ê çend rewşên ku vê yekê tekez dikin û şewqê didin terora rêjîma Erdogan û grûpên tundrew, pêşkêş bikin. Ev rewş ji hêla navend, rêxistin û saziyên navnetewî û xwecihî ve, bi raporan hatine belgekirin:

Topbarankirina sivîlan û diziya malên wan, tewanên cengî ne, zagona navnetewî li ser wan seza dike. Di daxuyaniya nûnerê bilind ê mafê mirovan Zeyd Reed Hisên[9] de di 19`ê Avdara 2018`an de ( kurtenivîs ji Encumana Ewlehî re li gorî daraştina Ariya, ji bo rewşa li Rojhilata Navîn "Sûriya" bi navnîşana Kirîza Sûriyê Cihana me xira dike) wisa got: **"... di bajarê Efrînê de jî ku duh hêzên Tirk karîbû desteser bikin, ji ber derbeyên hewayî, êrîşên erdî û teqînên çêbûyî, hejmareke gelekî mezin ji sivîan hatin kuştin, birîndar ketin û bi hezaran bêcih û war man. Li gorî raporên gihaştine karmendên me, hêj nêzî 50000 sivîlî li bajêr in. Nexweşxaneya tekane ji ber topbarankirinê, hat girtin û av jî gelekî kêm bû ji ber topbarankirina îstgeha dana avê. Ta niha jî şer li hin herêmên Efrînê berdewam e..."**

[9]https://www.ohchr.org/AR/NewsEvents/Pages/DisplayNews.aspx?NewsID=22851&LangID=A

Di 23`yê Çileyê 2018`an de NRLS`ê- Şaxê Efrînê topbarankirina maleke Ermenî li navçeya nêzî pira Haşike ji hêla balafirên Tirkî ve, belge kiriye. Di vê malê de sê kes hebûn; Dê, Şemsa Konîs, temenê wê 57 sal bû; kur, Roşêr Konîs, temenê wî 18 sal bû. herduyan jiyana xwe ji dest da, lê Henîfa Konîs a ku temenê wê 18 salî bû rewşa wê tengezar e, lingê wê yê çepê hat qutkirin û ew birin nexweşxaneyên Helebê ji ber ku pêwîstiyên tendirustiyên nîn bûn ji ber sedema dorpêçkirina li ser herêmê hatiye sepandin. Piştî peywendiyên bi Ermenên Amerîka û Kanada re, Yekîtiya Ermenan daxuyaniyeke şermezarkirinê ragihand. Gelek belgeyên ku vê yekê tekez dikin gihaştin parêzerê Baba. Jixwe di vê were gotin ku Ev malbat malbata Ermen ya tekane bû ku li herêmê mabû.

NRLS`ê topbarankirina mlbateke din jî belge kir. Ev malbat bi navê Reşo ji gundê Çolaqa yê girêdayî navçeya Bilbile, ji ber topbarankirina balafir û topan bi awayekî bê ser û ber di 30.01. 2018 an de li ser gund, ev malbat penaberî gundê Qentare yê girêdayî navçeya Mabata bibû ta ku rewşa gundê wan aram bibe. Ev malbata ku ji çar kesan pêk dihat nizanîbû ku çekên Tirkiyê tu cudahiyê naxe navbera zarok, kal û jinan de û hemû sivîlên gund û nevçeyên herêma Efrînê topbaran dike.

Di dîroka 24.02. 2018, roja Şemiyê balafirên Tirkiyê gundê Qenterê topbaran kir. Di encamê de piraniya endamên malbatê birîndar bûn. zarokê bi navê Ibrahîm Reşîd Reşo û birayê wî, jiyana xwe ji dest da û endamên din ên malbatê bi birînên giran birîndar bûn; bav Reşîd Reşo temenê wî 70 sal e rû û hûrê wî birîndar bûn, Hisên Reşîd Reşo temenê wî 9 sal bû piştî ku destê wî yê rastê bi giranî birîndar bû, mir û Ibrahîm Reşîd Reşo 4 salî bû, piştî ku du çirûsk li dev û singa wî ketin, mir. Diya herdu zarokan dibêje hevser û herdu zarokên min şivantiya pezê xwe yê ku bi zorê ji gund derxistibûn, dikir û wê jî cihê xwe yê ku demkî lê dijin, paqij dikir. Ji nişka ve dengê balafirekê li ser gund hat, lê li gorî gotina wê jê re nemereq bû ji ber ku gelek caran balafir li ser Efrînê difirin. Lê da xuyakirin ku ji ber topbarankirina balafirê ji cihekî nêzîk re, cihê wê hejiya, bi lez ji cihê xwe derket û dît herdu zarokên wê û hevserê wê di nav xwînê de ji ser hişê xwe çûne. Wê û hin gundiyan herdu zarok birin nexweşxaneya li navenda bajêr û hevserê wê li wir ma ta ku karîbûn herin wî jî bibin nexweşxaneyê.

Ev kiryar dikevin nav tewanên ku benda 8 (tewanên şer) a sîstema Roma ya bingehî qala wan kiriye û wisa tê de hatiye:

**Ji mafê dadgehê ye ku destwerdanê di tewanên şer de bike, nemaze dema ku bi awayekî plankirî yan li gorî siyaseteke giştî yan jî di çarçoveya pêkanîna van tewanan bi awayekî berfereh de be.**

**Mebesta sereke ji vê sîstemê haj tewanên şer hebe, her weke:**

**a) Destdirêjiyên giran di peymanên Cinêf ên ku di 12ê Gulana 1949an de hatine tomarkirin. Yanê hemû kiriyarên ku ziyanan dighînin kesan an samanan ku zagonên Cinêf wan diparêze û yên girêdayî xala 4 an in: hilweşandina berfereh ji samanan re yan jî destdayîna li ser wan bi awayekî bê ser û ber û dijberî zagonê, bêyî ku tu pêwîstiyeke leşkerî jê re hebe.**

**b) Destdirêjiyên metirsîdar ên din ji zagon û kevneşopiyên ku di dijberiyên çekdar ên navnetewî de hatine dayîn di çarçoveya neguherbar ya zagona navnetewî de. Yanê çi kiryarek ji van kiryaran be:**

**Ji qestî ve topbarankirina niştecihên sivîl an jî sivîlên ku bi awayekî rasterast beşdarî şer nabin**

**Ji qestî ve topbarankirina cihên sivîlî, yanê cihên ku ne armancên leşkerî ne.**

**5. Êrîşkirina li ser bajar, gund, cih û avahiyên ku ne armancên leşkerî ne, bi çi awayî be.**

**6. Diziya bajar an jî cihekî bibe tevî ku bi zorê hatiye desteserkirin.**

NRLS`ê –Şaxê Efrînê destdirêjiya li se malên sivîlên din jî belge kiriye. Di êvara 20`ê Reşemiya 2018`an de, topên Tirkiyê çend kolanên Efrînê topbaran kirin. Di encamê de bi dehan sivîl bi birînên cuda birîndar bûn û ziyan gihaştin samanên wan. 6 sivîl birîndar bûn, 7 siware şewitîn û ziyanên mezin gihaştin samanên sivîlan. Hin ji birîndaran ev in: Rexda Fewaz 8 salî, Umer fewaz Elebdo 10 salî, Ebdilrehman Fewaz Elebdo 10 salî, Cuma Fewaz Elebdo 14 salî, Ewaş Mistefa Casim 35 salî, Fewaz Elebdo 41 salî.

NRLSê- Şaxê Efrînê, karîbû komkujiyekê der heqê penaberên ku hatibûn Efrînê da ku bi ewlehî jiyan bikin, belge bike. Gundê Gopaliya yê girêdayî navçeya Şêrawa li Efrînê, bi balafirên Tirkiyê di 28. 01. 2018`an de hat topbarankirin. Di encamê de 8 sivîl hatin kuştin, ew jî ev in: Emîra Kino 17 sal, Hesen Kino 13 sal, Kemal Kino 5 sal, Henadî kino 15 sal, Sefa Kino 7 sal, Fatima Ehmed Ebidrebû 40 sal, Cûriye Elî Erfan 45 sal û Rewan Eleswed 20 sal.

Ev yek di rapora rêxistina Human Rights watch di 28. 01 2018`an de hat tekezkirin, di vê raporê de wisa hat gotin:[10] **"... di nîvroja Çile de, hêzên Tirkiyê yên çekdar di êrîşeke hewayî de çar rokêt avêtin çend konan. Di wan konan de, malbata Kino nêzî gundê Kopile (Qebelî/Cebil) li Efrînê, dijî. Li gorî 4nêrevanan di êrîşê de kêmayî 8 sivîl hatin kuştin, 5 ji wan zarok bûn. nêrevan dibêjin di êrîşê de tu leşker nehatin kuştin. Ebdela Kino yê ku ji êrîşê xelasbû ji** Human Rights watch **re got ku malbata wî ji ber şer ji cihekî din reviya bû û li kople bi cih bibû. Dema ku rokêta yekem ket ew bi hin endamên malbata xwe re di kon de bû. balafirek hebû, me dengê wê di hundirê kon de dikir. Rokêta yekem nêzî me ket û 11 kes ji me kuştin, ê biçûk temenê wî 4 salî bû, mejiyê wî ket nav lepên min. Teqîn pir mezin bû, her der bû dû û doman, min li ku derê dinêrî min zarokên xwe yên parçebûyî, didîtin. Kino û kurê xwe got, 3 ji 4 rokêtan bi ser konan de ketin. Di navbera rokêtekê û rokêteke din de, 5 m bû; ya çaran jî bi ser siwareya malbatê de ket. Wan got ku tu çalakiyên leşkerî yan jî armancên leşkerî li derdorê nîn bûn. çalakiyên sivîlî derveyî konan diyar bûn û tu armancên leşkerî nîn bûn, tu tiş, tu tişt. Me digot êrîş armancên xwe şaş nakin, tekez e ku wan pez û zarokên li derve dilîzin, dîtin, lê em matmayî man, hemû niştecih matmayî man, ji ber ku "ev zarok in". Dr. Ciwan Mihemed ji nexweşxaneya Efrînê got ku karmendên tenduristiyê serdana cihê topbarankirî piştî kêlîkekê ji êrîşê, kirin; dîtin ku kevir li wir heliya ne, derbe gelekî bihêz bû. kevir bibûn ax û kon û hin xanî bibûn kavil. Me nizanîbû ên hatine kuştin kî ne! Me nikarîbû em tiştê mayî binasin ji ber ku her tişt perçe bibû. Me nasnameya kesekî tenê nas kir di riya**

[10] Sûriya, Kuştina hin sivîlan ji ber êrîşên Tirkiyê. Dibe ku ew êrîş ne rewa bin. https://www.hrw.org/ar/news/2018/02/23/315341

**cilên wî û hin nîşaneyan re. Lingek li vir bû û destek li wêdera ha bû; tu tiştekî saxlem ji terman nemabû. Dr. got ku li gorî zanîna min tu armancên leşkerî li cihê êrîşê nîn bûn.**

Human Rights watch **hin wêne ku di 1. 12. 2017an de bi payikan girtibûn, vegerandin û nekêmî 5 konên domdar ku weke konên sivîlan bû, dîtin. Lê hin wêne bi payikan di sibeha 29. 1. 2018 hatin girtin, di wan de ew kon hatine hilweşandin û kortik li şûna wan çêbibûn. Kûrahiya wan kortikan diyar dike ku ne kêmî 4 rokêtan li wî cihî ketine. Her wiha** Human Rights watch **hin wêneyên ku hewardarên Heyva Sor Ya Kurdî radestî wan kiribûn, vegerandin û hevsengî di navbera wan wêneyan û wêneyên ku di 29. 1. 2018`an de ji payikan hatine girtin, çêkir û ji dem û cihê wan wêneyan piştrast bû. Di wan wêneyan de avahiyên hilweşandî, siware û alavên çandiniyê li der dorê belavbûyî ne, her wiha hin tiştên kesayetî jî hene, mîna bermaya duçerxeyeke biçûk. Wêneyên fotografîk û wêneyên payikî tekez dikin ku ev kon cihekî sivîlî bûn û tu cih yan tiştên leşkerî li wir nîn bûn. ev yek gotinên dîtevanan tekez dike.**

Di 26. 01. 2018 an de NRLS`ê- Şaxê Efrînê komkujiyek din ji hêla balafirên Tirkiyê li navçeya Mabata, belge kir. Balafiran êrîşî malbata Elxatir a Ereb ya ku ev 5 sal bû ji Til Qerah penaber bibû û li herêma Efrînê (devera herî ewleh li bakurê rojavayê Sûriyê) bi cih bibû. Di encama vê êrîşê de 6 ji vê malbata ku ji 7 kesan pêk tê, hatin kuştin. Endamên NRLS`ê çûn cihê êrîşê û karîbûn navê kesên hatine kuştin nas bikin: Taha Mistefa Elxatir (bav) 45 sal, Emîna Elxatir (dê) 40 sal, Mistefa Taha Elxatir 17 sal, Silêman Taha Elxatir 14 sal, Zekiya Taha Elxatir 15 sal û Yisra Taha Elxatir 9 sal.

Piştî demekê û piştî ku endamê dawî ji vê malbatê ji ber birînên xwe mir, ev komkujî di rapora Human Rights watch de hat tekezkirin[11]. Di vê raporê de wisa hat gotin: **"... di 27. 1. 2018`an de bijîşik û hewardaran got ku di saet 2`yê beyaniya 27ê Çile de, hêzên Tirkiyê xaniyek li Mabata li Efrînê top baran kir. Di encamê de 7 kes ji malbateke penaber hatin kuştin. Vê êrîşê tu çekdar nekuştin. Çalakvanekî piştî ku serdana cihê**

[11] Heman jêdera berê.

**êrîşê kiribû got ku 3ê top bi ser xaniyên derdorê de ketin; yek ji wan rasterast bi ser xaniyê vê malbatê de ket; şeş ji wan kuştin û yek birîndar ket. Hiyomin Rayitis Wotiş li hin wêneyên ku ju hundirê odeyê hatibûn girtin, nihêrî. Di wan wêneyan de ziyanên mezin ên ku gihaştine xaniyekî li cihekî niştecihî, diyar in.** Human Rights watch **tu cihên leşkerî li derdora cihê topbarankirî, nedîtin. Dr. Mihemed ê ku li ser kuştî û birîndaran li nexweşxaniya Efrînê radiwestiya, got ku hewardaran roja pêşî 4 term anîn û roja duyem dû termên din dîtin. Got ku keçek ji vê malbatê birînên wê ne giran bûn, lê dema karmendên nexweşxaneyê jê re got ku malbata de hatin kuştin, dilê wê sekinî û mir..."**

Her wiha di raporeke Rêxistina Lêborîna Navnetewî de wiha hat:[12]**"...Sîdo da xuyakirin ( yek ji niştecihên Mabata`ye) ku çawa topek di 25ê Çile de bi ser mala cîranê wî de ket û 5 ji malbata ku ji 6 kesan pêk tê, kuştin: " êrîşê xanî bi yek carê hilweşand û bav, dê û sê zarok ku temenê wan kêmî 15 salan e, kuştin û zarokek di bin kavilan de çend demjimêran ma; tevî ku ji mirinê rizgar bû jî lê rewşa wê tengezar e... Tu cihên leşkerî nêzî vî xanî nebûn... cihê leşkerî yê herî nêzîk 41 km dûr e"** "Grûpa Lêpirsîna Hijmarî" ya rêxistinê bi awayekî serbixwe ev êrîşa xwînî li ser Mabata, tekez kir. Vê rêxistinê di daxuyaniyeke xwe de[13] di 15`ê Avdara 2018`an de daxwaza rawestandina îşkenca sivîlan kir. Di destpêka vê daxuyaniyê de wisa hat: **"Bi boneya bîranîna heftem ji kirîza Sûriyê re, Rêxistina Lêborîna Navnetewî, bang li civaka Navnetewî dike da ku berpirsiyarên xwe hilgire û bi awayekî lezgînî kar bike ji bo astengiya li ser gelê Sûriyê rawestîne û sînorekî ji destdirêjiyên xwînî re ên ku li Xûta Rojhilat û Efrînê pêk tên, deyne..."** Di heman daxuyaniyê de li ser astengiyên sivîlan li Efrînê tekez kir: **"... li Efrînê êrîşên desthilata Tirkiyê û grûpên oposizyonê yên dixwazin herêmê desteserbikin bi sedan sivîlên Kurd ên Sûrî neçar kirine ku birevin..."**

---

[12] Sûriya. Tundkirina êrîşê li ser Efrînê jiyana bi sedan sivîl dixe bi metirsiayn. https://www.amnesty.org/ar/latest/news/2018/02/syria-hundreds-of-civilian-lives-at-risk-as-afrin-offensive-escalates/

[13] Sûriyê. Heft sal ji bêdengiya civaka navnetewî. https://www.amnesty.org/ar/latest/news/2018/03/syria-seven-years-of-catastrophic-failure-by-the-international-community/



Leşkerekî Tirk li serberkê topê bi Tirkî nivîsand:
“malbeta xwe vebjêre silav!”

**Ji komkujiyên ku NRLS`ê belge kirine, ev in:**

Komkujiya Cilbirê (Medcene/ kedîgeha mirîşkan): Di 20`ê Çileyê 2018`an de balafirên Tirkiyê êrîşî Kantona Efrînê kir, di encamê de komkujiyeke zor der heqê sivîlên destvala li gundê Cilbirê yê girêdayî navçeya Şêrewa li Efrînê, pêk hat. Êrîş bi ser kedîgehekê li wî gundî ku malbateke penaber tê de dijîn, pêk hat. Ev malbat, malbata Elhisên bû. Ev malbat ji 8 endaman pêk dihat, tev jî hatin kuştin. Endamên vê malbatê ev in: Rehef Elhisên 33 sal, Wail Elhisên salek, Hedîl Elhisên 10 sal, Xaliya Elhisên 8 sal, Selma Elhisên 6 sal, Miseb Elhisên 6 sal, Ehmed Elhisên 17 sal û termekî nediyar 33 sal.

Komkujiya gundê Ferêre yê girêdayî navçeya Cindêrêsê: Di roja duşemê 5.3.2018, balafieên Tirkiyê komkujiyek der heqê xelkê gundê Firêre yê girêdayî navçeya Cenderîs, pêk anî. Di encamê de malbateke ji deh kesan, di navbera kuşî û birîdaran de bûn qurban. Jixwe tê zanîn ku tu hêzên çekdar li wir nebûn. Nevê kesên ku jiyana xwe ji dest da ev in: Diyana Xazî Elsalih 3 meh û Mehmûd Elo 25 sal. Navê birîndaran jî ev e: zarokekî sê salî bû navê wî nehat naskirin, rewşa wî pir aloz e û ket nexweşxaneyê (beşê çavdêriya taybet), Enwer Elsalih Hesen 15 sal, Mihemed Subhî Elsalih 3 sal, Sebah Cemal Elsalih 25 sal, Fuad xazî Elsalih 25 sal, Subhî Xazî Elsalih 30 sal, Xedîca Mistefa Mistefa 30 sal û Ebdela Tirkî Dawûd 18 Salî.

Li gundê Berkaşa yê girêdayî navçeya Bilbile, xaniyê sivîlan rastî topbarankirina balafirên Tirkiyê hat. Di encamê de hin sivîl birîndar bûn û sivîlek bi navê Reşîd Ebid Elhenan Sîdo ku temenê wî 35 sal bû, jiyana xwe ji dest da. Termê wî di 26. 2. 2018, piştî 14 rojan ji êrîşê, ji bin kavilan hat derxistin.

Di 2`yê Reşemiya 2018`an de gundê Xalita yê girêdayî navçeya Şêrewa li Efrînê ji ber topbarana Tirkiyê, hat hilweşandin. Gund li bakurê rojavayî çiyayê Lîlon dikeve, ji bîst malan pêk dihat. Ev mal li malbata Nasîf Axa vedigerin.

Di 20`ê Reşemiya 2018`an de, demjimêr dehê sibehê, gundê Sêwiya yê girêdayî navçeya Mabata li Efrînê, rastî topbaranê ji hêla Tirkiyê û grûpên çekdar yên girêdayî wê ve, hat. Di encamê de hejmarek sivîl birîndar bûn û sivîlek bi navê Eşref Elî Heyder (kêmendam bû) jiyana xwe ji dest da û serê wî ji gewdê wî hatibû veqetandin.

Di 1`ê Avdara 2018`an de, gundê Meydankê yê girêdayî navçeya Şera li Efrînê, rastî topbaranê ji hêla topên Tirkiyê ve, hat. Di encamê de sivîlek bi navê Hebîba Ibrahîm xelîl Mihemed ku temenê wê 48 sal bû, ji ber ku pîjeyên topê li hûr û pişta wê ketin, jiyana xwe ji dest da. Her wiha xaniyê wê jî hilweşiya.

Topbarankirina zarokan li gundê Basûte: Di roja Duşemê 19. 2. 2018`an de, gundê Basûta yê girêdayî navçeya Şêrewa li Efrînê, rastî topbaranê ji hêla top û rokêtên Tirkiyê ve, hat. Di encamê de hejmarek sivîl û zarok birîndar bûn û hinan jiyana xwe ji dest da. Zarokek bi navê Heyfa Kelaho 13 salî bû, jiyana xwe ji dest da. Hinên din bi birînên cihêreng, birîndar bûn, ew jî ev in: Dîlber Kelaho 13 sal, Mihemed Ziyad Nebîh 9 sal, Henan Mihemed Kelaho 11 sal, Şivan Xelîl Kelaho 7 sal, Cînav, Ziyad Kelaho 8 sal, Êva Xelîl Kelaho 11 sal, Dijwar Nezmî Kelaho 8 sal, Xelîl Nebîl Kelaho 42 sal û Basil Cumia Umer 75 sal.

Topbarankirina karwaneke sivîlan, li ser rêya gundê Berbenê yê girêdayî navçeya Raco, di dema penaberbûna wan ji gundê wan ji ber topbarana Tirkiyê ya tund. Di 5. 3. 2018an de, siwareya sivîlekî bi navê Mihemed Hisên Şêxo di dema ku wî hin sivîlên ji gundên Eşwêne yê girêdayî navçeya Bilbile û gundên Zarka û Cencaliyê yê girêdayî navçeya Raco

vediguhestin Efrînê, rastî topbaranê ji hêla Tirkiyê ve, hat. Di encamê de 21 sivîl birîndar bûn û hinan jiyana xwe ji dest da. Li gorî tekezkirina nexweşxaneya Efrînê, piraniya birîndar û kuştiyan ji zarok û jinan bûn. Navê birîndar û şehîdan ev e:

| | | | |
|---|---|---|---|
| Birîndarên ji gundê Eşûne | Fewziya Mihemed Êbiş 35 sal | Hidayet Elî Umer 40 sal | Ilham Menan Xelîl 50 sal |
| | Aliya, nasnameya wê bi giştî nehat naskirin ji ber ku di çavdêriya taybet di nexweşxaneyê de ye | Şiyar Ebdilqadir 8 sal | Dicle Ehmed Bekir 26 sal |
| Navên birîndarên ji gundê Zarka | Nîroz Hesen Mistefa 35 sal (çavên xwe ji dest dan) | Emîna Mihemed Mistefa 80 sal | Emîna Eslan Mistefa 60 sal (jiyana xwe ji dest da) |
| Navên birîndarên ji gundê alincaliya | Cumana Ehmed Mûsa 8 sal | Ehmed Hisên Mûsa 47 sal | |
| Navên birîndarên ji gundê Berbane | Nezîfa Mihsin Mistefa 20 sal | | |
| Navên birîndarên ji gundê Cobana | Mihemed Hisên Şêxo 54 sal | | |

Ji wêneyan ve tê xuyakirin ku piraniya birînan di serî de ne. Ev jî pirsekê derdixe, gelo çi çek hatine bikaranîn?

Gerek e were gotin ku artêşa Tirkiyê 3 komkujiyên din jî di heman dîrokê de li van deveran pêk anîn: Nevçeya Cendirês, gundê Firêre yê girêdayî navçeya Cendirês û gundê Qeretepe yê girêdayî navçeya Şera.

Di dîroka 5.3. 2018 an de Tirkiyê gundê Qertepe topbaran kir. Hin birîndar û şehîd ev in: Eslan Eslan, Hesen Mihemed Şêxo 60 sal, Remziya Ebdilrehman 50 sal (jiyana xwe ji dest da) û Nebî Ismaîl Şêxo 61 sal ( destê wî yê rastê jê bû).

Komkujiya Hêkice: di 13. 2. 2018an de balafirên Tirkiyê şkeftek li gundê Hêkce yê girêdayî navçeya Şiye, topbaran kir. Hin sivîlan ji ber topbarana Tirkiyê li ser gund xwe li wê şkeftê girtibûn. Di dema topbarandinê de, hin sivîl li devê şkeftê bûn. Di encaamê de du jinan di cih de jiyana xwe ji dest da û hin sivîlên din bi birînên cihêreng birîndar bûn. Navê hinan ji wan ev in: Fehîma Hemada (jiyana xwe ji dest da) Horiya Ebid Hecres 45 sal (jiyana xwe ji dest da) û Semîr Mihemed elî 21 sal, Leyla Mistefa 45 sal û Hisên Silêman Hesen 37 sal birîndar bûn.

Di 27`ê Reşemiya 2018`an de artêşa Tirkiyê siwareyeke sivîlî di dema derketina wê ji gundê Yelanqûzê girêdayî navçeya Cendirês ku jinek û kurê xwe tê de bûn, topbaran kir. Di encamê de kurê bi navê Mehmûd Ehmed Menkawî 21 sal di serê xwe de birînên mezin xwarin û diya wî jî birîndar bû û ji aliyê derûnî ve rewşa wê pi aloz bû.

Ji bilî van bi dehan birîndar hebûn, lê em gişan naînin ser ziman.

# Dîroka Tevgera Siyasî Ya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê

## Ji Destpêkê Ve, Ji Sala 1956’an Heyanî Çareka Yekemîn Ji Sala 2015’an

Dema ku em bixwazin lêkolînekê der barê destpêka tevgera siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistanê û  Sûriyê de çêkin, ew lêkolîn bi hêsanî nayê amadekirin, ji ber kêmbûna pirtûk, çavkanî û belgeyên ku bûyerên qewimî ji destpêkê ve heya roja îro ne tomarkirî ne. Lê hejmarek pir kêm ji çavkaniyan hene wek komele, yane û hin weşanên çandî û wêjeyî. Ew çavkanî jî girêdayî destpêka avakirina tevgera çandî û wêjeyî li rojavayê Kurdisatan û Sûriyê de, di dema koçberbûna hin kesayetên kurd bo Rojava piştî têkçûna şoreşên kurdî di navbera her du şerên cîhanî de. Ew qonax bû gava destpêkê ku bi xwe re avakirina yekemîn tevgereke siyasî û nûjen ji kurdan re li Rojava û Sûriyê anî holê. Her wiha ew belgeyên girêdayî qonaxa damezrîner a tevgera siyasî ya kurdî ya ku di çarçoveyeke partîtî de hatibû birêxistin, ji ber sedemên objektîf, hatin telefkirin û şewtandin. Rêjîmên serdest ên wê demê, hemû belge û belavokên siyasî yên girêdayî çalakiyên tevgera kurdî, telef kirin. Dîsa jî, belgeyên mayî yên ku neketibûn destê rêjîmên serdest, ji ber ku bi awayekî ne ewle û di mercên zehmet de dûrî çavdêriya dezgehên saloxgêran (îstixbarat) ên girêdayî rêzehikûmetên peyhatî bûn û di deverên ne guncav de dihatin veşartin bêyî ku dîqet bidin mercên hewayê mîna germahî û hêmî, bi temamî telef bûn. Ji ber vê yekê, peydakirina agahiyên rast û tekez girêdayî wê serdemê ji dîroka tevgera kurd a siyasî kedeke pir mezin dixwaze. Ew agahî jî, bi rêya hevpeyvînên bi kesayet û serokên ku ew dem jiyan kiriye û hîn jî zindî ne û bi hewldanên vegerandina bîrweriya wê demê ya ku ji pûçbûn û lawazbûnê bê par nema, hatin bidestxistin.

Di vê lêkolînê de, me hewl da em bighêjin rastiyeke bêalî di riya hevrûkirina agahiyên di destên me de. Me ev hevrûkirin pêk anî bi vegera me li hemû hevpeyvînên berê bi kesayetên ku beşdarî bûyerên wê demê bûne yan jî pê re jiyan kirine û bi vegera me li hin pirtûk û gotarên nivîskarên ku ew dem jiyan kirine û hin belgeyên ku di destê me de mane jî.

## Tevgera siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistan û li Sûriyê

Piştî bidawîbûna Şerê Cîhanê yê Yekemîn di sala 1918'an de û biserketina dewletên Fransa û Berîtanya di vî şerî de, Rojhilata Navîn li gorî Peymana Sykes-pîko dabeşî dewletine neteweyî bû. Erdnîgariya Kurdistanê carake din piştî vê peymanê hate parçekirin; parçebûna yekem di navbera dewletên Osmanî û Sefewî de di sala 1639'an de li gorî Peymana Qesra Şêrîn li Iranê, çêbû.

Di sala 1921'an de Peymana Enqere di navbera Fransa û Komara Tirkiyê de, ji bo parvekirina tixûbên Komara Tirkiyê ya nûavakirî û herêmên Sûriya yên di bin destê Fransa de, hate morkirin. Her wiha Berîtaniya û Tirkiyê, ji bo parçekirina tixûbên di navbera Tirkiyê û herêmên Iraqê yên di bin destê Berîtaniya de, li hev kir. Ew peyman ji bo kurd û Kurdistanê weke derbeya mirinê bû. Li gorî vê peymanê, Tirkiyê destê xwe ji herêmên Mûsil û Kerkûk ên li başûrê Kurdistanê vekişand. Li hember jî, divê Berîtaniya destê xwe ji Peymana Sîver vekşîne û Peymana Lozan li şûna wê pêk bîne, her wiha divê xwe li ser kiryarên dewleta Tirkî li dijî hebûna kurdî li bakurê kurdistanê, çavgirtî bike. Di riya plankirina komployekê di 15' sibata 1925’an de ku beriya rabûna Şoreşa Şêx Saîdê Pîran pêk hat û di encamê de Şoreşa Şêx Saîd beriya dema ku jê re hatibû plankirin – hatibû biryarkirin ku di 21’adara 1925’an rabe- rabû.

Komara Tirkiyê bi serweriya Mistefa Kemal Etaturk rengê îslamiyetê ji holê rakir. Piştî ku hêzên rojavayî û bi taybet Berîtaniya û Yekîtiya Soviyet piştgirî û destek danê, rengê sekularîtî ji serweriya xwe re kir bingeh. Her wiha xwe ji pêkanîna Peymana Sîver a sala 1920’an de vekişand û piştre jî xwe ji Peymana Lozan jî sala 1923’an a têkilîdarê kêmneteweyên mîna ereb, kurd, ermen û asûriyan, vekişand. Ev yek jî bû sedema lidarxistina Serhildana Şêx Saîdê Pîran dijî Komara Tirkiyê di sala 1925’an de. Tirkiyê ew serhildan têk bir û gelek komkujî jî der heqê kurdan de pêk anîn. Lê nekarîbû hestên kurdewarî yên geşbûyî bo bidestxistina mafên xwe, têk bibe. Di sala 1927’an de, Şoreşa Agirî bi pêşengtiya Ihsan Nûrî Paşa rabû, ew berdewambûna Şoreşa Şêx Saîdê Pîran bû û heya sala 1932’an dewam kir. Heman rewş di Şoreşa Seyid Riza de bû ya ku li Dêrsimê di sala 1937’an rabû. Ew jî yek ji rêzeşoreşên kurdî yên ku li pey hev rabûn dijî siyaseta inkar û tunekirina gelê kurd ji hêla dewleta Tirk ve û

nepêbendbûna wê bi hemû peyman û rêkeftinên navneteweyî yên têkilîdarê pirsgirêka kurdî di navbera herdu şerên cîhanê de. Mirov dikare bibêje ku têkçûna Serhildana Seyid Riza wek bidawîbûna serdema serhildanên kurdan li bakurê Kurdistanê bû. Piştî wê serhildanê, şoreş li bakurê Kurdistanê sekinîn heya ku Partiya Karkerên Kurdistan (PKK)'ê di 15'ê tebaxa 1984'an de dest bi şoreşa çekdarî kir a ku heya roja îro jî dewam dike.

Siyaseta Tirkiyê ya faşîst û qirkirinê li hemberî şoreşên kurdî bû encama koçberbûna gelek siyasetvan û çalakvanên kurd ber bi herêmên kurdî li Sûriyê, yên ku di bin desthilatdariya Fransayê de bûn. Hin ji wan çalakvanan; Mîr Celadet Bedir-Xan, Dr. Ehmed Nafiz, Osman Sebrî, Hemze Miksî, Ekrem Cemîl Paşa, Qedrî Cemîl Paşa, Mehmûd Selîm, Qedrî Can Dêrikî, Nûrî Dersimî, Hesen Hişyar, Ebdulrehmen Elî, Yûnis Axa, Emîn Ehmed Berêxanî, Nûredîn Zaza, Haco Axa El-Hevêrkî.

Lê hikûmeta Fransa ew çalakvan dûrî herêmên nêzî tixûbên Tirkiyê kir û çalakiyên wan qedexe kirin û ew şandin bajarên dûrî tixûbên Tirkiyê mîna Şam li Sûriyê û Beyrût li Lubnanê. Wê demê, Mîr Celadet Bedirxan sozdayînek ji generalê ferensî Wêgan re şand û tê de diyar kir ku koçberên kurd li Sûriyê tu caran çalakî dijî dewleta Tirkiyê li dar naxin bo ku dewletên alîgir bihêrs nebin.

Ev reftara ferensî di çarçoveya parastina tixûbên nûçêkirî û bicihkirina wan li gorî Peymana Sykes-Picot, hate meşandin.

Stalîn, heman helwest der barê rewşa kurdan li Kurdistana Sor bi kar anî, ji bo ku kurdan dûrî tixûbên Tirkiyê bixe û wan bi tirênên mirinê koçberî Asiya Navîn bike, di riya peymaneke sêalî di navbera “Rûsiya Soviyet, Azerbeycan û Tirkiyê” de. Divê bê gotin ku Lênîn (pêşengê Şoreşa Rûsî) erşîfa girêdayî rewşa kurdan di Peymana Sykes-Picot de eşkere kir. Her wiha peyamên ku di navbera Ebdulrezaq Bedirxan, Seyid Taha Nehrî û Simko Axa Şekakî ji aliyekî; û qeyseriya Rûsiya ji aliyê din ve dihatin şandin jî, eşkere kir. Armanca wan danûstandinan ku herêmeke xweser li erdên kurdan ên li Tirkiyê (bakurê Kurdistanê) bê avakirin, di çarçoveya peymana hevkarî di navbera qeyseriya Rûsiya û serkêşên kurd de. Ew jî bû sedem ku Seyid Taha Nehrî û Ebdulrezaq Bedirxan ji hêla Tirkiyê ve bêne

bidarvekirin, Simko Axa jî ber bi herêmên eşîra şikakiyan li Kurdistana Rojhilat ve reviya.

Bi domandina siyaseta cewsandinê li ser gelê kurd ji hêla dewleta Tirkiyê ve, gelek kesayetên welatparêz ji Kurdistana Bakur koçberî Kurdistana Rojava û Sûriya bûn û gelek komeleyên çandî û siyasî li rojavayê Kurdistan û li Sûriyê ava kirin; ji bo ku çanda kurdî bê belavkirin û hişmendiya siyasî li cem kurdan bê hişiyarkirin. Ji wan komeleyên çandî û siyasî: Komeleya Xoyîbûn, yê ku di 5'ê rezbera 1927'an de li bajarê Behmdûn ya nêzîkî Beyrûtê li lubnanê ava bû. Ew ne tenê komeleyeke kurdî bû, ew xebateke siyasî û çandî ya hevbeş di navbera kurd û ermeniyan de bû. Çalakiyên vê komeleyê bal dikişand ser bakurê Kurdistanê, bi armanca piştgiriya serhildanên kurdî yên li wir radibûn û bi taybet Serhildana Agirî bi pêşengtiya Ihsan Nûrî Paşa.

Ev komele gelek komeleyên çandî dan avakirin û gelek kovar û rojnameyên kurdî weşandin mîna Kovara Hawar, Ronahî û Roja Nû. Her wiha ji bo ku xebata siyasî û çandî ya kurdî vedeng bide, gelek yaneyên ciwanan ên werzîşê hatin vekirin. Mîna Yaneya Henano li Şamê ku di salên sihî ji sedsala bîstan de ava bû; Komeleya Hevkarî û Alîkariya Xizanên Kurd li Hesekê di sala 1932'an de ku ji hêla endamên Komeleya Xoyîbûn ve -yên ku koçberî Rojava bûn piştî têkçûna Serhildana Agirî- hate damezrandin, hin ji wan endaman; Hesen Haco Axa, Arif Ebas, Cegerxwîn, Ehmed Nafiz, Ebdulrehmen Elî Yûnis, Emîn Ehmed Birêxanî, Hemze Beg û hwd. Armanca wê komeleyê dayîna alîkarî bo xizanên kurd û baldayîna pirsgirêkên civakî di riya komkirina alîkariyan ji dewlemendên kurd.

Li kêleka van komele û yaneyên çandî yên ku bi awayekî çalak û aktîf li Rojava dixebitîn, rola oldarên ku olrêyên kurdî dişopandin gelekî bibandor bû. Ew di damezrandina yekemîn partiyeke siyasî ya kurdî alîkar bûn, her wiha piştgirî da tevgera neteweyî ya kurdî li Rojava û hemû parçeyên Kurdistanê.

Malên meleyan bûbûn dibistanên olî û jê gelek oldar derçûn. Lê, hestên neteweyî yên fêrkerên ku hem oldar, hem welatparêz û hem jî rewşenbîr bûn, bandoreke pir mezin li ser şagirtan dikir. Gelek xwendekar ên ku ji van dibistanan derçûn beşdarî tevgera kurdî ya siyasî, çandî û wêjeyî bûn. Her

wiha gelek helbestvan, nivîskar, dîroknas û kesên ku girîngî didan ziman û rêzimana kurdî mîna: Cegerxwîn (Mele Şêxmûs), Mele Nûrî, Mele Ehmed Namî, Mele Tahir Botî (Benkî), Mela Emîn, Mela Ehmed Botî û hwd, beşdarî vê tevgerê bûn. Wan jî bi komek rewşenbîr û têkoşerên din re mîna dîroknas Hesen Hoşyar û zimanzanê kurd Reşîdê Kurd tevgereke neteweyî û çalak li Amûdê demzrand.

Êdî yekemîn yaneya kurdî li Amûdê di nîvê salên sihî ji sedsala çûyî de bi navê "Yaneya Ciwanên Kurd li Amûdê" hate avakirin bi rêvebertiya Cegerxwîn û li kêleka wî jî Mehmûd Elî Şewîş li ser disekinî. Di yaneyê de, xwendekar hînî helbestên kurdî, zimanê kurdî bi tîpên latînî, dîrok û erdnîgariyê dibûn. Di wê demê de, hawîrdora siyasî bo piştgiriya tevgera niştîmanî ya Sûrî bi hestên welatparêzî dagirtî bû, bi armanca bidawîkirina serdestiya Fransa li ser Sûriyê. Di encamê de “Toşa Amûdê” di sala 1937’an de bi destê hikûmeta Fransayê çêbû û Yaneya Ciwanên Kurd li Amûdê hate şewtandin.

Bi van bûyeran re, pêwîstiya avakirina komele û yaneyên ciwanan bi rengekî werzîşî derkete holê û wisa Komeleya Yekîtiya Xortan li Taxa Kurdan (Ruknedîn) li Şamê di sala 1939’an de hate demzrandin. Herwiha Yaneya Salahedîn a Çandî û Yaneya Henano jî tevlî xwe kir, lewre jî navê wê bû Yaneya Kurdistanê. Bi saya ked û xebatên her du têkoşerên kurd Osman Sebrî û Nûredîn Zaza, gelek ciwanên kurd tevlî wê yaneyê bûn. Armanca wê yaneyê kombûna ciwanên kurd, belavkirina hestên neteweyî yên kurdî di nava ciwanan de û vekirina kursên (dewre) hînbûna zimanê kurdî. Rewşa kurdî bi rengê komeleyên çandî û yaneyan heya binketina Komara Mehabadê di 17’ê berfanbera 1946’an û derketina Fransa ji Sûriyê, dewam kir. Komeleya Xoyboun jev ket û lawazî kete rewşa kurdî ya siyasî û çandî heyanî salên pêncî.

Di salên pêncî de piştî derketina Fransa ji Sûriyê, gelek zext li ser çalakiyên tevgera neteweyî ya kurdî çêbûn, ji hêla şepêlên komunîst û Baasî yên şovînîst mîna : Partiya Komunîst a Sûrî, Partiya Baas a Erebî ya Sosiyalîst û Partiya Neteweyîya Civakî ya Sûrî, li eliyekî din jî zextên ji hêla axe û begên kurdan ve. Tevî ew mercên zehmet, Komeleya Çandî ya Nehînî (El-Camîya El Seqafiya El Siriye) li Helebê di sala 1951’ê de, wek

bersivdayînek li ser lawazbûna rewşa kurdî di wê demê de, hate demzrandin.

Ev komele ji hêla Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemde Elî Xoce û Qadir Ibrahîm ve hat damezrandin. Armanca wê belavkirina çanda kurdî û hestên neteweyî bû. Lê ev komele jî dom nekir û di haman salê de hate keşfkirin û hemû endamên wê ji hêla Ewlehiya Sûriyê ve hatin binçavkirin û ew xistin Zindana Meza li Şamê. Li Qmişlo jî komeleyek bi navê Yekîtiya Ciwanên kurd ên Demokratîk di sala 1953'an de ji hêla Mihemed Mele Ehmed bi nasnav (Mihemed Tûc), Ebdulezîz Mele Ebdî, Derwêş Mele Silêman û Samî Mele Ehmed Namî ve, hate damezrandin. Tişta bala mirov dikşîne ku girîngtirîn armancên vê komeleyê rizgarkirin û yekîtiya Kurdistanê, destûrdayîna avakirina dibistanên bi zimanê kurdî û avakirina klûb û komeleyên xêrxwazî, çandî û çivakî bûn. Ew armanc jî  piştre bûne armancên Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Sûriyê ya ku di 14' ê pûşbera sala 1957'an de bi awayekî fermî hate ragihandin.

Her wiha di sala 1959'an de, Encûmana Zindîkirina Çanda Kurdî (Encûmen) li Şamê hate damezrandin bi inîsiyatifa Osman Sebrî û tevlîbûna Ebdulhemîd Hac Derwîş û xizmên wî “Mihemed Salih Hac Derwîş û Mecîd Hac Derwîş", xidir Ferhan, Saedalah Îbo (Saedo) û Adil ji Çiyayaê Kurdan û bi piştgirî û alîkariya  Rewşen Bedirxan hevjîna Mîr Celadet Bedirxan. Wê komeleyê, di salekê de, gelek pirtûk û dîwanên helbestên bi zimanê kurdî çap kirin û elfabêya kurdî ya ku ji hêla Osman Sebrî ve hatibû nivîsandin, weşandin. Her wiha wê komeleyê di nav gelê kurd de deng veda û piştgiriyeke moralî dît da ku bi damezrandina partiyeke siyaî bihizire; ev yek bû dendika pêşî bo damezrandina Partiya Kurdên Demokratîk li Sûriyê (PKDS)ê di sala 1956'an de, . Hizira damezrandina vê partiyê di hiş û mêjiyê Osman Sebrî de ji destpêka dîroka tekoşîna wî de bi cih bibû. Li aliyekî din, rewşenbîrê kurd Nûrî Dersimî li bajarê Helebê di sala 1956'an “komeleya Zanebûn û Hevkariya Kurdî “de damezrand. Despêka komeleyê ji mala wî bû bi tevlîbûna Mîr rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Osman Efendî, Heyder Mihemed Kinco û hwd. Wan hewl da ku alîkariyê bidin xizanên kurd, her wekî ku Komeleya Hevgirtin û Alîkariya Xizanên Kurd li bajarê Hesekê sala 1932'an ev yek pêk dianî.

Di sala 1956'an de, rewşa kurdî li Sûriyê û li rojavayê Kurdistanê bi hikûmeta Sûrî ya neteweyî re lihevkirî bû; tu nakokî bi dewleta Sûriyê ya nûjen a ku bi derbeyên lipeyhevhatî re mijûl dibû, tune bû. Ew derbe hişt valabûnek di qada serwerî li Sûriyê çêbibe û rê li ber kurdan vebû ku bikevin tevgerê û xwe bi rêxistin bikin.

Her wiha kesayetên ku koçberî rojavayê Kurdistanê bûn, dest bi damezrandina komele û rêxistinên siyasî kir. Mîna Osman Sebrî, xwediyê hizira avakirina partiyeke siyasî rizgarî ya ronîkar ji bo kurdên Sûriyê bû, nemaze piştî jevketina hemû komele û komên çandî û siyasî yên kurdî li Sûriyê û bi taybet piştî jevketina Komeleya Xweyîbûn û hilweşandina Komara Mehabadê. Osman Sebrî û kesayetên li derdora wî haya wan ji metirsiya vê rastiyê li ser çareûsa kurdên Sûriyê hebû, ji ber wê rewşê valahiyeke siyasî û rêxistinî çêkir. Ew jî bû encam ku gelek rêxistin, tevgerên îslamî û partiyên cur bi cur derbasî qada kurdî ya siyasî bibin her wekî Partiya Komunîst ya Sûrî û hin partiyên din ên erebî û bi taybet partiya herî berztirîn Partiya Baas a Erebî ya Sosiyalîst ji aliyekî û Cemaeta Îxwan Elmuslimîn ji aliyekî din ve.

Bi hêviya komkirina ciwanên kurd û çîna karker ku piraniya wan beşdarî rêxistinên biyanî yên dûrî çanda kurdîtiyê bûbûn, her wiha ji bo ku valahiya siyasî ji hêla partiyên biyanî neyê dagirtin û ji bo derî li ber belavbûna civaka kurd bê girin, hinek rewşenbîrên wê demê dest bi damezrandina Partiya Kurdên Demokratîk li Sûriyê kir, bi înîsiyatifa têkoşer Osman Sebrî damezrînerê sereke ya PKDS'ê Partiya Kurdên Demokratîk li Sûriyê. Ew yek jî bi armanca avakirina rêxistineke siyasî ji çîna karker û cotkarên kurd re bû(piraniya herî hejar di civaka kurdîdi wê demê de) ji bo ku pêşengtiya wê qonaxê bikin dûrî serdestiya beg û axeyan (fewdalên kurd) bi pêşengtiya têkoşer Osman Sebrî, yê ku her dem dijbertî bi wan re dikir ji ber bêhaybûna wan ji berjewendiyên gelê kurd di bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û siyasî.

**<u>Qonaxa damezrîner a yekemîn a El-Partî</u>**

**Qonaxa damezrîner a yekemîn ji bo avakirina yekemîn partiyeke siyasî kurdî li rojavayê Kurdistanê û li Sûriyê:**

Piştî amadekariyên ji bo hazirkirina rêziknameya bi zimanê kurdî û bi tîpên latînî ji hêla Osman Sebrî ve (ji ber ku wî bi zimanê erebî nizanibû), qonaxa damezrîner a yekemîn li Şamê dest pê bû û rêziknameya partiya nûsazkirî bi amadebûna Osman Sebrî û gelek kesayetên kurd mîna Ebdulhemîd Hac Derwîş ji Dirbêsiyê û Hemze Niwêran ji Serê Kaniyê, hate nîqaşkirin. Birêz Ebdulhemîd Hac Derwîş tesdîq dike ku tenê sê kes hazir bûn, lê birêz Cemal Şêx Baqî biraziyê Şêx Mihemed Îsa da xuya li ser zimanê bavê wî Şêx Mihemed Baqî ku Şêx Mihemed Îsa kesê çaremîn ê ku di wê civînê de hazir bû, dêmek hejmara damezrînerên wê partiya nûsazkirî çar kes bûn ku di havîna 1956'an de hate lidarxistin.

Her wiha gelek rewşenbîrên kurd ên ku pir caran diçûn Şamê, destek û piştgirî da hizira damezrandina partiyeke siyasî li rojavayê Kurdistanê mîna: Ebdulrehmen Eldubêhî/wezîrê werzîş û ciwanan di Komara Mehabadê de, Ebdulah Ishaqî/sekreterê Partiya Demokratîkî ya Kurdistanî li Îranê, birêz Celal Telebanî yê ku wê demê hîn xwendekar bû di kolêja zagonê li Zanîngeha Şamê û di heman demê de jî penaber bû, Ebdulrehmen Qasimlo/sekreterê Partiya Demokratîk ya Kurdistanî li Îranê, her wiha divê rola girîng ya  Rewşen Bedirxan ku destek û piştgirî da wan bo ku vê gava girîng di dîroka tevgera siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistanê û Sûriyê biavêjin, neyê jibîrkirin.

Piştî avêtina yekem gav di avakirina yekemîn partiyeke siyasî kurdî li Sûriyê, feodalên kurd ji tirsa berjewendiyên xwe li dijî wê derketin, ji ber ku ew ji kevn de tenê xwe weke nûner û berpirsiyarê gelê kurd li Sûriyê didîtin. Her wiha Partiya Komunîst ya Sûrî li dijî wê partiyê derket ji ber ew gav metirsiyeke mezin li ser bandora vê partiyê di hawîrdorên gelêrî yên kurdî yên ku piraniya alîgirên wê kurd bûn, çêkir.

Têkoşer Osman Sebrî di cih de bingeha pêşengtiyê ya vê partiyê bi xebat û kedeke rêxistinî ava kir, û dest bi belavkirina ramana rêxistinî û amadekirina kadirên yekemîn kir bo dest bi gava duyem bike û xebata xwe di nava gel de bimeşîne.

Di sala 1957'an de komeke siyasî kurdî bi navê Partiya (komeka Azadî) li Qamişlo ji hêla Mihemed Fexrî, helbestvan Cegerxwîn, Mela Şêx Mûsa Qereqolî û hwd, hate avakirin. Piraniya wan ên ku xwe ji Partiya Komunîst

vekişandibûn û xwe di nava vê komê de birêxistin kir û bernameyeke siyasî û rêzikname jê re çêkir, lê ew kom dom nekir û jevketina xwe piştî damezrandina El-Partî ragihand.

Di heman salê de, rêxistinek ji xwendekarên kurd re hate avakirin, civîna yekem a vê rêxistinê li mala Miqdad Beg Cemîl Paşa bû. Ew rêxistin gelek endamên kurd ji Sûriya û Îraqê di nav xwe dihewand mîna: Elî Fetah Dezheî wek serok, Izedîn Mistefa Resûl wek sekreter, Ebdulhemîd Hac Derwîş, Qasim Miqdad Cemîl Paşa, Omer Mihiyadîn Şerîf, Mûeyed Ebdulxefar Neqeşbendî, Subhî Reşo,Ismaîl Ebdulhenan, Xelîl Mihemed Ebdulezîz, Talaet Nadir (xwendekarekî amadehî). Civîn di malekê li taxa Sûka Sarûcê hate lidarxistin û 18 xwendekar tevlî bûn, ji wan: Cemşîd Celadet Bedirxan û Dawûd Hersan. Wan Cejna Newrozê li Şamê li xwaringehekê li bajaroka El-Rebwa nêzî Şamê pîroz kir.

**<u>Qonaxa Damezrîner A Duyem A El-Partî:</u>**

**Qonaxa damezrîner a duyem ji bo avakirina yekem partiyeke siyasî ya kurdî li rojavayê Kurdistan û Sûriyê**

Der barê El-Partî de, qonaxa damezrîner a duyem ji bo avakirina partiyê di 14'ê hezîrana 1957'an de dest pê kir. Ew jî berdewambûna qonaxa damezrîner a yekem ya ku di sala 1956'an de dest pê kir, bû. Gelek kadirên kurd ên nû ji Efrînê (kurdaxê) beşdarî vê partiyê bûn piştî ku xwe ji Partiya Komunîst a Sûrî vekişandin, bi sedema weşandina daxuyaniyekê li Helebê ji hêla Partiya Komunîst bi zimanê erebî û ermenî, ew kesayet li dijî vê kiryarê derketin û xwestin ku zimanê kurdî li gel zimanê erebî û ermenî di belavokên wê de bê bikaranîn. Li aliyekî din, têkoşer Osman Sebrî, xebatên mezin di nava kesayetên siyasî yên kurdî di hundirê partiyê û rêxistinên din de dimeşandin, bi armanca tevlîkirina wan li partiya kurdî ya nû, lewre jî têkiliyên xwe bi wan re dewam kir û her tim serdana wan dikir, ji wan kesayetan: Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed ên ku ji Efrînê bûn. Wan ew raman pejirand bi mercê ku roja tevlîbûna wan weke roja damezrandina fermî ya wê partiyê be û divê bername û rêziknameya wê bêne guhertin. Piştî ku Osman Sebrî ew merc qebûl kirin, gelek kesayetên kurd tevlî partiyê bûn û bi vî awayî hejmara rast a damezrînerên rastîn a vê partiyê yên ku di civîna damezrîner a ku li Helebê

hate lidarxistin, heft bûn : Osaman Sebrî, Ebdulhamîd Hac Derwêş, Hemze Niwêran, Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed, lê Şêx mihemed Îsa di wê civînê de ne hazir bû ji ber ku yan li Saûdiyê "Umrah" dikir yan jî li Qahîre xwe derman dikir, ji ber vê jî navê wî di lîsteya damezrînerên El-Partî de tune bû; lê xebatên wî berî damezrandina El-Partî hebûn, ew beşdarî gelek civînên ku beriya ragihandina El-Partî berî sala 1957'an bû û bi vî rengî dibe kesayeta damezrîner a nehazir di ragihandina fermî ji El-Partî re di sala 1957'an de.

Piştî ragihandina fermî ji damezrandina El-Partî re, vê partiyê di civaka kurdî li herêmên kurdan bi taybet û li Sûriyî bi giştî heya sala 1958'an tê dikoşî. Di sala 1958'an de, yekîtiyek di navbera Sûriya û Misirê de çêbû bi navê Komara Erebî ya Yekgirtî bi serokatiya Cemal Ebdulnasir. Ew yekîtî zagona jevxistina partiyên li Sûriyê derxist, lê ev zagon li ser Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Sûriyê nehate meşandin ji ber du sedeman :

1-Hikûmeta Yekîtiyê dixwest kurdên başurê Kurdistanê nêzîkî xwe bike ji bo ku Îraqê jî tevlî yekîtiya xwe bike.

2- Ji bo ku kurdên sûrî wek kaxezeke zextê li dijî Hevbendiya Bexdadê û bi taybet Tirkiyê ya ku endameke wêye, bi kar bîne.

Ebdulnasir, wezîr Kemaldîn Rifaet wekî nûnerekî bi navê xwe şand ji bo ku danûstandinan bi pêşengê El-Partî re bike di civîneke duber ku li bajarê Helebê hat lidarxistin, bo ku wî qayil bike berê têkoşîna xwe bide Tirkiyê, lê pêşengê El-Partî ew pêşniyar nepejirand.

Li aliyekî din, di wê demê nakokiyên di navbera El-Partî û çîna beg û axeyên kurd (feodal) dihatin jiyankirin. Wê demê, tirsên feodalên kurd ji lawazbûn û kêmbûna rola wan di civaka kurd de, zêde dibûn; ji ber belavbûna hişmendiya rêxistinî di nav gel de bi pêşengtiya hin rewşenbîrên kurd û kesên xwedan hizirên rizgarî, komunîst, çep û welatparêzî, nemaze piştî kombûna gelê kurd li derdora yekemîn rêxistineke siyasî ya kurdî li Sûriyê (El-Partî). Li vir, birêz Celal Telebanî mudaxele kir ji bo ku nakokiyên di navbera El-Partî û bagan de çareser bike. Li gorî baweriya birêz Celal, divê beg piştgiryê bidin El-Partî. Di vê çarçoveyê de, pêşengên El-Partî di destpêka sala 1958'an de pêşniyar li Dr. Nûredîn Zaza kir ku beşdarî rêxistinê bibe, lê wî di cih de erê nekir û yekbûn bi began re kiribû merc ji

bo ku tevlî El-Partî bibe. Piştî gelek gotûbêjan Dr.Nûredîn bi began re şêwirî û di havîna 1958'an de tevlî El-Partiyê bû û bê hilbijartin bû serokê El-Partî û têkoşer Osman Sebrî bû sekreterê wê.

Têkiliyên El-Partî bi Hikûmeta Yekîtiyê re li gorî partiyên din pir baş bûn tevî ku ew pêşniyara wezîrê Misrê Kemaledîn Rifaat qebûl nekir. Lê piştî lidarketina tevgera Ebdulwehab El-Şewaf li Mûsil li Îraqê di sala 1959'an de dijî hikûmeta Ebdulkerîm Qasim û têkçûna wê li ser destê hêzên kurd (pêşmerge), rewş bi hikûmetê re hat guhertin û êdî hikûmetê dest bi kampaniya binçavkirinê di nava refên El-Partî de kir û hejmara girtiyên siyasî ên kurd gihaşt 150 kadirên pêşeng, ew bi armanca têkbirina tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê rastî teror û îşkenceyên bipergal dihatin. Kêm ji endamên tevgerê dervayî zindanê man mîna Ebdulhamîd Hac Derwîş û Mihemed Îsa ji ber ku xwe ji wan veşartin, li kêleka wan jî Cegerxwîn û Mihemed Elî Xoce jî yên ku ji ber kampaniya binçavkirinê ya sala 1960'î koçberî Îraqê bûn. Piştî lêpirsîna girtiyan û bidawîkirina lêpirsînê 33'ê kes ji wan hatin darizandin. Hikûmeta Yekîtîyê tevahiya erşîfa El-Partî di campaniya binçavkirinê de xist bin destê xwe de. Der barê wê rewşê de Ebdulhemîd Derwîş wiha dibêje:" Me şaş kir dema ku me pêşniyara Hikûmeta Yekîtiyê di riya Kemaledîn Rifaat re, nepijirand".

## Kampaniya binçavkirinê sala 1960'î û destpêka parçebûna El-Partî

### Derketina nîşaneyên parçebûna El-Partî di hundurê girtîgehê de piştî kampaniya biçavkirinê ya sala 1960'î:

Sedema yekemîn a nakokiya hizirî di hundirê El-Partî de ev bû: kêşeya pêbendî bi bername û armancên El-Partî ji hêla têkoşer Osman Sebrî ve û daxwaza bidestxistina mafên çandî û civakî ji hêla Dr. Nûredîn Zaza ve.

Gelek nakokî di navbera pêşengên El-Partî di dema girtinê û di bin îşkenceyê de derketin holê. Nakokiya sereke li ser slogana partiyê (rizgarkirin û yekîtiya Kurdistanê) bû. Ew slogan ji armancên sereke yên bernameya El-Partî bû; li hember, têkoşer Osman Sebrî berevaniya bernameya El-Partî bi giştî kir û li pêşiya komîteya dadgehê qebûl nekir ku dev jê berde. Dema ku qazî pirsa armanc û bernameya El-Partî jê kir, Osman Sebrî bersiva wî da û got: " Ez Kurdistanê dibînim weke ku ez te

niha li pêşiya xwe dibînim û heta ku Baasa Erebî heye, dê her tim Baasa kurdî jî hebe".

Dr. Nûredîn Zaza yê ku aliyê din ji nakokiyê dinimand, xwe ji slogana El-Partî ya rizgarkirin û yekîtiya Kurdistanê vekişand, ji ber ku li ber rewşa girtiyên kurd yên ne siyasî û partîzanên di heman zindanê de girtîne, diket. Dr.Zaza dixwest girtî ji cezayên giran biparêze, her wiha armanc û bernameya sereke ya El-Partî ji ber dadgehê veşêre, lewre jî wî daxwaza mafên kurd ên çandî û civakî kir.

Helwesta Dr.Zaza li gorî nêrîna gelek analîzerên ku ew dem dişopandin û analîz dikirin şêwazeke dîplomatîk bû bi armanca sivikkirina cezaya komek girtiyên ku ji bo daxwaz û armancên El-Partî bi rizgakirin û yekîtiya Kurdisatanê, hatibûn girtin. Dr.Zaza weha gotibû: "Rizkarkirin û yekîtiya Kurdistanê armanceke aşopî ye û ramaneke dûrî pêkanînê ye". Gelekan li ser zimanê Dr.Zaza digotin ku Kurdistan xewneke dûrî pêkanînê ye û ku wî tenê daxwaza mafên kurdan ên çandî û civakî kir; yên ku ji hin mafên El-Partî bûn û bi rewş û qonaxa dijwar re jî aheng bû.

Dema ku kampaniya binçavkirina pêşengên El-Partî di sala 1959'an heya sala 1960'î de xurt bû, hemû endamên komîteya navendî ya El-Partî di zindanê de bûn, ji bilî Ebdulhemîd Hac Derwîş û Şêx Mihemed Îsa, yên ku xwe ji hêzên ewlehî veşartin. Her wiha endamên El-Partî helbestvan Cergerxwîn, Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed ji ber kampaniya binçavkirinê reviyan û koçberî Îraqê bûn. Ebdulhamîd Hac Derwîş û Mihemed Îsa, wan tenê rêvebirina El-Partî li dervayî zindanê dikir, tevî ku Şêx Mihemed Îsa bû sekreterê El-Partî, lê Ebdlhemîd Derwîş El-Partî bi rê ve dibir. Li hemberî vê rewşa ne normal di komîteya navendî de û pirsgirêkên zêde di hundir û dervayî zindanê de, pêwîstî bi çareseriyekê hebû ku rewşên awarte yên ku El-Partî tê re derbas dibû û pirsgirêkên ku di navbera rêveberî û bingeha partiyê de zêde dibûn, çareser bike. Ji ber vê yekê rêveberî girîngiya lidarxistina kongreyekê dît, ji bo lêkolînkirin û çareserkirina pirsgirêkên El-Partî û avakirina komîteyeke navendî nû ji bo çareseriyên pêwîst jê re bibînin. Ew pirsgirêk rê li ber derketina parçebûn û cudabûnan di hundirê El-Partî de vekir nemaze piştî nakokiyên di hundirê zindanê di navbera Dr.Zaza û têkoşer Osman Sebrî de.

Ji ber mercên zehmet ku El-Partî di hundirê zindanê de tê re derbas dibû nemaze piştî nakokiyên di hundirê zindanê de çêbûn, êdî derfeta lidarxistina kongreyeke partiyê ji bo çareserkirina wan pirsgirêkan, nemabû. Ji ber vê yekê jî, konferanseke partiyê hate lidarxistin ku yekem konferans di dîroka El-Partî de bû. Ew konferans di destpêka sibata 1962'yan de li Şamê hate lidarxistin. Kesên ku tê de hazir bûn ev bûn: her sê endamên komîteya navendî Şêx Mihemed Îsa, Ebdulhemîd Derwîş, Hemze Niwêran, her wiha Mihemed Elî Xoce yê ku civîn bi rê ve dibirin, gelek endamên komîteyên navçeyî û kadirên partiyê jî beşdarî vê konfrensê bûn, ji wan: hin ji endamên şaxê partiyê yên demkî weke Saedalah Îbo (Saedo), Ebdulferîd Ebdulah û endamên komîteyên navçeyî mîna Mihemed Mele Ehmed (Toc), Xalid Meşayix, Ebdulah Mele Elî, Xelîl Ebdî (Soro); ji Efrîn û Serê Kaniyê:Mihemed Fexrî, Kemal Ebdî, Bilal Hesen, Sîdo Erslan û Kemal Cemîl; her wiha hin kadirên partiyê mîna Dr. Nûredîn Zaza û Mecîd Haco di konferansê de hazir bûn.

Armanca sereke ji lidarxistina konferansê hilbijartina komîteyeke navendî nû bû. Divê bê gotin jî ku hemû girtiyên siyasî yên kurd endamên El-Partî di dawiya sala 1961'an de hatin berdan, ji bilî Reşîd Hemo yê ku piştî serê salê bi çend rojan hate berdan. Piştre jî Osman Sebrî yê ku di nîviya sibata 1962'yan de hate berdan, ango piştî lidarxistina konferensê bi çend rojan. Lê ew di konferansê de hazir nebûn li gorî prensîpên partiyê û rêbazên wê yên rêxistinî, ku endamtiya her endamekî ku bikeve zindanê yan jî biçe leşkeriyê, di demeke diyar  de bê seknandin.

Konferans bi armanca çareserkirina nakokiyên di navbera endamên El-Partî hat lidarxistin, ew nakokî bandoreke neyînî li ser xebatên wan di hundirê El-Partî de kir. ji ber pirsgirêkên ku di navbera wan de çêbûn û bi taybet di navbera Ebdulhemîd Derwîş û Şêx Mihemed Îsa, konferans negihaşt ku komîteyeke navendî nû ji El-Partî re hilbijêre, yên ku endamên wê bûn ev: Mihemed Elî Xoce, Şêx Mihemed Îsa, Ebdulhemîd Hac Derwîş, Mihemed Mele Ehmed (Toc), Xalid Meşayix, Kemal Ebdî û Bilal Hesen. Yek ji kesên di konferensê de hazir bû (Mihemed Fexrî) li ser encamên hibijartinê weha got: " Lîsteya leşkeran hate hilbijartin". Li gorî gotinên Mihemed Fexrî, tê famkirin ku kesên berpirsê wan nakokiyan careke din hatin hilbijartin, ewên ku parçeyek ji nakokiyan bûn û ne ji çareseriyê bûn.

Di vê civîna yekemîn a komîteya navendî ya hilbijartî de biryar hate dayîn ku komîteyek ji bo lêpirsîna girtiyên El-Partî der barê nakokiyên di navbera wan de çêbûne, bê avakirin. Endamên vê komîteyê ev bûn: Xalid Meşayix, Kemal Ebdî û Bilal Hesen; ji ber ku ew bêalî bûn û têkiliyên wan bi tu kesan re tune bûn.

Wê komîteyê dest bi karê xwe kir û hewl da ku hevdîtinekê bi Dr.Nûredîn Zaza re çêke, lê Dr.Zaza qebûl nekir û ew ji mala xwe qewitandin û îtiraf bi wan nekir û piştgirî da kombûnên di hundirê partiyê de mîna Rêxistina Dêrik û hwd. Ew helwest hişt ku komîteya navendî ya El-Partî Dr. Zaza di hezîrana 1962'yan de ji El-Partî biqewitîne. Piştre komîte bi Reşîd Hemo re civiya û lêpirsîn pê re kir û endamtiya wî (karên rêxistinî) di El-Partî de heya şeş mehan sekinandin. Der barê Osman Sebrî de, komîteya lêpirsînê ew vegerand nava refên El-Partî û bû sekreterê El-Partî.

**<u>Qonaxa parçebûna rastîn a El-Partî</u>**

**Qonaxa parçebûna rastî u guhertina nav û rêbazên El-Partî bo cara yekemîn:**

Di destpêka sala 1963'yan de, konferansa El-Partî ya duyemîn li Qamişlo hate lidarxistin, Osman Sebrî tê de ne hazir bû, lê wek endamekî di komîteya navendî de hate hilbijartin. Di adara 1964'an de, komîteya navendî li Helebê civiya bi beşdarbûna hemû endaman tevî Osman Sebrî yê ku nû ji Beyrûtê hatibû. Di rojeva civînê de, destpêkê "programa siyasî ya nû ya El-Partî hate nîqaşkirin" piştî niqaşkirin û guftûgoyên li ser vê mijarê, kesên hazir li hev kir li ser guhertina navê Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Sûriyê cara yekem bo "Partiya Demokratîk a kurdî li Sûriyê" .

Peyva Kurdistan ji navê partiyê hate rakirin û li ser guhertina programa partiyê li gorî van xalan li hev kir:

1-Rakirina slogana rizgarkirin û yekîtiya Kurdistanê ji bernameya partiyê ya siyasî ji ber negucavbûna wê bi rewşa tevgera kurdî, planên wê yên siyasî û armancên wê yên qonaxî re.

2- Kurdên li Sûriyê neteweyeke duyemîn e piştî neteweya erebî, mafên wan ên rewa hene, ew mileteke ji nijadeke parçebûyî pêk tê û ew ne kêmnetewe ne.

3-Mafên kurdan li Sûriyê mafên siyasî, çandî û civakî ne, lê cewhera wan bendan nehate naskirin û ew li gorî prensîpên Neteweyên Yekbûyî yan jî têgîna Marksîst-Lênînîst nehatin şîrovekirin an jî analîzekirin.

4- Divê El-Partî peywendiyên biratî û partîtî bi partiyên din ên Kurdistanî re pêk bîne.

Kopiyek ji vê programê û bendên wê yên nû ji Partiya Demokratîk a Kurdistanî li Îraqê û yek jî ji berdevkê fermî ya Şoreşa Mele Berzanî li Ewropa birêz Ismet Şerîf Wanlî re, hate şandin.

Di wê demê de, kesayeteke bi navê “Bolîc” derkete holê û bû cihê nîqaşeke mezin di nav hawîrdorên gelerî û partîtî de, ji ber ku ew ji nişka ve di dema nakokî û dijbertiyên mezin di hundirê El-Partî de ber bi çav bû. Li gorî ku tê gotin, “Bolîc” ji bakurê Kurdistanê bi awayekî ne diyar hat, di riya hin kes li Rojava ku peywendiyên wan pê re hebûn. Wî angaşt kir ku ew siyasetmedarekî kurd e û ji ber zordestiya dewleta Tirkî koçberî Rojava bû. Di dema nakokiyan de, ew bi hêsanî derbasî malên siyasetmedarên kurd dibû û hemû hûrgiliyên girêdayî rewşa El-Partî nas kirin, di dawî de guman bi wî birin û ew tawanbar kir ku sîxurê saloxgerên Tirkiyê bû. Lewre jî ji hêla El-Partî ve hate girtin, lê karîbû xwe ji destê wan xelas bike û bireve. Hate zanîn ku “Bolîc” li ser hunerên pevçûnên bedenî perwerdekirî bû û bi jîrtirîn jêhatiyên kesane dihate naskirin. Heta niha kesyeta “Bolîc” xaleke ne zelal e di hundirê tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê de û hemû kesên ku ew dem jiyankiriye dibêjin ku wî nas nakin ango ew nav bi wan re derbas nebûye. Pirsa ku divê bê kirin, çawa kesayeteke wiha karîbû derbasî hundirê movikên tevgera kurdî bibe? Kê alîkariya wî kir bo ku ji nav destê El-Partî bireve û careke din vegere Tirkiyê?

Bi giştî, mirov dikare bibêje ku sedemên herî sereke û berz ku hêştin parçebûn û veqetandin di hundirê El-Partî de (yê ku di reseniya xwe de bêhevrêzî bû) çêbibe wiha ev in : Ji destpêka damezrandina El-Partî û heya qonaxa firehbûnê, ew ji kombûnên kurdî yên ne wekhev ava bûye û xala tek ya ku tê de li hev dikir baweriya hevbeş bi mafên kurd ên neteweyî û dadmendiya doza kurdî. Bi wateyeke din, El-Partî eniyeke kurdî nelihevkirî bû bêtirî ku partiyeke siyasî yê rêxistinî be di çarçoveyeke felsefî, hizirî û îdeolojî ku kesayeta kurdî ya zanistî binimîne. Ji ber yekem pirsgirêka

siyasî û rêxistinî rastî El-Partî hat, pê re ew qas nakokî derxiste holê, li kêleka wê jî zextên ewlehî ku ji hêla desthilatdariya Sûrî ya şovenîst û Hikûmeta Yekîtî ya Cemal Ebdulnasir ve dihat kirin - yanî ji Hikûmeta Veqetayî ya nijadperest ta hikûmeta Baas ya şovenîst. Ew sedem bû astengî li pêşiya pêşxistina bernameyeke çandî û perwerdehî bo kadirên partiyê yên nû ku ji beşê civakê ên cur bi cur pêk dihatin: ji gundî, cotyar, axe û began, mele, çîna gelêrî ya nexwende û hin bawermendên hizira komûnîst ya Marksî-Lênînî ku bi awayekî şaş û ne zelal ew hizir fam kiriye. Her wiha ji ber sedem û şaşîtiyên rêxistinî yên kesane ku ji hêla hin pêşengên El-Partî ve dihat kirin û weke zêdegaviyeke rêxistinî ji hêla hin endam û kadirên El-Partî ve dihate dîtin; ji wan şaşitiyan: Jevxistina komîteya navçeyî ya navçeya Dêrikê ku ji 80'î endam pêk dihat, bi biryareke ferdî (şexsî) ji hêla Ebdulhamîd Derwîş ve bi bihaneya ku ew muxalefeta bi navê (Cemaeta Kenan Egîd) dinimîne, ku di nav xwe de gelek kesayetên ji jêderên cur bi cur û bi taybet ji çîna began bûn, dihewandin.

Dema ku endamên partiyê bi pirsgirêkên xwe yên hundirîn ve mijûl bûn, Hikûmeta Veqetiyayî projeya serjimêra awarte ya nijadperestî li ser welatiyên kurd dimeşand. Di vê projeya nijadperestî de, zêdetirî 300 hezar kurd ji mafê girtina nasnameya Sûrî mehrûm bûn ango nasnameya sûrî ji wan hate vekişandin, her wiha navê Komara Sûrî guhert bo Komara Erebî ya Sûrî.

Di nav van zext, nakokî û cudabûnên ku çêdibûn de, têgîna rast û çep di hawîrdora siyasî û gelerî de derket holê, piştî wê bi awayekî zelaltir eşkere bû û rê li pêşiya parçebûnê eşkere vekir.

Ebdulhamîd der barê vê mijarê de weha dibêje: " Diyardeya rast û çep ya ku derketiye holê dereweke mezin bû, ew ne sedema sereke ya nakokiyan bû, lê sedema rastîn ya parçebûnên di nav El-Partî de tenê saloxgêrên Sûrî bû".

Di destpêka tebaxa 1964'an de, konferansa sêyemîn li gundê Cimayê hate lidarxistin, Osman Sebrî tê de ne hazir bû ji ber ew bi kurê xwe Hoşeng re û hin hevalên xwe di 23'ê gulana 1964'an de hatibûn girtin û

careke din weke endamekî di komîteya navendî hate hilbijartin. Lê ew ji zindanê derneket heya dawiya sala 1965'an.

Di vê rewşê de, nakokiyên di nav refên Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê de xurtir bûn, bingehên partî yên jêrîn di Şepêla Çep de dest bi lidarxistina konferanseke taybet bi wan li gundê Cimayê ya nêzîkî Qamişlo di 5'ê tebaxa 1965'an de, kir. 27 endam ji rêxistina Cezîrê û gelek endamên rêxistina partî li Zanîngeha Şamê beşdarî konferansê bûn; lê endamên rêxistinê li Kobanî û Efrîn hazir nebûn, ji ber rawestandina çalakiyên partiyê li wan deveran piştî binçavkirina gelek çalakvanên rêxistinê li Helebê û tevahiya wê herêmê. Hemû endamên rêveber yên rêxistinê nehatin vexwendin ji ber ku ew di zindana sûrî de girtî bûn, her wiha Ebdulhamîd Derwîş û hemû endamên Şepêla Rast nehatin vexwendin ji ber ku ew wek berpirsiyarên van nakokî û aloziyan di hundirê El-Partî de hatin dîtin.

Kesayetên ku di wê konferansê de hazir bûn ev bûn: Selah Bedredîn, Mihemed Niyo, Hilal Xelef, Mihemed Botî, Ebdulhalîm Qeco, Yûsif Îsmaîl, Şemo Mekî, Fexrî Heybet, Mele Emîn Dîwanî, Xerbî Ebas, Mihemed Emîn Şêro, Mihemed Hesen, Nûrî Hacî, Ezîz Omerî, Ehmed Bedrî, Mihemed Qado, Mele Şerîf, Ebdulrezaq Mele Ehmed, Mele Dawûd, Nûrî Hecî Hemîd, Mihemed Elî Hiso, Mele Hadî, Mele Ehmed Qop, Îbrahîm Osman, Seyid Remezan, Reşîd Simo û Îsa Esaf.

Di wir de, pêşengtiyeke qonaxî ya nû hate hilbijartin, ji van kesan pêk hat: Mele Mihemed Niyo, Selah Bedredîn, Hilal Xelef yê bi nasnav «Hilalo », heta ku heft endamên wê temam bibin. Ew konferans bi nav û pêşengtiya rûmetî (fexrî) ya Osman Sebrî yê ku di zindanê bû, hate lidarxistin û ew wek sekreterê giştî ya rêveberiya demkî hate hilbijartin. Piştre rêveberî berfirehtir bû û Mihemed Mele Ehmed (Toc), Reşîd Hemo û Cegerxwîn (wek endamekî rûmetê) beşdarî bûn. Her wiha metoda çep ya Markisî wek bername ji partiyê re hate danîn, ew şepêl di nava gel de bi navê "Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê-Çep" dihat nassskirin. Şepêla din ya ku bi Şepêla Çep re di nav nakokiyan de bû, nemaze piştî kampaniya binçavkirinê ya sala 1960'î û kesayetên wê ku hizir û helwesta Dr. Zaza ya siyasî ya nû dişopandin bi navê "Rast" dihatin naskirin.

Kongreya çep gelek bend derxistin:

1- Kurdên li Sûriyê neteweyeke, ne kêmneteweyeke nijadî ye.

2- El-Partî partiyeke siyasî ye, ne komeleyeke çandî kurdî ye, bi wateyeke din kurdên li Sûriyê miletekî resen dinimînin ku koka wan di dîrok û erdnîgariyê de heye, ew ne kêmneteweyek in ku derbasî Sûriya bûne. Mafên wan ên neteweyî û rewa hene û ew neteweya duyem li Sûriyê ne.

3- El-Partî Partiyeke siyasî û rêbazeke rêxistinî ye, hemû gelê kurd di nav xwe de dihewîne, mafên wan ên siyasî, civakî û çandî diparêze.

4- Şepêla Rast tenê bi daxwaza mafên çandî û civakî tê nasîn û daxwaza damezrandina komeleyeke çandî ne partiyeke siyasî kirye, ji ber ku kurd li Sûriyê (li gorî wan) kêmneteweyek e, ne neteweyek e ku li ser erdnîgariya xwe ya dîrokî dijîn.

Şepêla Çep di vê konferansê de gelek biryar dan:

1- Seknandina rêveberiya berê.

2- Lidarxistina kongreya partiyê piştî salekê.

3- Avakirina pêşengtiyeke nû ya demkî ji van keseyetan; Mele Mihemed Niyo, Selah Bedredîn û Hilal Xelef (Hilalo).

4- Avakirina komîteyeke amadekarî ji kongre ya bê re ku ji endamên rêveberiya demkî tevî Mihemed Qado, Nûrî Hacî û Yûsif Îsmaîl, pêk were.

Bûyer li aliyê din “ Şepêla Rast”bi vî awayî derbas dibû:

Şepêla Rast, pêşketina bûyerên ku di navbera salên 1965’an heya 1966’an de pêk hatin weke destpêka derketina rêxistinekê ku ji partiyê veqetiyayî ye, nirxand. Di cih de bi rêxistina nû re têkil bû û li hev kir ku rawestin û biryarên konferansa xwe di cih de belav nekin û hilbijartineke giştî di mehekê de çêkin ji bo pirsgirêkê çareser bikin. Lê Şepêla Çep bawerî bi Şepêla Rast nedikir, her wiha ji pêkanîna wê ji peymanê re ne bawer bû û zanibû ku dê berî xwe bide dekûdolaban bo ku wê peymanê têk bibe.

Selah Bedredîn dibêje Rast tevî di destpêkê de dida xuyakirin ku tu girîngî nade Çep, ku bûyera parçebûnê karê cahilan e û tu bandora wê nîn

e, lê di heman demê de wê hewl da di riya fenûfûtan re têbighêje bûyerê. Ji ber vê yekê jî Rast endamekî xwe (Xalid Mişayix) şande başurê Kurdistanê bo ku bi Berzanî û serokê PDK'ê re têkil be da ku piştgirî nedin Osman Sebrî. Ev yek jî piştî ku hewldanên Hemîd negihaşt ku Osman sebrî qayil bike bibe serokê partiyê û wî (Hemîd) da xuyakirin ku ew amade ye xwe ji komîteya navendî vekşîne û ew ê alîkar be da ku yekîtiya partiyê biparêze. Vêca endamê komîteya navendî ya Partiya Demokratîk a Kurdistanî Numan Îsa bi Xalid Meşayîx re gihaşt Kurdistana Rojava û pêşniyar kir ku konferanseke partiyê di dawiya sala 1965'an de bê lidarxistin. Konferans di berfenbara 1965'an de li gundê Berko hat lidarxistin, Ebdulhamîd Hac Derwîş, li gorî pêşniyara partiyê, tê de ne hazir bû,. Osman Sebrî jî hate pêşniyarkirin ku hazir be, lê belê ew hazir nebû. Her wiha Şepêla Çep jî nehate vexwendin û di dawî de konferans gelek biryar girtin, hin ji wan:

1- Qewtandina Mihemed Niyo, Selah Bedredîn û Nûrî Hacî û hetikandina wan.

2- Derxistina endamên Çep.

3- Avakirina dendika pêşengtiya El-Partî ya bê (rastgir), ya ku ji van kesayetan pêk dihat (Tahir Sefûk, Derwîş Mele Silêman, Midwer Ebdul Henan). Her wiha divê endamên pêşengtiya berê jî tevlî bibin heke wan pejirand vegerin xebatên partiyê.

Tevî ku konfrasna "Berko" bi pîrozkirina Ebdulhamîd Derwîş hate lidarxistin; lê ji ber lihevkirina hemû endaman li ser erêkirina peşniyara nehazirbûna wî di konferansê de û ji bo ku Osman Sebrî sûd ji wê rewşê negire, wî peşniyara wan şermezar kir û wek peşniyareke qirêj didît, herwiha nameyak bi zimanekî tund ji konferansê re di dema lidarxistina wê de şand, tê de endamên konferansê tawanbar kir ku keysperst in û nirxên berpirsiyariyê ku ji wan tê xwestin, nas nakin. Dîsa jî biryarên ku di konferansê de hatin dayîn rexne kirin û diyar kir ew ne li gorî asta bûyerên ku bi partî re derbas bûne, ji ber ne tenê pirsgirêk çareser nekirin, lê rê jî li pêşiya "kombûnan" vekir ku xebatên wan çalak bibin, bi vî rengî parçebûn bû bûyerke heyî.

Di dawiya sal 1966'an de, Şepêla Çep kongreya xwe ya yekemîn li gundê Hilêliyê li dar xist û Osman Sebrî bû sekreterê partiya ku ji hinava

Partiya Demokratîk a Kurdî li Sûriyê çêbû û navê “Partiya Çep a Demokratîk a Kurdî Li Sûriyê” lê kir.

Selah Bedredîn û Mele Mihemed Niyo bûn endamên rêveberiya navendî ya partiyê, piştî ku kongre bi dawî bû, Osman Sebrî bi hin hevalên xwe yên rêveber re ji Qamişlo çûn Şamê, lê beriya ku derbasî Helebê bibin, ji hêla hêzên ewlehî yên Sûrî hatin binçavkirin.

Girêdayî pêşveçûnên bûyeran di Şepêla Rast de, wan civînek di 1967’an de li dar xist û kevra yekemîn a guhertina şepêlê ber bi partiyeke siyasî ve hate danîn, ew jî piştî ku alîgirên Ebdulhamîd Derwîş civîna xwe di destpêka sala 1967’an de li dar xist û ew weke sekreterê partiyê hilbijart, her wiha Cegerxwîn, Reşîd Hemo, Ezîz Dawûd û Taher Sefûk wek endam di komîteya navendî ya partiyê de, hatin hilbijartin. Ebdulhamîd Derwîş dibêje ku wan biryarek da ku piştgiriya serok Barzanî bikin, dijî baska Îbrahîm Ehmed û hevalên wî yên ku bi hikûmetê re alîkar bûn . Bi vî awayî, li Sûriyê du partî çêbûn; Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê (El-Partî) û Partiya Demokratîk a Kurdî. Tevî ku armancên her du partiyan weke hev bûn jî, lê xebatên wan ên ji hev cuda bandoreke neyînî li ser çalakbûna siyasî ya tevgera netewyî ya kurdî li Sûriyê, kir.

Girêdayî Şepêla Çep, di sala 1967’an de, dema ku Selah Bedredîn ji Libnanê dihate Sûriya, ji hêla ewlehiya Sûrî ve hate girtin û kete zindanê. Di wê demê de, berpirsiyarê ewlehiya sûrî li Hesekê Xelîl Cehman bi hin endamên Şepêla Çep re têkil bû, yek ji wan endaman Hilal Xelef (Hilalo) bû û lê pêşniyar kir ku bi ewlehiya Sûrî “Bîroya Duyemîn” re alîkar be û jê re got: “Baska Ebdulhamîd Derwîş bi hikûmeta sûrî re alîkar e, lewre jî ez heman peywendiyê li we jî pêşniyar dikim”. Piştî vê pêşniyarê, Hilal bi Selah Bedredîn re di zindanê de têkil dibe û bi hev re (bi xelîl Cehman) diçin Şamê ji bo ku bi Selah Bedredîn re bişêwire. Lêçûnên çûna Şamê li ser ewlehiya Sûrî bû. Li Şamê, Selah Bedredîn pêşniyara wan pejirand bi mercê ku bê berdan. Piştî wê lihevkirinê, Selah Bedredîn ji zindanê derket beriya ku dema cezaya wî ya ku sal û nîvek jê mabû, biqedîne. Piştî ku têkoşer Osman Sebrî bi wê lihevkirina ku di navbera Ewlehiya Sûrî û Selah Bedredîn de di riya Hila Xelef re çêbû, hesiya; agahî da hemû serok û kadirên Partiyê û ew lihevkirin şermezar kir. Her wiha hemû desteyên Partiya Çep piştgirî da Osman Sebrî û ew kiryar weke şêweyek ji şêweyên

xiyanet û çetebûnê nirxand. Lewre jî têkoşer Osman Sebrî wek sekreterê partiyê pêşniyar kir ku konferanseke fermî bê lidarxistin bo ku hemû pirsgirêkên girêdayî vê bûyerê çareser bikin. Konferans li ser pêşniyara Osman Sebrî li Amûdê di mala Ismet Seyda de di 1968'an de hate lidarxistin, Osman Sebrî li pêşiya kesên hazir wiha got:

" Selah Bedredîn bi Ewlehiya Sûrî re alîkar e di rêya kesekî bi navê (Hilalo) û li gorî lihevkirina di navbera wan de, Selah Bedredîn ji zindanê derket bêyî ku dema cezaya wî temam bibe. Ez weke sekreterê partiyê van peywendiyên gumanbar yên li ser navê partiyê û xebatên wê yên neteweyî tê hesbandin, ji binî ve red dikim". Dema ku Osman Sebrî ev gotin der heqê Selah Bedredîn de got, hemû kesên hazir piştgiriya wî kir û kêm kes li aliyê Bedredîn sekinî.

Li aliyê din, Selah Bedredîn bersiva tawanbarkirina Osman Sebrî jê re da bi xwendina raporekî li pêşiya kesên di kongrê de hazir bûn (li gorî ku ji hêla birêz Mihemed Salih Ebdo û Yûsif Dîbo ve hate gotin):

"Birêz Osman Sebrî her tim li dijî Mele Mistefa Berzanî derdikeve û bêyî tu sedem û dema ku jê dipirsîn çima? Dibêje ku Berzanî nikariye ku bibe serokê gelê kurd; hûn bi wî re ne hevalino? Her wiha wî li partiyê pêşniyar dikir ku li dijî Projeya Kembera Ererbî şer bikin, lê dema ku em jê dipirsîn em ê çawa şer bikin? Ew bersiv dide ku ew ê çekên pêwîst bo şer re peyda bike, gelo ew çek dê ji kû derê bê heke ew ne sîxurê dewletê be? ".

Piştî xwendina Selah Bedredîn ji raporê re li pêşiya haziran, ku tê de ji aliykî ve pesna Berzanî da yê ku di wê demê de kesayeteke efsanewî û sembola şoreşê bû, ji aliyê din ve jî Osman Sebrî tawanbar kir ku ew sîxurê desthilatdaran e; rewşa civînê serebinî hev bû, Selah Bedredîn ji cihê tawanbariyê veguhezî cihekî ku rê li pêşiya wî hate vekirin ku Osman Sebrî tawanbar bike û hejmareke mezin ji dengan bi dest bixe.

Di vê xalê de bi taybet, me lêkolîn û lêhûrbûnên xwe kir li ser rastiya wê dijbertiya di navbera Osman Sebrî û Selah Bedredîn de di civîna konferansa partiyê ya ku li malê Îsmet Seyda li Amûdê hat lidarxistin. Gelek rêberên mezin û kadirên partiyê ji me re da zanîn ku Osman Sebrî rast bû û Selah Bedredîn bi saloxgêrên Sûriya re alîkar bû. Tevî vê jî, kesên ku di konferansê de hazir bûn piştgirî da Selah Bedredîn, lê tenê yek ji Efrînê bi

navê Ebdulah li aliyê Osman Sebrî sekinî. Bi sedema vê yekê têkoşer Osman Sebrî aciz bû û dev ji partiyê berde û çû Şamê û di dawî dev ji karê siyasî bi giştî berda.

Di 14'ê hezîrana 1969'an de, Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê biryarek derxist ku Osman Sebrî du salan bê girtin û sûrgûnî bakurê Kurdistanê bibe, lewre jî ew çû bakurê Kurdistanê û çend mehan li wir ma. Dema ku vegeriya Sûriyê, hate girtin û kete zindana El-Qelaa heya sala 1973'yan. Divê neyê ji bîrkirin ku dewleta sûrî nasnameya sûrî jê vekişand, her wiha piştî ku ew ji zindanê derket di 1973'yan de, hikûmeta sûrî ew xiste di binçavdêriya malê de (girtina malê). Piştî ku hate berdan, di mala xwe de jiyana xwe dewam kir û dest bi xebatên wêjeyî kir. Her wiha semînerên perwerdehî li dar xistin û dest bi hînkirina bi zimanê kurdî bo ciwanan kir heta ku jiyana xwe ji dest da di 11'ê cotmeha 1993'yan de.

Osman Sebrî pirtûkxaneya kurdî bi gelek pirtûk, berhem û lêkoînên li ser wêjeya kurdî dewlemend kir. Tevî ku Osman Sebrî dikaribû partiyeke nû ava bike û gelek kurd careke din li derdora xwe kom bike, lê ew bijare nepejirand, ji ber xisleyên şoreşgerî yên resen di kesayeta wî ku dûrî fen û fûtên siyasî bûn. Mirov dikare bibêje dema ku xebatê partiyê xebatekî rast bû wê çaxê Osman Sebrî xebatkar û têkoşer bû, lê dema ku xebatê partiyê kete warê fenûfûtên partîtî yên kesane û bêsûd, Osman Sebrî ne fêlbaz bû lewre jî wî dev ji partiyê berda.

Girêdayî vê bûyerê û li gorî lêgerîn û lêkolînên me der barê vê rewşê de û piştî ku me gelek nerînên siyasî yên cur bi cur dîtin, xuya bû ku komployeke plankirî li dijî Osman Sebrî pêk hatibû, li Kurdistana Îraqê û di dehlîzên saloxgêrên Sûrî de bi pêşengtiya Xelîl Cehman berpirsiyarê "Bîroya Duyemîn" di herêma Cizîrê de, hate plankirin û sedema wê jî ev bû:

Ji bo başurê Kurdistanê bi pêşengtiya Mele Mistefa Berzanî, wan nedixwest ku kesayeteke siyasî xurt û ji malbateke bi nav û deng li holê hebe, ji ber ku ew ê hevrikê malbata Berzanî li Rojava be. Ji bo saloxgêrên Sûrî, ji ber ku Apê Osman bi wan re ne alîkar bû û wî israr dikir ku tevgera siyasî ya kurdî li Sûriyê serbixwe be û dûrî teweryên herêmî be, her wiha ji ber ku wî serê xwe ji wan re netewand. Divê bê gotin ku destê tirkan jî di vê bûyerê de hebû ji ber ku Apê Osman ji zaroktiya xwe de yek ji têkoşer û

dijberên desthilatdariya tirkiyê li bakurê Kurdistanê bû. Tişta balkêş di vê bûyerê de, sekina Apê Osman bi tena xwe li hemberî hemû aliyên ku dixwestin tevgera kurdî li Sûriyê têk bibin.


Hêjayî gotinê ye ku di dema dawî ji jiyana Apê Osman de, gelek mêvan û rewşenbîrên kurd serdana Apê Osman li malê wî ya ku li Şamê bû, dikir û her tim pirsên wan der barê peydakirina çekan ji bo berxwedaniya li hemberî Projeya Kembera Erebî û xala ku tê de ji hêla Selah Bedredîn û hevkarên wî ve hate tawanbarkirin û ku ew sîxurê dagirkeran bû, Apê Osman wiha bersiva wan dida:

“Amanca min ji wê gotinê ku em bi her awayî li dijî Projeya Kembera Erebî têkoşin û li hember wê bê deng nemînin”. Wî her tim nîşana hesteyê (çeqmeq) xwe dikir û digot: “Ev çekê min e”. Carinan jî digot: “Heke hevalên min bi min re alîkar bana, me roviyek anîbana û dêla wî bi tûrekî (kîs) girêdabana û agir pê xistibana û berdana nav zeviyên Elxumer (ew erebên ku rêjîma Baas ji Reqa anî û li Cizîrê bi cih kirin) û bi tevahî bişewitandana”.

Her wiha dema ku Apê Osman di konferansê de (ya ku li malê Ismet Seyda li Amûdê di 1968’an hate lidarxistin) de istîfaya xwe da, ew li devê derî sekinî û ji kesên hazir re got: “Hûn ê poşmam bibin”. Em dikarin bibêjin ku dîroka derketina Apê Osman ji tevgerê, ew dîroka bidawîbûna tevgera kurdî ya şoreşgerî li Rojava û li Sûriyê bû û ketina wê di qonaxa nakokiyên kesane yên bêwate ku ne hêja ne em qalê bikin jî.

Her wiha nakokiyên di navbera her du baskên Çep û Rast de dewam kir. Divê bê gotin ku têgînên Çep û Rast bi awayekî şaş û ne durist dihatin bikaranîn, ji ber ne Çep baskê Çep bi awayekî rast û zanistî dinimand û ne Rast jî baska Rast ku bi têgîna navneteweyî ku pê dihat naskirin, dinimand.

# ÊLÊN DÊREZORÊ




## Pêşgotin:

Girêdana bi malbatê ve li cem civakên Rojhilata navîn, taybetmendiyeke cuda ye. Bandoreke wê ya mezin li ser kesan heye, bi taybet li ser kesên girêdayî êl û hozên ku kevneşopiyên xwe yên êlî yên kevn parastine. Tevî hemû pêşketina ku di hemû aliyan de (civakî, zanistî û aborî) çêbûye jî, hîn dilsozî ji êlê re li pêş e. Vê yekê berî 2011`an û piştî krîza Sûriyê, bandoreke mezin li nerînên kesên di van êlan de kir. Hin gelên li Sûriyê, bi taybet pêkhateya Ereb, ta niha jî hîn endamîtiya xwe ya êlî parastiye. Rêjeya êlperestiyê li cem her malbatekê li gorî zihniyet û nerînên wê, cuda ye.

Dêrezor bi sînorê xwe yê fermî, li cem gelek aliyên xwecihî, herêmî û navneteweyî, xwedî girîngiyeke ciyosiyasî ye. Gelek astengî li pêşberî hêzên ku dixwestin desteseriyê li ser bikin, derketin. Sedema van astengiyan jî ew e ku ev hêz di hişmendiya êlî ya niştecihên wê de ji dema Osmanî, Ferensî, desthilatên Sûrî ve û dawî jî DAIŞ, tênagihêjin. Vê hişmendiyê bandor li jiyana endamên van êlan kir. Hin ji van hişmendiyan ev in: jiyankirina li gor kevneşopî û zagonên êlê (tolhildan, xwîndan û fîdye), bikaranîna gotinên şêx û rîsipiyên êlê, beşdarbûna di şer de, êrîşkirina li ser êline din û berevaniya di ber êlê de û hwd. Yanî di bin rêveberiya êlê û şêxên wê de ne. Ger dijberiyek di navbera biryarên wan û biryara rêveberiya êlê de derkeve, neçar in li gorî biryarên êlê bimeşin.

Vê yekê, di bûyerên ku Dêrezorê piştî kirîza Sûriyê (2011) dîtine de, roleke mezin lîst. Ew jî ji ber ku karê birêxistin û hemahingî û yekîtî di navbera êlan de nîn bû. Vê jî hişt ku gelek pirsgirêk li herêmê derkevin, encamên wê jî tevlîhevî û alozîya ewlehî bûn, ku bûn sedema gelek kuştinan û koçkirina bi dehezaran malbat. Pê re jî gelek mafên mirovan hatin binpêkirinên.

### 1- Parêzgeha Dêrezorê:

Bajarê Dêrezorê, di zaravayê gelêrî de jê re "Eldêr" jî tê gotin. Ev parêzgeh xwedî dirûveke êlî ye. Li rojhilata welat û li ser çemê Feratê e. Navenda wê bajarê Dêrezorê ye. Ew mezintirîn bajarên wê ye. Dêrezoz ji aliyê firehbûna xwe ve parêzgeha duyem e (piştî Humsê). Rûbera Dêrezorê[1] %17.9 ji rûbera Sûriyê ye. Lewma, li gorî dabeşkirinên rêxistinî yên ku ji hêla hikûmetên Sûriyê ve hatine çêkirin, ji aliyê firehbûna xwe ve piştî parêzgeha Humsê, ew ya duyem e. Hejmara niştecihên ku xwe di tomarnameyên nasnameyî de ji destpêka 2007`an ve tomar kirine, gihaştiye nêzî 1600,000 kesî. Ew jî %7 ji niştecihên welêt in. Himbiziya niştecihî dighêje %27 di her $km^2$ de. Rêjeya gundewarên wê %50 ye. Rêjeya karkeran li gorî tevahiya niştecihan nêzî %37 ye, ji wan %44 jin in. Ev karker bi awayekî sereke di karên çandinî, pêşesazî %7 û xizmetguzariyê %26 de belav dibin. Hejmara niştecihên bajarê Dêrezorê, li gorî serjimêriya çariyeka pêşîn ji sala 2010`an, gihaşt nêzî 500,000 kesî.

[1] Wîkîpîdiya-Dêrezor

Piraniya niştecihan li derdora çemên Ferat û Xabûr bi cih bûne. Rewşa Seqaya wê bayebanî ye û weke berdewamiyekê ji çolistana Sûriyê re tê hesibandin. Li ser sê herêmên rêxistinî hatiye dabeşkirin:

- **Bajarê Dêrezorê:** Navenda wê bajarê dêrezorê ye, li ser şeş nevçeyan hatiye dabeşkirin, ew jî ev in: Elbisêre,Elkisre, Eltibnî, Xişam, Mohesen û Elsûr.
- **Bajarê Meyadînê:** Navenda wê bajarê Meyadînê ye, li ser du navçeyan hatiye dabeşkirin: Elişare û Zîban.
- **Bajarê Elbokemalê:** Navenda wê bajarê Elbokemalê ye, li ser sê navçeyan hatiye dabeşkirin: Hecîn, Elsûse û Elecla.

Niştecihên Dêrezorê bi du zaravayan diaxivin; zaravayê dêrî yê nêzî zaravayê Iraqî, kesên li bajêr pê diaxivin û zaravayê koçeran, xelkên li bajêr vî navî lê dikin, kesên li gund û bajarokên Dêrezorê pê diaxivin.

Ji aliyê dîrokî ve, li gorî vedîtinên şûnwarî, Dêrezor ji hezarsala nihan berî zayînê ve, bi niştecih bûye. Lê li cihê bajêr ê niha tu bajarên bihêz ranebûne û her tim weke navendeke bajarî girêdayî herêm û qiralgehên din bû, weke qiralgeha Marî (Tilherîrî niha) ku di hezarsala sêyan berî zayînê de ava bûbû. Her wiha Amorî[2] jî li herêmê bi cih bûbûn û qiralgeha Yemhaz (Heleba niha) ava kiribûn, Dêrezor jî yek ji navendên wê yên bajarî bû, li gel Meyadîn û gundên Berges û Terqayê jî.

Vedîtinên herî diyar ku li Tilherîrî (Marî) hatine dîtin, weke ku Dr. Elî Hesen Mûsa di pirtûka xwe ya bi navê "Parêzgeha Dêrezorê" de dide xuyakirin ku du perestgeh "Eştar û Nînî Zaza" hatine vedîtin. Ev her du perestgeh di serdema Akadî de hatine avakirin. Tê zanîn ku xwedawend Eştar, xwedawend Star bi xwe ye, jixwe ramangerê navneteweyî Ebdela Ocelan di pirtûka xwe ya bi navê **"ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve"** li serê diaxive. Vê xwedawendê bingehê xwe ji zimanê Arî û ji jina ku xwedî roleke mezin di şoreşa çandiniyê di serdema Neolotî de bû, wergirtiye. Ew jî berî ku dakeve deştên Dicle û Firêt û navê Eştar di serdema Akadî de lê were kirin.

[2]Emorî, Amorî yan jî Amoro bi zimanê samî û Marto bi zimanê somerî. Komeke sanî ne. Kevintirîn jêderên mîxî destnîşan dikin ku Amorî di dawiya hezarsaliya siyan de derketin û pêl bi pêl li Mezopotamiyaya jêrîn û deverên Şamê belav bûn. Ji deverên çolistana erebî. Wekîpîdiya. Emoriyon.

Ramangêrê navneteweyî Ebdela Ocelan dibêje: ''Ravekirina Mîtolojî bi awayekî sosret, rastiya di jêderên mîtolojiya Somerî ya ku bi xwedawenda Star tê nimandin dide xuyakirin. Di bingehê zimanê Arî de berî ku dakeve deştên Dicle û Feratê jê re "Star" dihat gotin, piştre navê wê bi zimanê Akadî bû "Eştar". Her wiha ev ravekirina mîtolojî rola jinê ya sereke di şoreşa çandiniyê de, diyar dike. Bi awayekî zelal guherandina çanda xwedawendiyê ya ku encama şoreşa çandiniyê bû, ji hêla Someran ve di serdema niyolotîk de, rave dike.''

Bajêr, tu bûyerên mezin di hemû şaristaniyên ku li herêmê hatin damezrandin (Hûrî, Akadî, Mîtanî û Aşûrî) nedîtine. Lê hin operesyonên leşkerî yên ku qiral pê radibûn, navendên şaristanî bi tevahî hildiweşandin û wêran dikirin, ew jî ji tirsa serhildanê di pêşerojê de, lê di wê demê de Dêrezor ji karîna ku bi raperînê rabe, biçûktir bû.

Di sedsala sêyem berî zayînê de Îskenderê Makdonî derbasî herêmê bû û bajarê ''Dora Orbos[3]'' ava kir, Dêrezor jî girêdayî vî bajarî bû. Tevî bandora çanda Yonanî jî, lê her zimanê aramî li bajêr serdest ma.

Dema ku Sûriye ket bin desthilata Romanî de sala 64 BZ, Dêrezor gundekî biçûk û piştguhkirî bû, bi navê "Azdira" dihat naskirin û girêdayî ''Qerqîsiya[4]'' bû. Romaniya ev bajar xistibû navenda herêmê û leşkergeheke bihêz lê ava kirin. Lêgerîn û vedîtinên şûnwarî hin şûnwarên Romanî û Bîzentî li bajêr dîtin, nemaze dema kolana binyadên xewxaneya ''Rexdan''. Her wiha di sedsala duyem P.Z de, di dema qiralgeha Tedmur de, Dêrezor girêdayî desthilata Zenûbiyayê bû û xwedî fidralî û rêveberiyeke xweser bû û girêdayî impiratoriya Romanî bû.

Di serdema Îslamî de, Dêrezor bi awayekî aşitî li ser destê Sehabîyê (hevalê) Pêxenber ''Îyad kurê Xenem'' di sala 640 P.Z de tevlî misilmantiyê bû. Ev yek jî di serdema Xelîfe ''Umer kurê Xetab'' de bû. Di sala 689 P.Z de, bû rawestgeha Xelîfeya Umewî ''Ebdilmelek kurê Merwan''.

---

[3] Cihê wê a niha li devera Elsalihiyê ya li Elbûkemalê ye.

[4]Qerqîsiya yan jî Kerkîsiyûm (a niha bajarokê Elbisêre ye) bajarekî sûrî biçûk , li ser avrêja Çemê Xabûr di nava Feratê de bi cih dibe. A niha tenê maye hin kavilên şûnmayî li nêzî bajarê Dêrezorê.

Di sala 1516`an de piştî dagirkeriya Osmanî ji Sûriyê re, Dêrezor ket bin serewriya wê de û ta sala 1864`an girêdayî wilayeta Mûsilê bû. Paşê bajarê Dêrezorê weke navenda muteserefiya[5] Dêrezorê hat ragihandin. Ev yek jî ji ber cihê wê yê girîng di navbera welatên şam û Iraqê de ye, lewma ew xistin navendek ji karmendên xwe re. Her wiha, bi mebesta parastina rêya bazirganiyê di navbera Heleb û Bexdayê de, hejmarek şêxên êlan li wir bi cih kirin, ji ber vê yekê bajar bû rawestgeh ji karwanên di navbera Şam û Iraqê de. Gelek geryarên Ereb û Ewrûpî serdana Dêrezorê kirine û avahî, aborî û dabûnerîtên niştecihên wê şîrove kirine. Di şîrovekirinê de wiha hatiye: "Xaniyên wê bi hev ve bûn û li ser girekî ku bi destan hatiye çêkirin, bûn".

Ji aliyê pêkhateyan ve, piraniya miletê Dêrezorê Ereb in, lê di nav wan de hin malbatên Kurd, Suryan û Ermenî jî hene. Piraniya van Ereban ji êline ku di nav Ereban de mezin bûne, hatine, weke: "Zibêd, Inize û Tey". Piştî vedîtina petrolê û derbasbûna gelek beşgehên Ewrûpî da ku di beşê petrolê de kar bikin, gelek pêşketin di bajêr de çêbû. Vê yekê jî derfetên kar li pêşiya niştecihên bajêr vekirin û bazar mezintir bûn û tevgera wan jî zêdetir bû, vê jî hişt ku bajar di aboriyeke baş de jiyan bike.

Di jiyana aborî, ramyarî û heta ya leşkerî de jî bandora êlê li ser niştecihên Dêrezorê pir mezin e. Dilsoziya wan ji êlê re di asta yekem de ye. Ji ber vê jî her tim rêxistinên dagirkerî û gişgirî, şêxên êlan amûra herî baş ji bo destserkirina li ser herêmê didîtin. Heta serhildanên ku niştecihên Dêrezorê pê radibûn jî, di bin serweriya şêxên êlan de bûn.

Sedema girîngiya parêzgehê ew e ku berê navendeke bazirganî li deşta Feratê ya ku di dilê cîhana kevn ye, cih girtibû. Her wiha ji bo girûpên bazirganî yên ku diçûn Bexdayê yan jî jê dihatin, rawestgehek bû. Heta roja me ya îro jî ji aliyê bazirganî ve weke cihekî bazirganî yê stratejîk lê tê meyzandin, bi taybet di navbera Bexda û Şamê de. Her wiya dikeve ser riya ku herêma Cizîrê û Şamê bi hev ve girê dide. Niha jî bi erdnîgarîya xwe ya girîn ji bo aliyên şer yên ku di Sûrî û Iraqê de ne, tê cudakirin. Ew jî ji ber sînorê wê bi parêzgeha Enbarê ve hevbeş e û ji ber ku dergehê Qaim

[5]Muteserefî: Ew dabeşkirina karîgêrî ya di dema dewleta Osmanî de bû. Tê wateya peyva herêm. Muteserefî piştî wîlayetê tê.

ê ku li ser sînorê Sûrî-Iraqê ye, girêdayî wê ye. Her wiha roleke wê ya mezin di dijberiya di navbera pirojeyên EmErîkî, Rûsî û Îranî de heye.

Dêrezor xwedî dewlemendiyek pir mezin e. Ev dewlemendî di serî de ne: petrol, gaz, dewlemendiya çandiniyê û avê. Li Dêrezorê xezîneya herî mezin ji gaz û petrola sivik heye, rêjeya wan jî %24 ji tevahî hilberîna petrol û gaza di Sûriyê de ye. Tê de zeviyên petrolê yên herî mezin di sûriyê de hene, mîna Zeviyên Elumer, Elteym û Elteyane. Dewlemendiya binerd a duyem xwêya xwarinê ye, herêma Dêrezorê jêdera sereke ya xwê ye. Her wiha fosfat û qîr û hin heyberên din jî dihewîne. Devera Xuber a ku ji hêla hêzên Îsraîlê yên asimanî ve hat hilweşandin nêzî Dêrezorê ye. Sedema wê êrîşê ew bû ku çalakîne navokî têkildarî çareserkirina yûraniyomê ne, lê hebûn.

**Êl:**

**- Wateya êlê:**

**"Avahiya nijadî ya xweyîtî û babetî (rêxistina êl û hozan) mezintirîn pêşketin di serdema Neolotîk de di riya xwesipartina li ser çandinî û lawirvaniyê, dît. Çandinî û xwedîkirina lawiran bû jêdera sereke ya debara jiyanê û sîstema gundîtiyê ya rûniştî bingeh girtin. Lewma koçberî kêm bû û bi awayê komikên êlî ku têkiliyên nasîtî û hevbeşî di navbera wan de hene û civaka dayiksalarî tê de bingeh e, dijiyan. Hejmara wan carinan digihaşt çend hezarekî, lê nedibû zêdeyî pênc hezaran[6]".**

Êl weke têgîneke giştî, bi hebûna komên mirovî yên pêşîn re ku nêzîkatiya xwînê ew kom dikirin, derket. Êl hat pênasekirin ku ew komek mirov e. Li heman nijad û bavikî vedigerin. Pirî caran bi navê wî bavikî tên naskirin. Heger nijad ne naskirî be, êl pêşiyekî hevbeş di navbera hemiyan de ku weke sembolê ji yekîtiya êlê re ye, hildibijêre û bi navê "Eltewtem"[7] tê

[6] Ebdela Ocelan, Ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve, 2002.

[7]Tewtem: Ew tişta ku ji hozê re sembol e. Gelek caran ji ber ku parastinê dike, tê pîrozkirin. Kesê yekem ê ku têgeha Tewtem derbasî zimanê ingilîzî kir, geryar C.Lok bû ew jî di sala 1791ê de bû. Di pirtûka xwe ya bi navê "Gernameyên Wergervanekî Hindî û Rêwînameyên Wî" ev têgeh bi kar anî. Zaniyarê skotlandî C.Mekelên di sala 1870yî de cara yekem di lêkolînên nijadnasiyê de ev têgeh bi kar anî, ew jî dema ku gotarek bi navê "Tewtemîtî"

naskirin. Di zimanê Ingilîzî de wateya êlê "clan" e. Ji peyva Ingilîzî "clann" hatiye darîştin û di zimanê Îrlandî û Skutlendî[8] de tê wateya "malbat". Dibe ku êl tenê ji bavikekî ku gelek dunde li pey xwe hiştine, hatibe. Weke êlên hoza "Inize" ji bavikê xwe "Inize kurê Wail kurê Rebîa" hatine. Ev êl tevî ku şaxên wê pir û belavbûyî ne jî, lê di bingeh û şaxên xwe de, ne têkel e.

Êl ji çend beşan pêk tê, her beşek jî ji çend malbatan pêk tê. Pirî caran êl li herêmeke hevbeş dijîn û wê herêmê weke welatê xwe dibînin û bi heman zimanî diaxivin û çanda wan jî yek e. Êl pêkana sereke ji hozê re ye. Çend êl hevpeymanek di navbera wan de ava dibe û dibin hozek. Cudahiya di navbera êl û hozê de ew e ku divê endamên êlê ji heman nijadî bin, lê di hozê de ev merc ne sereke ye, dibe ku hoz ji çend êlên ji heman nijadî bin an jî ji nijadine cihêreng pêk were.

Gelek tiştên hevbeş endamên êlê kom dikin, *mînak*: çand, kevneşopî, ziman, nirx û hwd. Ev tişt ji nifşekî vediguhêzin nifşekî din. Yanî êl mîna neteweyekî biçûk e û vediguhêze. Kevneşopî, şax û endamên xwe bi xwe re vediguhêze. Tu sînorekî erdnîgarî wan nahewîne û tu samanên xanûberî wan bi hev ve girê nade. Çawa ku netewe xwedî dîrok in û şah û serokên wan xwedî nijad û jêhatiyên baş in, wisa êl jî xwedî dîrok in û şêxên wan xwedî nijad û jêhatiyên baş in. Endamên êlê berjewendiyeke hevbeş wan kom dike û eger pêwîstî hebe alîkariya hev dikin. Di dema şer de endamên êlê dibin yek, her wiha di aşîtiyê de jî yek in û heman nijadperestî wan dike yek. Êl ji ber ku ji herêmekê ber bi herêmeke din ve diçe, berevaniya erda xwe nake. Lê belê berevaniya mafê xwe yê jiyankirina li ser erda ku cih û çêrgiha wê ye, dike.

Ji bo êlên Ereban, pêwîst e em cudahiya di navbera du cûreyên êlan de diyar bikin; êlên koçer û yê nekoçer

- **Êlên koçer:** Ew jî dibin du cûre:

*Koçberên gerok:* Navê "Ehil Elweber" li wan tê kirin û hêştiran xwedî dikin.

---

nivîsand. Tewtemîtî li cem erebên cahiliyetê (berî islamê) hebû. Her hozek pûtekî wê yê bi şêweyê lawiran an jî nîv mirov hebû. Wîkîpîdiya. Êl.

[8] Heman jêder.

*Koçerên nîvgerok:* Nevê "Xename" li wan tê kirin. Di xaniyên kelpîçî de dijîn. Di çandinî û xwedîkirina pez de kar dikin û beşek ji wan di werzên bihar û havînê de, bi mebesta gerîna li çêrgihan, koç dibin.


- **Êlên bajarvanî:** Ew êl in ku dev ji jiyana koçerî û guhestinê berdane û li gund, bajar û bajarokan dijîn û jiyana xwe weke ya xelkên bajêr didomînin.

Her wiha êl ji aliyê regeza xwe ve wisa dabeş dibin:

- **Qehtanî:** Navê Erebên resen (arîba) li wan tê kirin. Ev ereb ji aliyê regeza xwe ve girêdayî Qehtan in. Welatê wan ê resen başûrê Nîvgirava Erebistanê ye. Çend şaristanî ava kirina weke; Sebe, Himyer, Kînde û Menazîre li Iraqê, û Xesasîne li Welatên Şamê...
- **Ednanî:** Ew Ereb in ku di koka xwe de ne ereb in. Ew jî bi koka xwe dighêjin Ednan kurê Ismaîl kurê Ibrahîm (pêxemberê Xwedê). Qiralgehên wan ên grîng ev in: Dewleta Umewî, Ebasî û niha jî ya Erebistanê (Siûdiyê)...

Ramangêrê navneteweyî Ebdela Ocelan di pirtûka xwe ya bi navê "ji dewleta kahînên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve" dibêje: "Pêlên hozên Samî di sê qonaxan de roleke girîng lîstiye. Rola wê di damezirandina şaristaniyên Misir û Somer de baş xuya bûn. Di qonaxa duyem de serhildan da xuyakirin. Ev yek jî pirî caran bi rêveberiya pêxemberî ve girêdayî bû. Emorî yên ku li rojhilat li dijî Someran rabûn û Kenanî û Ibrî yên ku carinan li dijî Misrê rabûn û carinan jî êrîşî wê dikirin, qonaxa duyem dinimînin. Qonaxa dawîn a belavbûna Erebên samî di serdema Islamî ya fewdalîzm (derebeg) de bû û ta niha jî Ereb belav dibin"

Hemû êlên Ereb xwe dighînin Sam kurê Nûh




**- Nijadperestiya êlî:**

Nijadperestiya êlî li ser endamên êlê, xwedî bandoreke mezin e. Ev nijadperestî ew e ya ku êlê ber bi piştgirî, alîgirî, parastina mafan û bikaranîna amûrên herî baş ji bo qenciya êlê ve, dibe. Ev nijadperestî, malbat û xizmên ku radihêjin berpirsiyariyên mîna tolhildan û dana fidiyê[9], kom dike. Her wiha ku şerek an dijminatiyek li dijî dijminekî hevpar çêbe jî wan kom dike. Ji ber ku êl gelekî bi nijadperestiyê mijûl e. Girêdana wan bi hev ve li gorî nêzîkatiya regez û xwînê ye, yan jî li gorî hin hevpeymanên

[9]Li gorî kevneşopiyên wan, xizm di dana fidiyê de pabned in. ku ew xizm ji bapîrê pêncan jî bin, çêdibe.

kevn e. Ji aliyekî din ve piştgirî û alîgiriya di navbera endamên êlê de, wan neçar dike ku li gorî zagon û rêgezên vê êlê bimeşin û eger kesekî tiştek li dijberî van regezan kir, tê cezakirin. Dibe ku ev ceza kuştina wî rewa bike an jî ji êlê were dûrxistin. Heger êla wî nebexşîne an êleke din wî negire xwe, dê jiyana wî asteng bibe.

Têkiliyên kargêrî û ramyarî di êlê de pir lawaz in. Tu tişt ji bilî desthilata serokê êlê û birêvebirina wî ya baş êlê bi hêz nake. Hêza êlê bi hejmara endamên wê û mayîna van endaman bi hev re, girêdayî ye. Heger şêxê[10] êlê xwedî helwesteke baş be û di rêvebertiyê de pispor be, her wiha dirav, sewal û zevî jî pir bin, dê gelek mal li dorê kom bibin û dê endamên wî jî pir bibin, her wiha êl dê bibe hêzeke ku mirov nikare wê kêm bibîne.

Jêdera serbilindahiya êlê ya herî mezin, serboriyên wê yên dagirtî şer û pevçûnên xwînî bi êlên din re, yan jî bi hêzên leşkerî yên rêjîmên desthilatdar re ye. Mîna şerê wê li dijî Osmaî, Ferensî, Ingilîzî û vê dawiyê rêjîma Sûrî û DAIŞê. Serkeftinên wê jî bûne helbest û roman û bi domana demê re bûne fulkloreke dîrokî ji êlê re û neviyên wan serê xwe pê bilind dikin.

❖ **Di êlê de çîn:**

Di êlê de çar çînên cuda hene. Ew jî li gorî girîngiya xwe wisa tên rêzkirin:

[10] Şêx: kesê ku temenê wî mezin bûye, bi piranî nêzî pêncî salî ye. Mirovekî navsere ye. Nasnavekî ku li oldarên islamê tê kirin weke şêxên Ezherê. Lê şêxê hozê ew e yê ku bi kar û barên hozê radibe. Li hin Deverên Kendava Erebî ji bo serokatî û serbilindiyê tê bikaranîn (Simû Elşêx). Mûecem Elmeanî Elcami. https://www.almaany.com

### Çînên Êlê

**a-Şêxê êlê (serok):** Ew e yê ku rêveberiya êlê dike û li ser karê wê radiweste. Hemû endamên êlê dinimîne. Di hemû tiştan de ew xwediyê biryara sereke ye. Samanên êlê di destên wî de ne. Ev kes bi du awayan dibe şêx; an xwe yan yekî ji zarokên xwe bi kesayeta xwe ya xurt dixe şêx, an jî ji hêla rîsipiyên êlê ve tê hilbijartin. Gelek caran şêxêtî ji bavan dikeve destê lawan û neviyan de.

**b-Çîna rîsipiyan:** Paya wan ya civakî di bin ya şêx de ye û her tim nêzî wî ne. Ev çîn rêveberiya şaxên êlê û malbatên mezin dike

**c-Çîna milet:** Ev çîn piraniya endamên êlê ne. Barên êlê hildigrin. Piştîvaniya razberî û şênberî pêşkêşî êlê dikin. Beşdarî hemû şer, kêf û xemên wê dibin. Çi qas ev çîn pir be û bi hêz be, hêza şêx û rîsipiyan zêdetir dibe.

**ç-Çîna koleyan:** Ev çîn piştguhkirî û xizan e. Xizmeta şêx û rîsipiyan dike. Piştî ku ji koletiyê azad dibin jî, navê koletiyê ji aliyê civakî ve li wan dimîne. Çînên din mirovantiya wan nakin ji ber ku wan li gorî xwe ji aliyê civakî ve kole dibînin. Ne pêwîst e kesê kole rûyê wî reş be, dibe ku rûyê wî sipî be, weke koleyên êlên Tey û Elniêm.

**- Birêvebirina kar û barên êlê "şêxêtî û mercên wê":**

Her endamek di êlê de erk û mafên xwe dinase û destdirêjiyê li mafê tu kesî di êlê de nake. Hemû di bin rêveberiya şêx de ne. Şêx serweriya êlê dike û ji mafên wî ye ku şer, aşitî û lehvhatinê bi êlên din re pêk bîne. Divê şêx di pêşwazîkirina mêhvanan de merd û xwedî şêwazeke xweş be û di çareserkirina pirsgirêkan de xwedî dilawerî, saman û zanistekê be. Ji bo şopandina karê êlê bike, divê di pêşwazîgeha êlê de be. Di êlê de zagon û destûrine nivîskî nînin, li ser kevneşopiyên ku ji bav û kalan girtine dimeşin. Heger rûbera ku êl lê dijî têra wê neke an jî gelek ji endamên wê koçî herêmeke din bibin, dibe ku êl bibe çend beş an jî çend êl û li ser her beşekê şêxek were hilbijartin. Eger ev êlên cudabûyî bixwazin têkildarî êla mak bin, wê demê ew ê di gelek tiştên ku bi tena xwe nikarin çaraser bikin,

di bin rêveberiya şêxê êla mak de bin. *Mînak*: "Êla Begara Cebel di herêma Çiyayê Kezwanê de (Ebdulezîz)" li Kantona Cizîrê û êla "Begara Dêrezor" li herêma Dêrezorê û êla "Begare" li gundewarên Helebê. Her yek ji van êlan xwedî şêxekî cuda ye ku rêveberiya kar û barên êla xwe dike. Berî kirîza Sûriyê (2011) Newaf Raxib Elbeşîr şêxêtiya hemû şaxan dikir.

Ramangêrê navneteweyî Ebdela Ocelan di pirtûka xwe ya bi navê "ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve" dibêje:

"... Li bakurê Nîvgirava Erebistanê, karîna hevrikiya bi rêjîmê re li cemê peyda nedibû, lê karîbû berevaniyeke baş li xîzistanê bike. Saziya şêxên êlan ku nûnertiya serokatiya êlê dikir, ji şamanî û cadûbaziyê derbas bibû. Kesê ku dibe şêx di êlê de kesekî herî zana û bi temen e. Êlê bi kevneşopiyên patrîkî yên herî hişk serwerî dikir. Şêx nûnerê rêxistinê û hêza pêşketinê tê de ye. Tekez e ku jêdera bandora vî tiştî ji her du aliyan bû. Guhertina diravî û hizirî weke kevneşopiya herî kevn riya xwe didomand. Êl zû bi girîngiya bazirganiyê hisiyan, lewra di bazirganiyê de kar kirin. Misir û Mezopotamiya her tim weke xeleka girêdanê bûn..."

**Kar û barên ku pêwîst e şêxê êlê bi wan rabe yan jî şopandina wan bike:**

1) Li gorî werzên salê û kevneşopiyên êlê yên girêdayî mafê çêriyê, şêxê êlê dema koçkirinê û cihê rawestandinê, hildibijêre. Her wiha li ser parastina êla xwe ji hemû metirsiyan, radiweste.

2) Di hemû dijberitan de û çareserkirina pirsgirêkên ku dadgeh ji wan re ne pêwîst e, şêxê êlê lêvegera sereke ye. Her wiha ew e yê ku şer di navbera dijminan de radiwestîne. Xizan û lawazan diparêze û girêbestên şûkirin û berdanê erê dike.

3) Şêx nûnertiya êla xwe li cem hikûmet û desthilatên berz, dike. Kar û barên wan ji nêz ve dişopîne û berpirsiyariya biryarên ku ji berdêla êla xwe ve dide, digire ser milê xwe.

4) Şêx biryara şer dide. Piştî nêrînên rîsipiyên êlê dibîne biryara levhatin an jî aşîtiyê dide. Heger sedemên şer an jî aşîtiyê hebin, şêx rîsipiyên êlê kom dike û bi wan re giftûgo dike û biryara xwe li gorî berjewendiyên êlê didin. Li vir divê şêx bi biryara giştî pabend be.

5) Divê pêşwazîgeha êlê li cihekî xuya di orta kon an di orta malan de be û divê şêx piraniya caran li wir be, her wiha pêwîst e kole û rajekar ji bo xizmeta şêx, pêşwazîgeh û mêhvanan bikin, hebin. Divê pêşwazîgeha şêx her tim li pêşiya her kesî vekirî be û qehwe, titin, xwarin û nivîn lê hebin.

Di dema Sultan Ebdulhemîdê duyem de dibistana êlan vebû. Vê dibistanê pêşwaziya kurê şêx û serokên êlan dikir. Piştî ku fêrbûna xwe li wir bi dawî dikirin, karîbûn tevlî zanîngeha leşkerî bibin. Ku zanîngeh bi dawî dikirin, dibûn serbazên bi payeya "serok" û nasnavê "Piştevanê rûmetî" yê Sultan, werdigirtin. Ji wê dibistanê sê serokên herî navdar ji êla Egêdat derketin, ew jî ev in: Tirkî Elnircis, Remedan Elşelal û Ebdilmihsin Elhevel[11].

**Êl û hozên ku di serdema nûjen de li Dêrezorê hene:**

1. **Êl û hozên li Dêrezorê:**

Bandora Dêrezorê li ser êlên ku lê dijîn pir mezin e. Nasnameya herêmî "Dêrî" li nav wan belev e û pê serbilind in. Komek êlên ereb li bajarên Dêrezor, Meyadîn, Bokemal, Eşare, ElMohesen û gundewarên wê dijîn. Di nav sînorên wê yê fermî de ne û dibe ku dirêjbûna wan bighêje hundirê Iraqê û hin ji wan dighêjin Rojava- Bakurê Sûriyê û digihêjin hin herêmên din li Sûriyê. Ew êl jî ev in:

**a) Êla Egêdat ango Egêdat li gorî zaravaya herêmê:**

Yek ji êlên sereke li herêmê ye. Li Erebên Qehtan vedigere. Li gorî vegotina êlê bi xwe, li êla "Zibêd" a ku girêdayî hoza Mezhec ya Yemenî ye, vedigere. Ev êl bi operesyonên islamî yên leşkerî re, derbasî herêma ku niha navê Iraq û Sûriyê lê tê kirin, bûn. Siwar û Sehabiyê Pêxember "Umer kurê Meid Yekrub Elzubeydî" wekî bapîrê xwe dibînin. Li gor vê yekê dibin pismamên Cibûr, Elbûşeban û Eldilêm.

Sedema navlêkirina vê êlê li du çîrokan vedigere:

- Çîroka yekem: Li navê herêma "Ugde" ya li "Necidê" vedigere. Ev herêm di nav Nîvgirava Erebistanê de ye (di nav Erebistanê, li Herêma Hailê ye). Lewma ji kesên herêmê re Eqîdî tê gotin û jixwe pirjimariya wê jî Egêdat e.

[11] Mêr û qebîle, Lîna Hiweyan Elhesen.

- Çîroka duyem: Dibêje ku çend êl hevpeymanek di navbera xwe de çêkirin[12] û navê Egêdat li xwe kirin, yanî kesên ku hevpeyman di navbera xwe de çêkirin û li ser berevaniya hevbeş, sond xwarin. Uqde tê wateya piştgirî û piştevaniya hevbeş. Neviyên "Elî Kurê Salim Elsihêbî" (Mezintirîn bapîrê êlê) hevpeymanek bi van êlan re çêkir: "Elbûseraya, Elbûxabûr, Elbûherdan, Elbeqhan, Elbûlêl, Elmucawede, Elmeşahde û hin ji êlên Elcihêş, Elrehbiyîn, Elmeraşide, Elmerasime, Elfilîte û Ehilelcerzî". Sedema vê hevpeymanê ew bû ku li hemberî êlên herî bi hêz rawestin. Hin ji wan êlan ev in: Elcibûr, şemer, Elbûşaban, Elbeqare, Inize, Tey, Cîs…

Jixwe rêveberiyeke yekîne ji vê êlê re nîne, serokên beşên vê êlê xwedî biryareke serbixwe ne û di biryarên xwe de li serokekî giştî venagerin.

Beşeke ji êlê koçberî başûrê Iraqê (Kûfa) bûn û beşeke din jî koçberî Welatên Şamê li herêma di navbera Hums û Helebê de bû. Piştî ku şer di navbera wan û êla Elmewalî di sedsala 18an de qewimî, neçar man ku koçber bibin . Lewma bi rêberiya Salim Elsihêbî koçî rojhilata Sûriyê (herêma Dêrezor û Meyadînê) bûn. Pismamên wan (êla Cibûr) li vê herêmê bûn. Serokê êla Cibûr di wê demê de Şêx Mihemed Emîn Milhim bapîrê Mislit Başa Salih bû. Her wiha êlên Cihêş û Deylem jî li wê herêmê (Dêrezor û Meyadîn) bi cih bûbûn. Hin şer di navbera wan de rû dan, di encamê de êla Cibûr vekişiya bi ser bakur de (Herêma Cizîrê) û êla Deylem vekişiya bi aliyê Iraqê de û Cihêş jî vekişiya bi aliyê Mûsil û Herêma Cizîrê de. Di sala 1947´an de, ji ber sedema dijberiya li ser çêrgihan, şer careke din di navbera wan (Egêdat û Cibûr) de qewimî. Hikûmeta Sûrî bi balafir û tankan ji bo rawestandina şer ket navbera wan. Her wiha êla Egêdat, êlên Begare û Elbûşaban neçar hiştin ku koçî Helebê bibin. Tevî wilo jî demeke nekin êla Egêdat bac dida êlên Şemer û Inize.

Şerê êla Egêdat ne tenê bi êla Cibûr re bû, lê wê şer bi van êlan re jî kir: Şemer, Tey, Cês (Qeys), Elimarat, Eldeylem û Begare. Dema ku vê êlê karê xwe û şerekî dikir dirûşmên şer digotin, weke "Ebrez yan Iyal Ebrez".

Serweriya vê êlê ji hêla "Miseb Xelîl Elebûd Elhifil" ve tê kirin. Ev kes kurê Şêx Xelîl Ebûd Elcedan Elhifil e û ji malbata Hifil e ya ku dighêje Salim Elsihêbî. Ev êl ji aliyê endaman ve, mezintirîn êl li Dêrezorê ye.

[12] Weke qebîleya Elsade Elboxabûr Elrifaiye Elhisêniye.

Ev êl li ser her du qeraxên Çemê Feratê belav e; li ser qeraxa rojava nêzî Dêrezorê, bakurê gundê Botiye, başûrê bajarê Elbokemalê bi 165 KMî ye. Her wiha li ser qeraxa rojhilat, ji gundê "Cidêdet Elegêdat" ta çiyayê Baxûr (Baqûz) li hemberî Elbokemal ji aliyê başûr ve nêzî 110 KMî, belav e. Li van cihan jî belav dibe: Li ser Çemê Xabûr ji Tel-Hesen û Tel-Elşêx Hemed li bakurê Elsûr ta Elbisêre ji aliyê başûr ve. Kombûna wan bi piranî li Elmeyadîn û Elbokemalê ye.

Hoza Egêdat li ser çend girûpan (êlan) dabeşbûyî ye, yên herî girîng ev in:

# Koçberî
## Sedem û Encamên Wê - Koçberiya Kurdan

**Naveroka lêkolînê:**

Koçbûn û veguhezîna mirovan ji cihekî ber bi cihekî din ve, çi di nava sînorên xwe yên ramyarî û xwezayî di nava heman welatî de be, çi ji welatekî ber bi welatkî din ve be; her wiha çi bi awayekî domdar an demkî be; diyardeyek e ku di her dem û her cihî de çêbûye û hîn jî berdewam e. Ev diyarde ji aliyê qase, alî, şêwe, sedem, karîger û bandorên xwe ji demekê ber bi demeke din, yan jî ji cihekî ber bi cihekî din ve, hatiye guhertin.

Da ku em xalên hevbeş di diyardeya koçberiyê de li seranserî cîhanê zelal bikin, me di beşa yekem a vê lêkolînê de li ser mijara: ”Koçberî: sedem û encamên wê, Koçberiya kurdan” vekolaye.

Di beşa duyem a vê lêkolînê de, me li ser ”Koçberiyên Kurdan, sedem û encamên wê” û bandora wê li ser demografiya kurdistanê, vekolaye.

Di beşa sêyem de bi rêbaza kirdarî, me sedemên ku dihêlin gel koçber bibe, diyar kirin. Her wiha di vê beşê de, me rewşên civakî, derûnî û aborî yên ku koçber û penaber tê re derbas dibin û sedemên ku ew ber bi koçberiyê ve ajotine, zelal kirine. Her wiha çi çareserî û pêşniyar hene, ji bo ku em bihêlin koçber vegerin.

**1- Destpêk:**

Bi derketina mirovên liserpyan (Homo erectrus), koçberiyên dîrokî dest pê bûne. Destpêka vê koçberiyê berî milyon salî bû. Ev koçberî ji Qoçê Afrîkayê ber bi bakur ve û ta seranserî Ewrasiyayê belav bû.

Tê xuyakirin ku mirov berêya 150000 sal li tevahiya Efrîkayê bi cih bûbûn, paşê berêya 70000 sal ji wê deverê koç bûbûn û di sala 40000 B.Z li seranserî Asiya, Ewropa û Australyayê belav bûn. Lê der barê Koçberiya ber bi her du Emerîkayan ve, berêya 20000 ta 15000 sal pêk hatibû û li wir hemû giravên Zeryaya Aram (Okyanûsa Pasêfîk) ji hêla mirovan ve hatibûn bichkirin.

Paşê tevgera mirovan çalak bû û Şoreşa Newlîtîkê dest pê kir û Hindo-Ewropiyên pêşîn jî belav bûn. Piştre Koçberiya Serdema Navîn a mezin dest pê kir, yek jê jî Koçberiya Tirkan a ku guhertineke çandî li hin deveran pêk anîbû,. Ew guhertin di bingeha xwe de weke bûyera ku di sedsala çarem û heftem a P.Z de qewimîbû ku bandora xwe bi awayekî xurt li ser çanda "Perîtonî" ya Ingilîzî di serdema Împaratorêya Romanî de, kiribû. Lê der barê pêşiyên Australiyan de, tê zanîn ku ew di sala 8000 B.Z li seranserî başûrê Çînê heta girava Taywanê belav bûbûn.

karîgerên vê koçberiyê gelek bûn, weke: guhertina vhewayê, rûerd û kêmbûna xwarin û avê, her wiha çolbûna hin herêman weke "Nîvgirava Erebî" ku ber bi bakur û li rojhilata belav dibû.

Bi rêya xwendina pirtûkên zimanasiyê, diyar dibe ku koçberan di deryayê re, koça xwe ji girava Taywanê dest pê kirine. Dibe ku bi pêlên pir mezin çêbûbin û dibe ku bi hezarên salan di navbera her pêlekê û ya din de hebin. Di wê serdemê de, zimanê "Ostranîsî" yê wê herêmê bû. Tê gotin ku ev koçberî berî 6000 salan dest pê kiriye. Îro jî zanyar dibêjin ku Koçberiya Hindo-Arî ji newala Sind ber bi çemê Ganga li bakurê Hindê, di navîn û dawiya serdema tuncî (bronzî) de çêbûye. Ev serdem hemdema "Qonaxa Harban" ya vê dawiyê li Hindê bû (1700 – 1300) û di 180 B.Z de bû".

Li aliyekî din jî ji bakurê rojavayê nîvparzemîna Hindistanê, gelek rêzeêrîş ji nîvê Asiyayê dest pê kirine. Ji van êrîşan, êrîşên Hindo-Yewnanî û Hindo-Sikiton û Hindo-Koşanî bûn. Êdî ev êrîş bû yek ji sedemên koçberiyê.

Jixwe Rojhilata Navîn ya ku bi pirengiya xwe tê naskirin, ji mêj ve rastî heman koçan hatiye. Em dikarin bibêjin ku mezintirîn koçberî, di binyata gelê vê herêmê de hatiye xuyakirin. Weke Koçberiya H. Muhamed, koçkirina H. Mûsa ji Îsraîliyan ve, oça H. Îsa û 12 huriyên wî û hwd. Ev tevgerên koçberiyê, ji kevntirîn qonaxên dîrokê ve û ta roja îro; bandoreke mezin li ser tevgerên gelêrî li herêma me kiriye.

Koçberiya ku Kurd ji kûrahiya dîrokê ve li hemberî wê hatine; nayê jibîrkirn. Ev koçberî bi koçberiya ku e di destpêkê de anîbû ziman, hemdem bû. Her êrîşeke ku li ser Mezopotamyayê dihat, pêleke koçberiyê

çêdikir. Mîna Koçberiya kurdan a di serdema Împeratorêya Asûrî, Eyûbî, Selcuqî, Sefewî, Ebasiyan û Osmanî de.

Ev pêlên koçberiyê ta roja îro li pey hev du berdewam dikin. Ji bo piraniya welatan bûye yek ji kêşeyên vê serdemê, lê asta vê koçberiyê ji welatekî ta welatekî din, cûda ye. Her kesek an jî komek ji welat û cihê jidayikbûna xwe vediguheze welatekî din. Armanca wan li wî welatî ne seyran û serdan e, lê belê ji bo misogerkirina jiyaneke baştir dixwazin li welatê nû bi cih bibin. Jixwe ciwanên me di vê demê de ji bo ku jiyaneke birûmet bi dest bixin koçberî ji wan re bûye xewn.

2- **Mijara Lêkolînê**:

Ji ber girîngiya diyardeya koçberiyê û encamên wê yên erênî û nerênî li ser herêmên koçberiyê (jê koçber dibin) û herêmên pêşwazîker (lê koçber dibin), bûye yek ji pirsgirêkên cîhanî yên ku timî di kongireyên navneteweyî de tên zimên. Jixwe ev kongire ji hêla gerînendeya nifûsê ya bi ser netewên yekbûyî ve tên lidarxistin. Vê gerînendetiyê koçberî wisa pênase kir: ”**Guhestina mirovan, ji xakekê (cihê destpêkê) ber bi xakeke din ve (cihê pêşwazîkirinê) û guherînên ku di cihê pêşwazîker de çêdike.”** Bê guman ev guhestin, li gorî dûrahî û demborêya derbasbûyî cur bi cur e. Nabe ku em navê koçberiyê li her guhestinekê jî bikin. Weke tê zanî, koçer jî bi berdewamî ji cihekî ber bi cihekî din ve diçin, her wiha geştyar û xwendekarên zanistê jî ber bi devrine din ve diguhezin, lê ne koçber in. Li ser vê bingehê, her koçberek xwedî taybetmendî û reftarên cuda ne. Gelek mirov dixwazin bi carekê re dev ji welatê xwe biqerin. Li vir tê xuyakirin ku koçberî berêya ku bibe tevgereke fîzîkî, amadehiyeke derûnî ye.

Bi vî awayî, guncandina bi jiyan, çand û kultûra nû li welatekî nû, pir zor e, lewre nakokî di navbera bav û lawan de derdikeve holê.

Ji ber ku koçber kêmnetew in, di peydakirna xanî û karan de rastî danûstandineke nerewa tên. Gelek ji wan bi pereyên kêm û di bin rewş û mercên xirab de karên zehmet dikin, her wiha bêzar dibin dema ku kirîn, firotin û karan, kêm dibe. Li welatê ku nişteciyên wî pir in, bêkarî û hejara şêniyê lê pir e, koçberî hinekî vî tiştî sivik dike. Lê em ji bîr nekin ku di nav wan koçberan de, gelek hişmend, zanyar û kesên xwedî ezmûns jî hene.

Ev dibe sedema paşketina zanist û çaksaziyê li wî welatê ku ev zanyar jê koç dibin.

Ji ber vê yekê, divê em li ser vê pirsgirêka civakî û sedemên sereke yên vê diyardeyê rawestin, da ku em bandora wê û tiştên ku bi xwe re tîne, nas bikin. Di heman demê de, çareserî ji bo vê diyardeyê çi ye? Her wiha em ê çawa vê diyardeya ku belkî bibe kujera çand û mekanîzma çawaniya kesayeta saxlem, çareser bikin?

**3- Girîngiya Lêkolînê:**

Koçberî yek ji diyardeyên demografî yên ku divê baş lêkolîn li serê werin çêkirin, ji ber ku ji aliyekî ve li ser çend karîgerên aborî û civakî çêdibe, ji aliyekî din ve jî dihêle ku gelek guhertin çêbin. Ev guhertin çi di binyata ji aliyê temen û çawaniya nişteciyan ve be, çi jî di binyata aborî-civakî ya civakê bi giştî de be.

Divê sedem û bandorên koçberiyê werin lêkolînkirin, Ji ber ku bandora koçberiyê ya rasterast di têkçûna pêngava pêşketina aborî û civakî de heye, Her wiha di jinûvehevsengkirina binyata demografiya herêmî ya niştecîyan de jî heye. Ev her du ta astekê bi hin karîgerên û guhertinên demografî, bandor dibin.

Pêwîst e balê bikişînin li ser xalên girîng ên ji bo çareserêya bandorên nerînî yên koçberiyê. Her wiha biryara rast li hemberî pirsgirêkên aborî û civakî di dema danîna plan û bernameyên pêşketinê de, bistînin, ji bo ku pêdiviyên kes û civakê pêk bînin.

**4- Armancên lêkolînê:**

Armanca vê lêkolînê vedîtin û zelalkirina van tiştan e: Sedema sereke ya koçberiyê, naskirina sedem û handanên ku mirovan ber bi vê diyardeyê ve dibin, rêbazên alîkar ên hêsankirina vê diyaredeyê, diyarkirina rola aliyên pispor û têkildar ên ku hewl didin vê diyardeyê kêm û bi sînorbikin, her wiha dahûrandina encamên derûnî û civakî yên vê diyardeyê.

**5- Pirsên lêkolînê**:

- Gelo têkilî di navbera rewşa aborî û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera rewşa ewlehî û koçberiyê de heye?

- Gelo têkilî di navbera zagonên Rêveberêya Xweser û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera jiyana xweş û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera jihevketina malabatê û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera zayend û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera asta xwendinê û koçberiyê de heye?
- Gelo têkilî di navbera temen û koçberiyê de heye?

**6- Pênasekirina têgehên lêkolînê:**

- **Koçberî:** Lêkolîner, civaknas û erdnîgarînasan koçberî wiha pênase kirine:

- Tevgereke mirovan e ku ji bo peydakirina mercên jiyanê yên diravî, erwanî û derûnî yên baştir, mirov ji cihekî erdnîgarî ber bi cihekî din ve diçe.
- Ev veguhedstin takekesî yan jî komî ye, ji welatê dayîkê ber bi welatekî din ve ye ji ber gelek sedem û rewşan, pêk tê.

- **Penabûn :** Koçberiyeke bi zorê ye ku ji ber sedemên şerê çekdarî, tundûjî, binpêkirina mafên mirovan û bobelatên xwezayî û mirovî; dihêlin welatî di nava welatê xwe de, ji cihekî penaberî cihekî din dibin.
- **Koçber:** Ew kesê ku li welatekî yan jî li herêmeke din bêhtirî salekê niştecih bûye. Yan jî dema ket wê deverê, ragihand ku ew ê bêtirî salekê, yan jî hetahetayê li wir bimîne.

**7- Çarçoveya dîtaneyî:**

**A- Têgîna giştî ya koçberiyê:**

Tê wateya Koçbûna zindîwerekî, ji bo pêkanîna armancekî yan jî armancine taybet, ji cihê ku lê dijî (dibe ku cihê jidayikbûnê be) ber bi cihekî din ve ye. Her wiha armanca koçbûna mirovkî ji cihê ku lê ji dayik bûye ber bi cihekî din ve, ji bo guhertina rewşa xwe ya aborî ye. Ne pewîst e cihê nû bibe cihê heta hetanî, ji ber dibe ku ev koçberî were dûbarekirin û cih jî pev werin guhertin ”cihê koçbûnê bibe cihê pêşwaziyê”.

**B- Cewhera Koçberiyê?**

Cewhera koçberiyê liv û tevgera mirovan ji cihekî ber bi cihekî din ve ye. Ev dûrbûn çawa be jî û karîgerên handanê çi bin jî, dema mebest ji vê çûnê guhertina cihê niştecihbûnê be; dê navê ”Koçberiyê” lê were kirin. Navê koçberiyê li hemû tevgerên mirovan tê kirin , ji bilî tevgerên şivanên gundan di werzê çinînê de û tevgerên xwezayî yên koçeran yên ku cî û warekî

sînordar ji wan re tune ye, ji ber ku ev tevgerana ne bi armanca guhertina cihê niştecihbûnê ye, ji ber tevgerine werzî ne û carnan jî rojane ne.

Heger wateya koçberiyê raguhestina erdnîgarî ya ji cihekî ber bi cihekî din ve be da ku guhertina cihê niştecihbûna xwe biguhere; bê guman dê bandora wê ne tenê li ser belavbûna niştecihan û pirbûna wan li cihekî be, lê belê dê li ser taybetmendiyên wan ên demografîk û aborî jî be, ji ber ku guherîna pêkaneya zayendî û temenî, yek ji encamên wê yên girîng in, Mînak: (Rêjeya xortên di temenê navîn de yên ku koç dibin, ji ya keçan bêhtir e). Ev dihêle ku rêjeya xortan li herêmên ku jê koç dibin kêm bibe û li herêmên ku pêşwaziya wan dikin, bêhtir bibe. Her wiha ev tişt dihêle ku rêjeya jinan li herêmên gundewarî bilind bibe. Li vir rola girîng a koçberiyê di guhertina çawanî û çendaniyê ya qaseya niştecihan de, xuya dibe û dihêle ku jimara niştecihan li welatê rakêş pir bibe. Berova wê jî, dihêle jimara niştecihan li welatê ku jê koç dibin, kêm bibe.

Erdnîgarînas ”Ziliniskî” dibîne ku ”koçberî di wate û pîvana xwe de, guhertina herî sereke ye". Ji ber vê yekê destnîşankirina zayîn û mirinê ji hêla amarê ve zelal e, berovajî koçberiyê ku ji aliyê daringî (madî) û civakî ve têkildarî bûyerê dibe.

Bê guman guhestina xebatkaran bi sedema guhertina cihê kar, ji bo pêkanîna karekî taybet, nakeve nava diyardeya koçberiyê. Li nik wê jî ”penabûn” heye, ew jî hevrûkirina wê bi koçberiyê re, dihêle ku taybetmendiyên koçberiyê zelal bibin. Êdî ji ber ku pêdivî û xwesteka hin kesan bi pakirina rewşa jiyanî heye; koçberî derdikeve holê, lê rêjeya wan pir kêm e û ne bi darê zorê ye û di gelek qonaxên demê yên cuda re, pêk tê.

Lê **penabûn,** bi cewhera heyberî ya sedem wê û derûniya (saykolojî) xwe cuda ye, çimkî di bin mercên awarte de û ji neçarî çêdibe, weke: Erdhejî, lehî û şerên wêranker. Ev yek dihêle mirov bi komên mezin, sînoran derbas bikin û li devereke din bi awayekî hetahetayê, bi cih bibin.

Piştî zelalkirina têgîna koçberî û penabûnê, divê em têgîna koçber û penaber, zelal bikin:

**Koçber**:

1- Ew kesê ku ji herêmekê derbasî herêmêke din dibe ye.
2- Ew kesê biyanî yê ku ji herêma xwe, derbasî herêmêke din dibe ye.

3- Ew kesê ku dev ji welatê xwe ber dide, sînorê navneteweyî derbas dike û derbasî welatekî din dibe ye.

**Penaber:** Ew kesê ku bi darê zorê hatiye koçkirin û bi sedema şerê çekdarî, tundûjî, binpêkirina mafê mirovan û bobelatên xwezayî yan jî yên mirovî; dev ji mal û cihê xwe yê resen berdaye. Lê wî sînorên fermî yên navneteweyî derbas nekirine. Yan jî dibe ku mirov di hundirê sînorê welatê xwe deveguheze da ku li hêminî, aştî, parastin û aramiyê bigire. Ew jî ji ber hebûna gelek kelemên weke: dûrbûna sînoran, metirsiyên ku di rê de ji ber şer û mayînan derdikevin an jî asêkirina ferweriyan ji rêyên çûnê re. Vegera vî kesî yan jî vê malbatê li herêma xwe, dê jixweber be û dûrî serpereştiya xwecihî û navneteweyî be. Dema aramî û rewşa jiyanî, ewlehî, aborî û rajeyên sereke peyda bibin, ev tişt pêk tê. *Mînak:* vegera xelkê Kobanê, Serêkaniyê û Hesekê li Rojavayê Kurdistanê û vegera gelê Şingalê, piştî êrîşên Daişê.

**C- Beşên koçberiyê:** Koçberî li ser du beşan dabeş dibe:

**1- Koçberiya Stûnî:** Li vir armanca koçber ew e ku rewşa xwe ya civakî û aborî ji rewşeke nebaş bi rewşek baş biguherîne.

*Mînak*: Cotkarekî xwendina xwe ya zankoyê bi dawî kir, berê xwe da bajêr da ku li gorî bawernameya xwe kar bike, ji ber ku li gund ew derfet nîne.

**2- Koçberiya Asoyî:** Guhertina cihê niştecihbûnê, bê ku ew kes pîşeya xwe biguhere. *Mînak*: Veguhestina karkerekî ji bajarekî ta bajarekî din, da ku di kargeheke raçandinê berfirehtir û pêşketîtir ji ya ku tê de hatibû perwerdekirin, bixebite.

**Ç- Cureyên koçberiyê:**

Heta ku em sedema koçberiyê nas bikin, divê em pêşî cureyên koçberiyê nas bikin. Jixwe weke pispor dibêjin ku her curyek sedemên wê hene. Êdî cureyên koçberiyê ev in:

**1- Koçberiya Derveyî:**

Ev koçberiyeke cihî ye, mirov dev ji welatê xwe ber dide û diçe welatekî din. Dibe ku ew cih ji aliyê avabûna civakî, ziman an jî ji aliyê bawerêyan ve, wekw welatê wî yê resen be. Weke Koçberiya di navbera parçeyên kurdistanê de. Yan jî berê xwe bide welatekî biyanî ku gelek nêzîkatiyên

weke ziman, dabûnerît, bawerî û hwd di navbera her du welatan de dûr e. Dibe ku ev sedemên li jêr wî rakêşî koçberiyê bikin:

1- Hebûna xizmekî yan jî dostekî li wî welatî.

2- Ji bo guhertina rewşa jiyanî, Pêşketina aborî li wir çêbûye ku jê re derfeteke kar peyda kiriye.

3- Vedîtina dewlemendiyên xwezayî ku pêwîstiya wan bi karkeran û bi mûçeyên guncav, heye.

4- Yan jî ji ber çewisandin, sitemkarî, şer û bobelatên xwezayî koç dibe.

5- Yan jî ji ber birçîbûnê û hwd.

2- **Koçberiya Hundirîn**:

Ev koçberî di nava sînorê yek welatî de rû dide. Welatî ji cihekî diçin cihekî din dibin, guherînên demografîk jî dikevin vê çarçoveyê, çar aliyên wê hene:

1- Koçberiya ji gund ber bi bajêr ve.

2- Koçberiya ji bajêr ber bi gundan ve.

3- Koçberiya ji bajarekî ber bi bajarekî din ve.

4- Koçberiya ji gundekî ber bi gundekî din ve.

Ev her du cureyên koçberiyê (derveyî- Hundurîn), bêhtirî xwe domdar in.

**Cudahiya di navbera Koçberiya derveyî û hundirîn de:**

Di Koçberiya hundirîn de hemwelatî di nava welatê xwe de, li gorî daxwaza xwe dikare ji cihekî biçe cihekî din. Timî jî sedemên wê karîgerên aborî ne. Dibe ku ev koçberî ji neçarî be, weke yên ku li Sûrî, Îraq, Tirkî û Îranê çêbûne. Dema ku pilaneke hovane li ser kurdan dane meşandin, hiştin Kurd ji bo peydakirina kar û pariya nanê xwe, berê xwe bidin bajarên mezin.

Li Misrê jî 250,000 kes ji herêma Eswan, ji bo avakirina bendava ”Elalî” hatin koçkirin. Her wiha ferweriya Endonezyayê jî gelek niştecihên ”Girava Cawa” koçî giravên kêmşênî kirin.

Bê guman ev koçberiya neçar, ji hêla ferweriyan ve tê pilankirin û stratejiyekê jî ji bo piştgiriya vê pilanê bike datînin, dibe ku ferman bin an jî biryarên ferweriyê bin. Hin ji van biryaran alîkariya koçberan dikin û hin li

ser wan tundûjî ne, lê pirî caran rewşa aborî ya koçberên ku ji neçarî koç bûne, baştir dibe.

Di koçberiya derveyî de pirî caran, ne biserbestî ye, lê heger biserbestî be jî, divê ew kes mercên derbasbûna biyanistanê bipejirîne, yan jî bibe koçberkî nerewa rastî gelek astengiyan were. Li milekî din jî ev koçber, dê bi jiyankirina bi çand, ziman û kevneşopiyên biyanistanê re, rastî astengiyan were.

Li aliyekî din jî em dibînin ku koçberiya hundirîn xwe dispêre taybetmendiyên kesayetî yên kobçer. Lê di Koçberiya derveyî de, rewşa civakî, ramyarî û peydabûna derfetan li welatê biyanistanê; roleke sereke di biryardayîna koçberiyê de, dilîze.

Di dawiyê de, armancên ku koçber di her du cureyan de hewl didin bi dest bixin, ji hev cuda ne.

3- **Koçberiya Hişmendan:**

Tê wateya koçbûna çavkaniyên mirovî yên xwedî zanist û pisporiyên teknîkî. Ev koçber ji welatê xwe yê resen û lipaşmayî, ber bi welatên pêşketî ve, diçin. Ew jî ji ber gelek sedemên mîna: Ceng, şerê çekdarî, nearamî, metirsiyên tendirustî, bêkarî, tunebûna derfetên karmendiyê yan jî tunebûna derfetên lêkolînên zanyarî û hwd.

Wateya têgeha ”**Brain-Drain**” ya ingilîzî ev e: Revandina mejiyan an jî hişmendan. Ev peyv di destpêka salên pêncî yên sedsala bûrî de, di çapemeniya Birîtanî de, yekem car ji bo diyarkirina koçberiya bijîşk û zanyarên lêkolîner ji birîtanya ber bi Emerîkayê ve hat bikaranîn. Jixwe Emerîka di vê demê de pêşketineke aborî mezin didît û derfetên zêrîn ên der barê lêkolînên zanistî tê de peyda dibûn. Paşê ev têgeh di nava dewletên Ewrûpî û dewletên lipaşmayî de jî, hat bikaranîn.

Dibe ku em li koçberiya hişmendan weke danûstandinên çandî lê mêze bikin, lê ev yek seyr û sosret e. Ji ber ku welatên lipaşmayî bê beranber û belaş, hişmend û pisporên xwe yên herî baş dişînin welatên pêşketî. Ev cure di têgeha bazirganiyê de bi wateya "stembar" tê binavkirin, ango tiştên herî baş ên li gel xwe bê merc û bê beranber dide. Bê guman qelen û lêçûna li ser van hişmend û pisporan pir buha ye, Ji ber ku ev koçber nirx û perwerdeya welatê xwe bi xwe re dibin. Lewma koçberiya hişmendan bi koçberiya sermayedaran re hevseng e, çimkî dev ji

welatên xwe yên xizan û lipaşmayî ber didin û dihêlin ku welatê wan xizantir bibe û welatê pêşketî yê ku diçinê pêşketina wî hêj geştir dibe.

Ev koçberî ya herî metirsîdar e, ji ber ku ev kes pêşengên civaka xwe ne. Ji hêla gel û ferweriyên xwe ve hatine piştgukirin û neçar mane ku welatê xwe li dûv xwe bihêlin.

**4- Hin cureyên din ên koçberiyê:**

- **Koçberiya Demikî (Demsalî):**

Ev koçberî mirovan ber bi bajarên mezin, gund an jî derveyî welêt ve diajo. Dibe ku ji bo qedandina karekî taybet be û di demeke diyar de be, paşê vedigere cihê xwe yê destpêkê. Ev koçberî di jîngehê de dibe cureyeke ji cureyên jiyankirina lawiran (Balinde, werdek, Masî, Legleg). Di dema zivistanê de ji herêmên sar, ber bi herêmên germ ve diçin û di havînê de vedigerin herêmên germ, ji bo ku li wir pir bibin.

- **Koçberiya Mirovî:**

Ev koçberî tevgereke mirovan a fizîkî ye. Ji herêmekê ber bi herêmeke din ve diçin. Carinan ev koçberî digihêje dûrahiyeke dirêj û ji komeke mezin a mirovan pêk tê.

Tevgera mirovan di serdema nû de û bi her du cureyên xwe, bi darê zorê di nava yek herêm, welat, an jî parzemînê de berdewam dike.

Koççbriya bi darê zorê, sedemên wê gelek in, weke “bazirganî, kirîn û firotina mirovinan, reva ji ber paqijkirina nijadî”. Ew mirovên ku koçber dibin, li gorî merc û rewşên dîrokî navê “koçber” yan jî “niştecih”, li wan tê kirin.

Çar cureyên din ên kes an jî tiştan hene ku ji welatê xwe yê resen ber bi welatekî din ve ji destpêka sedsala 20`an ve ta roja îro koçber dibin. Ew cûre jî ev in:

1- Keresteyên xav “petrol, fosfat, genim û hwd”.
2- Sermayedar û pereyên wan.
3- Karker, bi taybet yên perwerdekirî.
4- Kesên ku di hemû pîşeyan de pispor in.

Ev her çar xalên borî di pîşesazî, raje û hilberînê de pêwîst in, her wiha ji bo pêvajoya geşepêdana mirovî jî pêwîst in. Bi vê yekê mirov dikare bi hêsanî derencameke vacî nîşan bide, ev encam jî wisa ye: Marê koçberiyê çarserî ye ku sedema bingehîn a têkçûna geşepêdana mirovî li welatên

kipaşmayî ye. Ew jî ji ber tunebûna pêdiviyên pêşketinê, lewre ev lipaşmayîn berdewam e.

Heke her çar cureyên koçberiyê di navbera welatên lipaşmayî de hevbeş bin, cureyên taybet ên Koçberiya Kurd û Ereban ji bilî her çaran hene. Ew jî ev in:

1- Koçberiya partî û kesayetên rikber.
2- Koçberiya alavên ragihandinê.

Dema partiyeke rikber bi nivîsgeh û serkirdeyên xwe koçî welatekî biyanî dibe, alîkariyên heyberî û şênberî weke her koçberkî yan jî penaberekî, ji wî welatî werdigre. Dema ku tankên van dewletên biyanî derbasî welatên wan dibin û dagir dikin û dest datînin ser dewlemendiyên wan yên xwezayî, ev kesên rikber li ser pişta wan tankan vedigerin û xwe weke şoreşvanan nîşan didin. Mîna rikberêya Sûrî ya ku niha bazaran di himbêza welatên serwer ên ku çarenûsa milêtê Sûriyê di destê wan de ye, dikin.

Lê koçberiya alavên ragihandinê yên Erebî ber bi welatên Rojavayî ve, tê wateya ku rojnameyên erebî, bi zimanê erebî li welatên ereban tên belavkirin û ji bo ewlehiya welatên erebî tên derxistin, lê cihê weşana wan li welatên Rojavayî ye ku ev welat bi ingilîzî û franensî diaxifin. Yan jî kenaline peyikî yên erebî ku ji bo ereban tên weşandin, navendên wan li Parîs, London û Romayê ne. Ew rojname û kenal, damezrîner û destekdarên wan, hin welatên erebî yan jî kesayetine ramyarî ne ku xwedî bandor in.

Der barê ragihandina kurdî de, ji ber kiryarên dagirkeran, wan jî şopa ragihandina erebî ya koçbûyî girt.

- **Koçberî ji hêla zayendî ve:**

"Rafinsîtin**"** di tewriya xwe de guman dike ku ”koçber, dema ji gundan vediguheze bajaran, tenê dûrahiyeke kurt diçe, di encamê de jî hat tekezkirin ku xwesteka koçberiyê li gel jinan ji ya mêran bêhtir e”.

Bê guman ev tewrî ji welatekî ta welatekî din cuda ye, bi taybetî li Emerîka û Ewrûpayê. Ji ber ku azadiya jinê li wir heye û ew di ber debara jiyana xwe de berpirsyar e û hewl dide ku jiyana xwe baştir bike û ji bo vê

debarê koçber dibe. Li Hindê, ji bo bidestxistina lêçûna şû (zewacê), ciwan koçberî bajaran dibin, beranberî wê keç jî derfetên şûyê winda dikin.

- **Koçberiya jinan***:*

Li cîhanê nîvê koçberan jin in. Jimara wan îro bêhtirî 95 milyonî ye. Tevî keda wan di kêmkirina hejariyê de û beşdarbûna wan di çalekiyên aborî yên zehmet de, civaka navneteweyî vê dawiyê girîngiya wê nas kir û berpirsyartiya xwe li ser metirsî û astengiyên ku jin di koçberiyê de rastî wan tên, destnîşan kir.

Ji ber pêdiviyên cuda yên gelek welatan, koçberiya navneteweyî di civakên nûjen de, diyar bû. Weke ku di benda yekem a deh rêgezên komîteya cîhanî ya koçberiya navneteweyî de hatiye nivîsandin: (Divê koçberî di rewşa asayî de be, ne ji neçarî be).

Wateya vê yekê ew e ku divê jin di welatê xwe yê resen de, karibin hêz û mafên xwe bi azadî bi kar bînin, her wiha pêdiviyên xwe yên cuda jî bi dest bixin û armancên xwe di welatên xwe yên resen de pêk bînin. Bi vê yekê têgeha ku dibêje: (Divê koçberî di rewşa asayî de be, ne ji neçarî be) pêk tê.

Di van salên dawî de, koçberiya jinan di mijara koçberiyê de, bû yek ji pîvanên nû. Li gorî rapora komîteya cîhanî ya koçberiya navneteweyî (CMM) ku amareke di sala 2004`an de pêk hatibû, dibêje: Rêjeya jinan ji 200 milyon koçberên navneteweyî, gihaşt nîvî. Bê guman pêngava cîhangeriyê rê û rêbaza cihanê guherand û karîbû çarçoveya koçberiya navneteweyî firehtir û xurtir bike, êdî vekirina bazaran, gerandina sermayan û pêşketina teknolojiya agahiyan û alavên ragihandin û çûnûhatinê; têkilî û pêwendiyên li ser asta kes, kom û neteweyan, hêsantir û xurtir kir. Bi vî awayî, newekheviya civakî, aborî û bêhêvîtiya kategoriyên civakî mîna jin û ciwanan, bi rengekî zelal hat xuya kirin ku koçberî carinan ji wan re dibe çareseriya tekane ya gelek astengî, pirsgirêk û xemgîniyan.

Her wiha koçberî û veguhestin, guhertinê di binyata malbatê de çêdikin û barê jinê pirtir dikin. Her wiha ev tişt piştrast dike ku jin kategorêya herî kêm parastî ye. Jixwe ji ber ku zarok û jin koçberên gerok in, lewma bêhtir rastî metirsiyan tên.

Dema ku Neteweyên Yekbûyî ”beşê pêşxistina jinan”, kongireyeke şêwermendî di meha berfanbara 2003`an de li Siwêdê li dar xist, li ser mijara Koçberiya jinê bêhtir bal hate kişandin. Di wê kongireyê de, mijara koçberî û veguhestinê û bandora wan li ser jinê, hat gotûbêjkirin.

Lê beşeke ji jinên koçber heye ku pir lewaz e. Ew jî yên ku di rewşeke ne asa de dijîn, rastî bikaranîna aborî û ganî (sêksî) tên. Nasnameya wan tê mendelekirin û paswan (pasport) ji wan tên kişandin, da ku têkevin destê bazirganan û kesên bê wijdan. Armanca peymanên Neteweyên Yekbûyî, Protokol, pêwendiyên cuda yên Komîsyona Ewrûpî û daxuyaniyên parlementera Ewrûpî der barê vê diyardeyê de, ew e ku balê bikişînin ser vê mijarê da ku şerê wê were kirin.

Tevî ku gotara zanistî der barê dînamîkiya koçberiyê de roleke biçûk daye jinê, lê tevî wilo jî jin aliyekî çalak bû. Lê sedema xuyanekirina beşdarbûna wan jî, serweriya teşeya baviksalarî bû ya ku dihêle mêrê (koçber) jêdera dahata malbatê ya sereke be.

- **Asta çandî û têkiliya wê bi Koçberiyê re:**

Têkiliyeke xurt di navbera asta çandî û koçberiyê de heye. Piraniya lêkolîneran jî ev yek piştrast kiriye. ”Barkon û Şalot”, ev yek wisa şîrove kiriye: Sedema wê ew e ku karê taybet li bajar bi asta çandî ve girêdayî ye. Ev koçberî hatiye yasakirin û bû para karkerên zana û pispor. Lê karkerên xwedî astên nizim, derfetên kar ji wan re pir kêm dibin. Dr. Sabir Mihyedîn dibêje: ”Bajar di pêkaneya xwe ya şênî de, çi di hêza xwe ya karkeran yan jî derfên xwe yên ramanî de; xwe dispêre xwendevan, ji ber wilo karker jê direvin û piraniya xwendevanan xwe lê digirin.

Jixwe ev tişt di rêya lêkolîneke ku Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS) pê rabû, hat zelalkirin û eşkere bû ku çavkaniya welatên Rojavayî ya mirovên zana, Rojhilata Navîn e.

Di lêkolîneke bijîjkî û civakî de ku li ser nimûneyeke ciwanên koçber, di serdema şerê cîhanê yê duyemîn de ku li Skotlandayê hatibû çêkirin; hat xuyakirin ku piraniya kesên hatine ”Abroyîn”ê, asta wan ya çandî ji ya kesên ku li bajêr ji dayik bûne bilintir e.

Li vir em digihêjin derencamekê ku piraniya koçberan, xortên rewşenbîr in yên xwedî azwer ku bi kêrî fêrkirin û perwerdeyê tên, xwedî laşê saxlem, mejiyê afrîner û sincên bilind. Lê der barê welatên paşketî de, tê xuyakirin ku koçberên ku ji gundan koçî bajaran bûne, asta wan ya çandî ji yên ku li gundan mane bilindtir e; lê asta wan ya xebatê û mûçeyên wan ji yên kesên ku berî wan li bajar bi cih bûne, kêmtir e.

Her wiha tê xuyakirin ku gelek ji niştecihên gundan ên ku li bajaran bi cih bûne, peywirên bilind di saziyên dewletê de bi dest xistine, ji pîşeya perwerdê bigire ta ku bigêhêje peywirên sazî û leşkerî, rêvebertiya gerînendeyan, serkêşî, şalyarxane(wezaret), serokatiya dewletê.

Beranberî wan kesên ku di rêya çandê re gihiştine van astên bilind, gelek kesên nezan jî tên dîtin, mîna karkerên avahiyan û firoşkarên gerok.

Xortên rewşenbîr ên dikarin kar peyda bikin, li paş xwe gelek kal, jin û zarok hiştine. Ev tişt dihêle ku têkiliya çendanî û çawanî di navbera welatê resen û biyanistanê de, ne guncav û ne jî hevseng be.

Li aliyekî din jî, koçberî berê para hejar û kesên ku bi dûv pariyê nanê xwe diketin û para kesên bê xak bû. Lê niha kesên zengîn jî ji bo xweşjiyaniyê koçber dibin. ”**Ibin Xeldûn**”, ji mêj ve ev tişt dabû zanîn û gotibû: ”Dema ku koçer arezûyên xwe yên weke xweşjiyan û destkeftiyan bi dest dixin, li aramî û hêminiya ku di cewherê mirovan de ye digerin, paşê jî dadikevin bajaran û dibin bajarvanî.”

Kesê hejar jî ji bo xweşkirina jiyana xwe, koç dibe. Kêmol û kêmnetew, ji ber stemkariyê û ji bo ku aştiyê peyda bikin û bi kesên weke xwe re kom bibin, koçber dibin.

- **Koçberî ji hêla çawaniyê ve**:

Dibe ku bi vî awayî be:

1- **Koçberiya takekesî:** Tenê kesek bi serê xwe, ji bo peydakirina kar, zanist, ewlehî û aramiyê dev ji cihê xwe yê resen berdide û ber bi cihekî din ve, çi dûr be çi jî nêzîk be, diçe û dibe ku dema armanca xwe bi cih bîne vegere. Yan heger li welatê xwe rastî bandorên derûnî hatibe, bi carekê re venegere. Yan jî welatê pêşwaz azwerên wî yên kesane piştguh

kiribin bi taybet heger tu tiştên weke xizm û samanan nebin da ku wî vegerînin welatê wî.

2- **Koçberiya malbatî:** Di vê koçberiyê de, koçber malbata xwe bi xwe re dibin, da ku bi hev re bijîn ku bi peştgiriya hev barê koçberiyê sivik bibe. Jixwe pirî caran koçber biryarê dide ku li welatê pêşwaziyê bimîne û venegere welatê xwe yê resen.

**3- Koçberiya komî**: Ev koçberî bandoreke mezin li guhertina demografiyê dike. Ew koçberî ji ber êrîş û çewisandinên ramyarî pêk tê. *Mînak*: Koçberiya Ermen û Şerkesan ber bi Sûrî û Lubnanê ve, her wiha Koçberiya Kurdên bakurê Kurdistanê dema ku Tirkiyê 5000 gund şiwitandin û xelkên wê koçber kirin. Yan jî bi sedema bobelatên xwezayî, mînak: Koçberiya xelkên Agadîrê li Mexribê ji ber erdheja sala 1954`an û koçberiya xelkên Bangiladeşê ji ber lehiyê. Her wiha koçberiya di vê dema nêz de ya ku li ser destê terora DAIŞ'ê li herêma Kobanê û Şengalê pêk hat.

**5- Koçberî û jinûve belavbûna şêniya cîhanê:**

Pirbûna şêniyê bi rêjeyên cuda li her herêmên cihêwaz li cîhanê, xwestek û daxwazî li ser koçberiyê pir kir. Bê guman koçberî timî ji herêmên pirşênî ber bi herêmên kêmşênî ve diçin, mînak: Koçberiya ji Meksîkê ber bi Emerîka ve, yan jî Koçberiya ji Rojhilata Navîn ber bi Ewrûpayê ve. Lê di nava yek welatî de jî koçberî çêdibe, mînak: Koçberiya hemwelatiyan ji herêmên gundewarî yên pirnşênî, ber bi bajaran ve.

Di sedsalên borî de, di herêmên pirşênî de, pirbûna şêniyê hişt ku ev herêm rastî koçberiyê werin. Gelê wê berê xwe dan herêmên ku rêjeya şêniyê lê kêm e. Dibe ku mînaka herî zelal li ser vê nimûneya koçberiyê ev be; koçberiya Ewrûpiyan ber bi herêmên din ên cîhanê.

Ji sedsala 14'an ve pêvajoyên koçberiyê ji Ewrûpayê dest pê kiriye û bi pirbûna vedîtinên erdnîgarî di sedsalên 15 û 16`an de, ji Ewrûpa ber bi gelek herêman ve bi taybetî ber bi Emerîka Bakur û Awistralayê ve, berfirehtir bû. Lê piştî şerê cîhanê yê duyem, rêjeya pirbûna şêniyê li Ewrûpayê kêm bû. Beranberî wê jî, rêjeya pirbûna şêniyê li welatên paşketî (Cîhana sêyem) bilintir bû. Ev yek bû sedema rûdana pêleke din a koçberiyê ku ji wan welatên navborî ber bi Ewrûpa û welatên din ên pêşketî ve çêbû. Tê zanîn ku rêjeya berdariyê (pirbûn) di nava koçberên welatên

paşketî (Cîhana sêyem) bilind e. Ev yek dibe sedema têkçûna pêkhateya nijadî li herêmên bicihbûnê.

Li aliyekî din jî, Koçberiya Ewrûpiyan di destpêkê de, ji bo desteserkirina xakên vala li cîhana nû bû ku rêjeya şêniyê tê de pir nizim bû. Lê niha koçberî ji welatên lipaşmayî, dihêle rêjeya şêniyê bilind bibe, bi taybetî piştî veberanîna hemû herêmên ku ji bikaranînê re guncav e.

**6- Sedemên koçberiyê:**

**1-** Nebûna derfetên kar ên baş ji bo ciwanan û necoşkirina wan li ser kar û hilberînê ”sedemên aborî”, da ku karibin derfetên kar ên guncav ji bo azwer û xwstekên xwe peyda bikin.

**2-** Pirbûna şêniyê, her wiha pirbûna bêkariyê ku jêdera wê pilana aboriya giştî ya girtî ya ferweriyê ye. Her wiha rewş û fişarên derûnî yên ku xwe li ser kategoriya ciwanan sepandiye.

**3-** Astengiyên têketina Zanîngehan. Her wiha bilindkirina nirxê bûjenên sereke.

**4-** Derketina diyardeya zengînbûna bilez, li gel malbatên ku yek ji wan koçber bûye û jiyana dewletên Rojavayî bi wan xweş dibe.

**5-** Fişarên ramyarî, şerê leşkerî û pilana aborî yên ku ji hêla ferweriyên li welatên lipaşmayî yên rojhilat ve tê bikaranîn, her wiha piştguhkirina ciwanan ji hêla van ferweriyan ve jî bû sedema Koçberiya zêde û nerewa (Rev ji ber sedema çewisandina ramyarî, civakî yan jî olî û nijadî).

**6-** Koçberiya herî metirsîdar ew e ya ku navê "Koçberiya hişmend û rewşenbîran" lê tê kirin. Ew jî ji ber ku welatên wan derfetên guncav ji bo xwdiyên (bawernameyên bilind) peyda nakin. Dibe ku bawernameyên xwe li welatê xwe yan jî li derve wergirtibin. Welatê wan bi milyonan pere li ser wan xerc kiriye, ji ber wilo berdêl çi dibe bila bibe, divê derfetên kar ji bo van kesan bên peydakirin û nehêlin ku ji welatê xwe koç bikin.

**7-** Sedemên civakî ku carinan hin kes ji civaka xwe bêtir pêşketî ne.

**8-** Sedemên taybet, mîna hezkirina sirûşt û avhewaya ku li welatê wan peyda nabe.

**9-** tiştên ku hestê biyaniyê li nik rewşenbîran zêde dike ew e ku fêrbûn kêm bûye, çand dûr ketiye û gelek ji wan demên dirêj zanistên xwe bi awayekî ne guncav digirin. Hetanî rêbazên fêrkirinê dihêlin ku xwendekar biyanî bibin, ji ber ku ev rêbaz ne li gorî çanda wî ye û ji derdor û bûnmendiya wî dûr e, her wiha pêdivî û azwerên wî pêk nayênin. Ev rêbaz

tenê ji dewletên Rojavayî hatine veguhestin, êdî rewşbîr kêm bûne û tu girêdan tuneye wan bi welatên wan ve girêde û sedem nemane ku wan bi welêt ve bikûîne.

**10-** Berdewamiya diyardeya gendeliya darayî di nava dezgehên lêkolînên zanistî de. Ev jî bû sedema berdewamiya Koçberiya pisporan.

**11-** Nebûna stratejiyên zelal û armancdar yên lêkolînên zanistî di warên cihêreng de.

**7- Çima gel koçber dibe?**

Bîrdoziya karîgerên rakêş û qewitandinê, ji bo dahûrandina sedemên ku mirovan ber bi koçberiyê ve didehfînin, ya herî berbelav e. Ev bîrdozî dibêje ku gel ji ber karîgerên qwitandinê yên li welatê wî hene, ji welatê xwe yê resen koçber dibe. Yan jî hin karîgerên rakêşandinê li herêma mêvandar hene ku van kesan bi aliyê xwe de dikişîne.

Ravniştin(**Ravenstein**), ramana vê bîrdoziyê di sala 1889'an de danî. Tê de karîgerên koçberiyê li Ingilîstan û Wîlsê dahûrand, gihaşt encamekê ku karîgerên rakêşandinê ji karîgerên qewitandinê xurttir in.

Dema em biryara koçberiyê destnîşan bikin, em ê bibînin ku Koçberiya ji bo başkirina rewşa jiyanî, ji Koçberiya ji ber rewşa xirab xurtir e.

Di vê der barê de, em dikarin niha gotina (Davis ), der barê sedemên kêmbûna berdariyê de ku dihêle mirov asta berdariyê bi sînor bike, bibîr bînin. Bê guma tenê hebûna karîgerên qewitandinê li welatê resen, berê mirovan nade koçberiyê; ne ku derfetên baştir li welatên din peyda bibin.

Biryara koçber ji bo koçberiyê, xwe dispêre pêngava lêçûn û xerçiyên vê koçberiyê. Koçber karîgerên rakêş û qewitandinê dide ber hev, heger sûdmendî û başiyên koçberiyê ji lêçûn û xerçiyên pêngava koçberiyê bêhtir bin, biryara koçberiyê dide. Mînak: Heger koçber ji bo ku kareke çêtir bi dest bixe, biryara koçberiyê da, li vir koçber dê dahatiyên karê nû û dahatiyan karê kevin û xerçiyên ku li Koçberiya wî û malbata wî ji welatê wî yê resen çûn; bid ber hev.

Di rastiya xwe de, biryara koçber ji bo koçberiyê ne ji nişkan ve tê, lê belê di demeke dirêj de pêk tê, destpêka wê daxwaza koçber ji koçberiyê re ye û dawiya wê jî ew dema ku dixwaze tê de koç bike. Lê di her rewşê de sedema bingehîn, karîgerên aborî yên heyî ne. Lêkolînên piratîkî ên li ser koçberiyê, dan zanîn ku bêkar û xebatkarên ku ji karê xwe ne razî ne, bêhtir dixwazin koçber bibin.

Nêrîneke din jî heye dibîne ku mirov hewl dide ku armancên xwe di jiyana xwe de bi cih bîne, weke qezenckirina asteke bilind a xwendinê, karekî baştir, kirîna xaniyekî çêtir, yan jî bidestxistina jiyana di wareke civakî û aborî çêtir de. Ji bo pêkanîna van armancan, koçberî dibe yek ji bijardeyên li ber destan.

**8- Encamên koçberiyê:**

- **Encamên Şêniyê (Demografî):**

**Guhertina rêjeyî**: Ew jî li du aliyên dijberî hev diyar dibe: Li milekî pirbûna niştecihên bajarên pêşwazîkar û li milekî din jî kêmbûna hejmara niştecihên bajar û gundewarên şander, her wiha kêmbûna mezinbûna bajaran.

Cudahî di navbera cureyên Koçberiya niha û ya kevn de heye, ji ber ku koçber berê karkerên ne pispor bûn an jî rajekerên (xizmetkar) malan bûn û hwd.

Lê belê, niha karkerine hilberîner in û carinan jî pisporên hin karên teknîkî ne.

**Mezinbûna bajaran van encaman bi xwe re tîne:**

1- Bi iştî kêmbûna rajeyên sereke.

2- Avabûna bajarên tûtya (koxik).

3- Rojane pirbûna hejmara şêniyê, ji ber hatina komên mezin ji herêmên derdor, da pêdiviyên xwe bi dest bixin.

4- Pirbûna bêkarî û rêjeya jirêderketinê.

5- Diyardeya bajarbûna sexte: Guhertina tenê di cihê rûniştinê de çêdibe bêyî ku kevneşopî û asta jiyanî were guhertin.

6- Bi berdewamî kêmbûna berdariyê, pîrbûna şêniyê, bêkarî, Koçberiya hişmendan, wergirtina zanayan, şandina karkeran, mafên mirovan, tevlîhevbûna civakî, dijminatiya biyaniyan, bazirganiya li ser mirovan û ewlehiya niştimanî.

- **Encamên civakî:**

Belavbûna gelek gunehkarî û tawanan, bikaranîna penaberan ji kevneşopiyên xwe re yên ku ne li gorî jiyana biyanistanê ne. Her wiha belavbûna bajarên tûtya ku weke çavkaniyên gendeliya civakî tên naskirin û koçber jî di taxên pirhejmar yên ne endazyarkirî de kom dibin. Ev encam bi taybetî di Koçberiya hudirîn de derdikevin holê.

Newekhevbûna pêkhata ciwanî, bilindbûna rêjeya jinan, kêmbûna veberanînên ku dikarin gundewar û bajaran bi pêş bixin, bi taybetî di welatên lipaşmayî de. Ev yek dihêle ku welat i paş bimîne û zehmetiyan ji ber rajeyên kêm bikişîne.

**9- Neyîniyên Koçberiyê:**

Gelek welat zehmetiyan ji ber koçberan dikişînin û bi taybetî koçberiya nerewa. Ji ber vê yekê diyar e ku ev welat neçar dimînin bi van koçberên ku naxwazin li ser xaka wan bimînin re, danûstandinê bikin. Ji ber sedemên zagonî nikarin wan bigirin, yan jî zehmet e wan vegerînin welatê wan. Ji ber vê yekê tu dibînî heke bi razîbûna wan be, yan jî ji neçarî ew pêşwazî kiribin, bi pozbilindî danûstandinê bi koçberan re dikin û wan weke barekî giran li ser milê xwe dibînin. Bi taybetî heger ev koçber pirsgirêk û ajaweyan di welatê pêşwazîker de derxînin. Dibe ku koçber rastî gazindên gelê resen werin, ji ber ku koçber derfetên kar ji destên wan dibin û dibin sedema bihabûnê û dibin sedema kêmbûna para wan ji xanî, dahat û çavkaniyan.

Weke mînak Elmanya gelek zehmetî ji ber koçberên Tirk kişandin. Gelê Elmanyayê jî bi taybetî karker, koçberên ku derfetên kar ji destê wan birin, şermezar kirin. Dema ku newekhevî di navbera koçber û niştecihên resen de hebe, şerekî nijadperestî gur dibe. Ji ber vê yekê ev welat zehmetiyên pir mezin jiyan dike. Her wiha koçber jî wan heznekirî û çewisandî dibînin û rastî danûstandineke nijadperestî tên. Wek mînak: Frensayê rûbend û şerpe li welatê xwe qedexe kir. Vê yekê jî koçber tengezar kirin, ji ber ku ev biryar biryareke nijadperestî ye. Bobelata herî mezin a ku bi sedema koçberiyê çêbûye, pirsgirêka Pormayê ye, koçberên Misilman rastî çewisandineke ku gihaşt asta xwînrêjiyên pir qirêj, hatin. Gelê Meyanmarê yên Bûzî komên Misilmanan bêdilovanî şewitandin. Cîhan hemû ji bo van komkujiyan tenê temaşe dikir û bêdeng mabû.

**Em dikarin bi kurtasî nerêniyên koçberiyê bi van xalan zelal bikin:**

1- Dûrketina ji xizm, dost û malbatê.

2- Hestê aramiyê ji dest diçe.

3- Dest ji gelek rêgez û kevneşopiyan ji bo guncandina bi jiyana nû re, tê berdan.

4- Bêxwedîtî û nehêminiyê çêdike.

5- Xwebiyanî dîtin.

6- Heger dema koçberiyê dirêj bibe, bîranîn winda dibin û welat jibîr dibe.

7- Koçber ji hêla niştecihên herêmê ve, rastî çewisandin û bêrêziyê tên.

**10- Erêniyên koçberiyê:**

1- Hevnasînê di navbera gelan de çêdike.

2- Fêrbûneke baş tê bidestxistin.

3- Sûd ji jêhatiyên gelên din tê wergirtin.

4- Gelek jêhatiyên ku ne bi koçberiyê be bi dest nakevin, tên bidestxistin.

5- Rewşa aborî bi rengekî baştir tê jiyankirin.

6- Raje û rewşên tenduristî yên baştir û pêşketîtir, tên bidestxistin.

7- Pereyên ku koçber dişînin welatên xwe, li hinek welatan weke çavkaniyeke sereke tê dîtin. Ew jî ji encama hemû diravên biyanî yên van welatan e. Ev pere zêdebûneke girîng li tevahî berhema xwecihî, çêdike. Di encamê de dahat û danehevên malbatê bilind dibin û ji bo kirîna berhem û rajeyên mezaxtinê, tên bikaranîn.

**11- Çareseriyên pêşniyakirî ji bo rawestandina koçberiyê:**

Ji bo rawestandina vê nexweşiya ku ziyanê digihîne civakê, divê çareseriyên dirust werin dîtin, da ku ev diyarde ji bingehê ve were rakirin.

1- Tekezî li ser handana ciwanan ji bo ku bi axa xwe ve bên girêdan û dest jê bernedin, were kirin.

2- Di rêya peydakirina hinek takemafên mîna alavên veguhestin, niştecîgeh û misogerkirina tenduristiyê re, balê bidin jêhatiyên ciwanan.

3- Têkbirina xizmperestiyê û pêkanîna rêgeza dadmendî û wekheviyê.

4- Peydakirina derfetan, ji bo bikaranîna jêhatiyên ciwanan, mîna komele û yaneyên çandî.

5- Peydakirina karan ji ciwanan re.

6- Handana ciwanan, da ku tevlî karê ramyarî bibin.

7- Di rêya peydakirina rajeyên tenduristî û civakî re, guhdan li gundewaran were kirin,.

8- Di rêya avakirina pîşesaziyên biçûk û xweşkirina rewşa jiyana gundan re, bikaranîna rajeyên jîngehî.

9- Di rêya bikaranîna rêbazên zanistî re, başkirina rêbaza karê çandiniyê, da ku hilberîn zêde bibe.

10- Ji bo bajaran, pêwîst e navendîbûn were sivikkirin û rajeyên tenduristî, çandî û xweşguzarî tê de kom nebin, her wiha zanîngeh û pîşesaziyên pêşketî li paytextê kom nebin.

11- Peydakirina xweşî û xweşguzariyê li gundewaran, weke gulistanên giştî û seyrangehan.

12- Hêsankirina veguhestina welatiyan ber bi bajaran ve û amadekirina koçberiya hundirîn a ber bi gundewaran ve.

**12- Nimûne li ser rawestandina koçberiyê:**

- Peydakirina amûrên zanistî û alavên lêkolînê.
- Beşdarbûna zanyaran li kongireyên zanistî yên cîhanî, ji ber ku di van kongireyan de têkilî di navbera hişmend û pisporan de çêdibe, di encamê de çirûska nûderîn û afirandinê tê vêxistin.
- Rola şalyariya kar û baran ji bo ku beşên taybet ên aboriyê di peredayîna lêkolîna zanistî de beşdar bin ta ku nûderînan bi dest bixin.
- Guhertina pergalên fonan ên giryêdayî pispor û teknîkkaran bi taybet ên girêdayî ciwanan, bi awayekî ku nehêle ciwan ji bo pêdiviyên jiyanê koçber bibin.
- Rola şalyariya perwerde û fêrkirinê di belavbûna çanda giştî; avakirina qadeke erênî ji bo zanistê û arandina behreyên zanistî de.
- Bi giştî sazkirina pilanên dirust ji bo fêrkirinê, ango divê her tişt berî cîbicîkirinê baş were lêkolînkirin.
- Amadekirina pergalên fêrkirinê ku kesê guncav di dema guncav de û bi hejmarên pêwîst, li gorî pêdiviyên civakê ji sermayeya mirovî, hildibirîne.
- Pêşxistina biranşên fêrkirinê, ta ku encamên pergalên fêrkirinê, pêdiviyên civakê di her milî de bi cih bînin. Her wiha pêwîst e beşên cur bi cur derbasî zanîngeh û dibistanên me bibin, da ku xwendekar di hundirê welêt de karibin xwendina xwe di beşên li gorî dilê xwe di hemû qonaxên xwendinê de û di asteke bilind de, berdewam bikin, ji dêvla şandina derve (şandina wan di nava şandeyên xwendinê de). Ev rê yek ji rêyên sereke yên herî zêde ji koçberiya pisporan re ye.
- Tekezî li ser avakirina saziyên lêkolîn û lêgerînên zanistî were kirin. Ew jî di rêya bilindkirina terxanên darayî yên lêkolînên zanistî re. Her wiha xweşkirina rewşa lêkolîneran û hembêzkirina pisporên xwecihî, di rêya

hemahengkirina di navbera encamên fêrkirinê û pêdiviyên saziyan de, da ku bibe cihekî ewle ji pisporên cêwaz re.

- Di rêya amadekirina bernameyên dilkêş re, peydakirina jiyaneke birûmet ji bo zanyaran. Di heman radeyê de gerek e ev yek ji bo perwerde û bangeşeyê jî were kirin, ji ber ku ji mafê van zanyaran e ku der barê pêşeroja zarokên xwe de dilasan bin, da ku xwe ji hilberînên xwe yên zanistî re vala bikin.
- Pêwîst e kesê guncav bikeve cihê guncav ku her kes karê girêdayî jêhatî û pisporiyên wî bin bike. Ev bi xwe gaveke giring e ku divê were avêtin. Ji ber ku hestê karkirina jidil li nik kesan ji bo xebatê, çêdike. Ji aliyeke din ve, bi rêya bikaranîna pisporiyên xwe yên ku salên dirêj di xwendina wê de qedandine, dê asta karîn û jêhatiyên xwe di warê xebitandinê de, bilind dike. Her wiha sûda pêwîst bi dest dixe û kar pêş dixe.
- Bi hişkatî cîbicîkirina lîste û zagonên ku şandeyên mamosteyan bi rêxistin dikin û wan perwerde dikin. Jixwe mamoste neçar dikin ku xerçî û lêçûnên çûna xwe, hilgire ser milê xwe. Her wih kesê ku bixwaze karê xwe rawestîne, divê dema zagonî ya kar bi dawî bibe û lêçûnên perwerdeya xwe tevî nede, yan jî karê wî nayê rawestandin.
- Di rêya veşandin û wamkirina zagonî re, birêxistinkirina koçberiyê, lê ne ku li ser hesabê rewşa zanistî ya li dewletê bi hemû biranşên xwe yên cêwaz be.
- Peydakirina derfetan, da ku zanyar karibin rêbertiya welatên xwe bikin. Ji ber ku ev yek ji hemû civakan re xwedî sûdeke mezin e, her wiha sûdê dide zanyaran bi xwe jî û dihêle ku xwe weke parçeyekî ji gelê xwe dibînin.
- Di rêya erkdarkirina di dezgehên lêkolînên zanistî û saziyên dewletê de xwedî hebûneke civakî û payebilind in, dilkêşana pisporan.

Ew jî bi kurtasî di van xalan de diyar dibe:

- Damezirandina wezareteke ku balê bide kar û barên koçberan.
- Pêşxistina rêbazên fêrkirinê, da ku bihêlin xwendekar ji zanist û zanînê hez bike. Her wiha fon ji bo beşên zanistê werin dayîn.
- Çandina niştimanîbûn û welatparêzîyê di dilê ciwanan de.
- Bidestxistina derfetan ji bo ciwanan, da ku xwendina xwe ya bilind di hundirê welêt de berdewam bikin.

- Vekirina komnavendên lêkolîn û pêşxistinê, ji bo piştgirêya aborî û rakişandina zanyar û lêkolîneran.
- Destpêkê bi xwendekar, paşê bi lêkolîner û zanyar; bawer kirin.
- Pirkirina kongire û konfiransên xwecihî û vexwendina koçberan ji bo piştgirêya van kongireyan.

**13- Serpêhatiyên danûstandina bi diyardeya koçberiya hişmendan re:**

Qasiya koçberiya hişmendan li ser asta cîhanî bi rêjeyeke pir mezin fireh bûye. Dibe ku koçberiyeke hundirîn, ji gundan ber bi bajaran ve be, ev koçberî li hemû derên cîhanê çêdibe; yan jî koçberiyeke navwelatî, di navbera welatan de be. Emerîka welatê herî zêde ya ku di vî warî de rastî vê koçberiyê hat, bi taybetî koçberiya ji welatên Ereb û Efrîkayê.

Asta koçberiya navwelatî ya pisporan zêde bûye. Heke ji bakurê Efrîkaya Erebî be, yan jî ji welatên Efrîkayê yên başûrê çolistanê be. Her wiha ji ber fişarên aborî û ramyarî, ev koçberî çêdibe. Mînak: Oxenda, Esyûbiya, Xana û hwd.

Lê belê parzemîna Asiyayê mezintirîn pêla koçberiya navwelatî, dîtiye. Ev koçberî ya pispor û hişmendên ku ji cîhana sêyem ber bi welatên Rojavayî ve diçin. Gelek sedemên qewitandina hişmendan hene, hin ji wan berî niha me diyar kiribûn.

Em dikarin sûdê di rêya serpêhatiya Asiyayê re bibînin, ji ber ku geşbûna aboriya welatê resen bi demê re dibe hêzeke ji bo vegerandina pisporên koçber. Jixwe ev tişt li rojhilata Asiyayê, Çîn, Koreya bakûr, Taywan, Sîngafûra û Hongkongê, çêbû.

Li gorî amaran koçberiya vegerê ya ber bi welatê resen ve, welatên ku biyaniyên pispor lê rûniştine, tengezar dike. Sedema vê yekê ew e ku guhdan bi wan kêm e. Her wiha Japonya û serpêhatiya Asiyayê ya bi navê "Pilingên Asiyayî" bi milyonên dolaran ên ku ji firotina tirimbêl û parçeyên kompîtûran di zanîngeh û amojgehên lêkolênan de bi dest xistiye, li ser pisporên xwe bi armanca vegerê, mezaxtiye.

Navendên lêkolînên zanistî û pêşketina teknolojî li welatên Asiyayê, heya asteke mezin bûne xalên kêşana jixweber ji bo zanyarên koçber ên van welatan.

Weke mînak: Bajarê Bangalorê li Hindistanê, di teknolojyeya pêşketî bi taybetî di warê dîzayn û çêkirina pergalan û sazkirina bernameyên kempîtûran de, pir bi pêş ketiye. Her wiha Bajarê Hsinçuyê li Taywanê ku bi teknolojyeya pêşketî bi taybetî di warê endazyarêya firînê û ezmannasiyê de tê naskirim. Amojgeha biyolojyeya şaneyî û parçeyî li Sîngaforayê û zanîngeha zanist û teknolojyeyê ya Hongkongê. Navendên Asiyayê di warê zanist û teknolojyeyê de yên li pêş, ne tenê zanyar û pisporên xwe kişandin, lê belê gihaşt astekê ku hinek ji welatiyên Rojavayî bikşîna. **Ew jî bi saya du taybetmendiyên girîng bû:**

1- Di warê teknolojyeya pêşketî de mûçeyên baş ji bo pisporên zanistê hene ku ji mûçeyên welatên Rojavayî bilindtir in. Ev mûçe ne tenê ji bo koçberên vegeriya yî ne, lê belê ji bo hemû pisporiyên bilind ên niştimanî di van deveran de jî têne dayîn.

2- Amadekirina cihên lêkolînan bi awayekî pir baş û guncav ku li gorî asta cîhanî ya zanîngeh û navendên lêkolînan ên welatên pêşketî ne.

Lê belê ji nav serpêhatiyên Ereban em ê nîvserpêhatiyekê ji Misrê pêşkêşî we bikin. Ev serpêhatî di sûdwergirtina saziyên hilberîn û rajeyên niştimanî ji zanyar û pisporên Misrî yên cêawaz ên derve de tê nimandin. Ev yek di rêya pirojeyeke ku Neteweyên Yekbûyî destekê dide wê, pêk tê. Ev piroje jî di rêya (Bernameya Neteweyên Yekbûyî ya geşedanê) re ku bi navê pirojeya Toktenê ye, pêk tê (Nationals Tokten Transfer Of Knowledge Expatriate), ango guhestina zanînê di rêya welatiyên koçber re.

Bi kurtasî ramana pirojeyê (Bernameya Nateweyên Yekbûyî ya geşedanê) ew e ku peredayîna giştî yan jî pişkî bi diravên biyanî ji bo lêçûnên pêwîst (lêçûnên rêwîtî û bicihbûnê) werin dayîn. Ew jî ji bo anîna zanyar û pisporên koçber ên ku ji hêla sûdgirên nava welêt bi rengekî demkî hatine bijartin, da ku ji kar û pisporiya wan sûd were girtin, asta teknolojî bilind bibe û karê sazgehên têkildar baştir bibe. Yan jî pirsgirêkên neteweyekê werin çareserkirin, yan çareserî werin pêşniyarkirin, an jî di lêkolînên rewşên aloz de beşdar bibin.

Komara Misrê di nava welatên ku sûd ji vê pirojeyê dîtine li pêş bû. Her wiha hinek welatên din jî hebûn mîna Tirkî, Çîn, Hindistan û Pakistanê.

---

**Lêveger û jêder:**

1- Neîm, Mitez, Mixewel, Metanyos, dahûrandina sedemên Koçberiya hundirîn li Komara Sûrî, kovara zanîngeha Şamê ji bo zanistên aborî û zagonî- El-Mecad 21- H1-2005.

2- El-Cerbûnî- Mihemed, Koçberiya ji gundewaran ber bi bajaran ve li Sûriyê, Çapxaneya Wezareta Çandê, Şam, 1990.

3- Profîsor Ehmed Ebû El-Wefa, mafê penaberiyê di navbera ola Misilmantiyê û zagonên navwelatî derheqê penaberan de "lêkolîneke rexneyî ye" - Rêya d – 2009

4- Navenda Rafîdeyn a lêkolîn û lêgerînên stratejîk/ lêkolîna derbarê koçberiyê- cureyên, sedem, armanc û encamên wê.

5- Koçberiya mirovî wikipedya.

6- Fêrdana (semîner) dozdehemîn, koçberî û pênase, cure, sedem û encamên wê, kolêja perwerdeya bingehîn (BASIC EDUATION COLLEGE, Iraq, university of Babylon,)

7- Komîsyona bilind a karûbarên koçberan a Neteweyên Yekbûyî-komîsyon "Ekîpa cîhanî ya bi koçberiyê re têkildar e".

8- Komîsyona bilind a karûbarên koçberan a Netewên Yekbûyî- komîsyon "Raporeke komîsyonê: Koçberiya bi zorê ya cîhanî di 18 salan de gihişt asta xwe ya herî bilind

9- Komîsyona bilind a karûbarên koçberan a Netewên Yekbûyî- "penaberî û koçberî".

10- Koçberiya jinan di navbera Deryaya Spî û yekîtiya Ewrûpayê de "Yormîd ji bo koçberiyê 2" Lêkolîneke ku xwe dispêre berhema birêz "Bîlarî konsortiyom" - Zanîngeha Sa

# Wateyên Pergala Ewlekariya Niştimanî Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê

## Pêşgotin

Di sedsala nû de hêza dewlet û sabaran ne tenê li gorî hêza leşkerî tê pîvan, lê belê hêza aboriyî û çandî xwe bi xurtî di qada hevrikiya navneteweyî de, disepînin. Dabînkirina ewlekariya niştmanî, bûye giyanê ku berdewamiya jiyana civak û sabarên ramyarî misoger dike.

Tevî ku rûbera Sûriyê heta astekê biçûk e, lê di kirîza xwe de bandoreke mezin li têkiliyên ramyarî, civakî, navneteweyî û herêmî kir. Her wiha rola sereke ya Rêvrberiya Xweser û hemwelatiyên wê li deverên rizgarkirî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di milên erênî hebû. Nişteciyên erdnîgariya Sûriyê ji mêj ve, piştî rizgarbûna ji dagrikeriya Osmaniyan û mêtengeriyê û heta serdema nûjen, tu hevpeyman an girêbesteke civakî yan jî rola desthilateke demokratîk ku jiyaneke birûmet ji wan re raber bike, nedîtine. Lê belê her dem di nava şer û kirîzan de ku jan, paşverûtî û xizanî bi xwe re anîn, bû. Dixuye ku ev yek çanda kîndariyê heta bi asta radîkalbûna di nêrîn û ramanên cihêreng de, geş kiriye. Paradîgmaya Netewaya Demokratîk gelek çareyên ji bo arîşeyên deverê yên ramyarî, civakî û aborî pêşkêş dike. Her wiha gelek veguherînên avaker û girîng di warê ketwarî de li deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk anîne ku nexşeyeke ramyarî ya nû li deverê pêk hat. Edî ji bo dahûrandin û niraxandina wê dûrî dogmatîk û reşkirinê, divê nirxandineke giştî û tevgir jê re çêbe. Li gor serboriyên ramyarî , civakî û aboriyî yên ku li dever û dewletên derdorê tên jiyîn, dixuye ku wateyên pergala ewlekariya niştimanî di çarçoveya vê peradîgmaya han de dihên jiyîn

Ev lêkolîn ji bo ronîkirina ewlekariya niştimanî di çarçoveya pradîgmaya neteweya demokratîk de hatiye amadekirin. Lêkolîn hewl dide ku dahûrandineke kurt der barê wateyên wê de raber bike ku xwe dispêre rêgeza hevrûkirin û serboriyên li ser erdê. Di heman demê de aliyên erênî

yên vê pradîgmayê li ser astên ewlehiya ramyarî û aramiya aborî û aşîtiya civakî, tevî ku hêj hemû ramanên wê cîbicî nebûne, tên vegotin. Her wiha jirêderketina ji rêgezên wê ji hêla hin keysbaz û kertêlxweran ve tê diyarkirin, di heman dema ku ji aliyê hişmendiya dogmatîk, şofînî, mezhebî, faşîst û hêzên ku li pey zalîtiyê dikevin, tê redkirin.

Pêkhatina ewlekariya niştimanî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê , nîşana serketina pradîgmaya neteweya demokratîk e; jixwe ew serketina di raberkirina çareseriyan ji bo arîşe û astengiyên deverê de ye. Lewre baş e ku wateyên girêdayî pergala ewlekariya niştimanî bên dahûrandin û hêmanên wê li gorî çandên civakî yên heyî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bên destnîşankirin. Lêkolîn xwe dispêre rêbaza şirove û derencamê. Ev yek piştî ku lêkolîn, nêrîn, ramanên cihêreng ên girêdayî ewlekariya niştimanî û serboriyên cuda yên ku di çarçoveya dema ku welat bi taybetî piştî sala 2011`an tê re derbas bûye hatin jiyîn; piştî pelandina wan nêrîn û ramanên navbirî. Her wiha armanca dubarekirina hin ramanan, tekezkirina wan, ji ber ku gelekî girîng in yan girêdayî babetên pêşkêşkirî ne.

### Beşa Yekem: Ewlekariya Niştimanî: Wate û Rehend

#### - Ewlekarî û mirov

Bi deh hezaran nijad û bawriyên cihêreng hene ku bi hev re dijîn û gelek caran jî jiyana wan têkil hev e. Dîroka peywendiyên wan ên civakî, çandî, aborî û ramyarî berî hezarên salan li dar in. Lewre karîgerên ku wan digihînin hev, ji yên ku wan ji hev cuda bikin bi gelekî bêtir in. Lê belê rasteqîniyek heye, ew jî ku cîhan di rewşine pir aloz û tijî hevrikî û pevçûn re derbas dibe. Li ber hebûna xurt ya çanda kîndariyê ya ku ji aliyê hin kesan ve tê gurkirin, aştî tenê xewneke xweş û armanceke dûr xuya dike. Ev kesên han baweriyên cuda û zanistên têvil, ji bo rajeya rojevên xwe yên der barê desthilat û dewlemendbûnên bêsînor de bi kar tînin. Dixuye ku ev kes li ser pêdiviyên ku derûnnasê emerîkî Abraham Maslo di tewriya xwe ya bi navê "Handera Mirovî (Human motivation)" de zêd bikin. Ev bi rêya vê bîrdoziyê, Maslo pêdiviyên cewhera hander û pêdiviyên ku reftara mirovî saz dikin û dilivînin, şirove kir û di pêpelaneke pêşkiyan (girîngî) ya bi navê "Qoçeya Maslo" de rêz kirin. Jixwe piştre dê dabaşa vê mijarê bê kirin.

Ew rojev weke livînerê sereke yên têkilheva bûyer û pilanên navneteweyî tê dîtin. Her wiha dixuye ku ev rojev di hevrikiyeke berdewam bi ramanên ku mirov dikare navê ramanên şoreşgerî li wan bike, de ye. Ew ramanên ku bi awayekî yekser an ne yekser weke piştgir ji rêgezên demokrasî û aştiya cîhanî re li ser bingehên dadmendiyê di çarçoveya nirxên sincî de, xuya dikin. Ev hevrikî ne nû çêbûye, lê li dîroka dêrîn verdgere; di çarçoveya qencî û xirabiyê de û pêşveçûna wateya heval û dijmin di peywendiyên civakî, aboriyî û ramyarî de, bi taybet piştî biserkeftina mirov li hember xwezayê. Dixuye ku roleke girîng a xwezayê û arezûyên kesayetî di sazkirina vê çandê de heye.

Hevrikiyên aborî, ramyarî, leşkerî û çandî li cîhanê rû didin. Wekî mînak; dibe ku dilê mirov bi ser wan dewletan ve be ku di şerekî aborî (dorpêç, siza, malgirtin, şikandina ewlekariya aborî) de parastina xwe dikin, lê ya rast ew e ku dibe rojevên zalîtiya aborî li gel wan dewletan hebin û dibe ku gefan li ewlekariya niştimanî ya sabarên din bixwe; weke hevrikiya aborî ya Çînî-Emerîkî. Her wiha ev mijar ji bo hevrikiyên ramyarî û leşkerî jî derbasdar e, êdî aştî û ewlekariya navneteweyî ne aram dimînin. Ev yek pêşî bandoreke neyînî li mirov dike, ew mirovê ku navend û livînerê jiyanê û rastiya hebûnê ye. Bandoreke neyînî mezin ya rojevên zalîtî û dagirkeriyê li ser pergala ewlekariya mirovî heye. Gelek raman derketin pêş ku ev gef ji bo rajeya civakên xwe şîrove û dahûrandin. Lê dualîtiya qencî û xirabiyê, li gor nêrîna xwediyên wê, hê bandorê li ser armancên wê didomîe. Bi pêşketina lêkolînan û têkilheviya ramanan bi êşan re, derfet çêbû ku pergala ewlekariya mirovî li çend astên ku hev du bandor dikin were dabeşkirin. Dibe ku astên herî girîng ev bin; ewlekariya mirovî, ewlekariya niştimanî, ewlekariya herêmî û ewlekariya navneteweyî. Dixuye ku ev ast li dor navendeke bi navê "ewlekarî" dizivirin ku destnîşankirina sînorekî ji bo pênasekirina wê weke têgeh û wate zor e. Jixwe ta ku vedîtinên nû û veguherînên di ramanên mirovan ku mirov bitirsîne de hebin; lêkolînên ku "ewlekariyê" di war û mijarên cuda de tînin zimên, dê berdewam in.

**- Ewlekarî, wate û têgeh**

Tirs, weke hestekî derûnî tê dîtin ku ji ber pêşbînîkirina çêbûneke nêzîk a xirabiyê pêk tê[1]. We jî ji dahûrandineke kûr a encamên herî xirab ku dibe ji diyardeyekê yan bûyerekê yan jî karekî destnîşankirî encam bidin ku şîrovekirina wan bandoran bi hûrbînî zor e û kontrolkirina wan zêdeyî karîna mirov e.

Tirs weke handerekî çalak tê dîtin, dihêle mirov ji bo dabînkirina pêdiviyên xwe yên fizyolojîk û parastina ji tirsnakên ku dibe li hawirdorê wî yan di nîgaşa wî de pêk werin an jî pêk tên, bi berdewamî enerjiya xwe ya laş, hizir û derûnî bi kar bîne. Em dikarin tirsê weke sedemeke sereke bigirin dest, ew jî ji sedemên ku alîkarî di hebûna çand û şaristaniyên ku mirovan ji hezarên salan ve û heta dema me ya niha, ava kirine ye. Em vê yekê bi zelalî di efsane, ol, îdeolojî, şûnewarên dîrokî, sazî, şoreşên çandinî, pîşesazî û teknolojîk de dibînin. Terazûya tirsê heye ku dibe bi awayekî neyînî, dema ku mirov ji tiştinan bitirse ku bi xwe ne jêdera tirsê ne, têk biçe. Ev yek bi navê nexweşiya tirsê "fobiya" tê nasîn.

Bi pêşveçûna zanistê re di warên dahûrandina derûnî û damarî de, derfet vebû ku henderên tirsê li cem mirov baştir bên nasîn. Her wiha metirsiyên wê li astên cuda werin dabeşandin. Weke her car, çînên ku li desthilat û zalîtiyê digerin, encamên lêkolînên van zanistan û weke bijardeyeke stratejîk ji bo sazkirina çandeke girêdayî tirsê bi kar anîn, ji bo çarekirina metirsiyên xwe li hember her dijberiyekê li dijî rojevên wan, her wiha ev bijarde desthilat û kontrolkirinke tekûz ji wan re dabîn dike. Li hember vê yekê û ji bo dabînkirina aştî û ewlehiyê, mirov bi tena xwe yan li gel komeke mirovan yan jî bi awayekî saziyane di çarçoveya sabareke ramyarî yan civakî de, hewl daye ku hin stratejiyan saz bike ku ji bo çarekirina metirsiyên xwe li hember her gef yan berhingariyeke ku berdewamiya jiyana wî li gorî xwesteka wî asteng dike, hin amûr û navîgînan saz bike. Ev taybetiya han li nik mirov hebû û bi mirovê bihiş re bi awayekî berdewam heta vê serdemê di çarçoveya hevtêkiliya bi derdor û xwezayê re bi pêş ketiye. Ev tişta hatî ziman, nîşana wateyekê ye, ew jî-"ewlekarî" ye.

---

[1] Dr. Cemîl Selîba, el-Mucem el-Felsefî, bergê yekem, Berût 1994, el-Şerîke el-Alemiya ya Weşanê, r 545.

Li gor war û çanda ku ewlekarî têkiliyê pê re dike, gelek wate û pênaseyên wê hene. Ewlekarî li gor ferhengên zimanê erebî, tê wateya bêtirsî û dilniyayî. Lê li gor ferhengên zimanê igiliîzî[2], ferhenga Webster's têgeha ewlekariyê weha pênase dike: "Rizgariya ji tirs û nearamiyê û hewldana peydakirina dilniyayî û aştiyê". Lê ferhenga Oxford ewlekariyê weha dinasîne: "Çalakiyên hevbeş ji bo parastina welat yan binesaziyê yan mirovan ji metirsî û êrîşê". Gerînendeya Zanînê ya Birîtanî ewlekariyê bi vî awayî pênase dike: "Parstina neteweyê ji metirsiya têkçûna bi destê hêzeke biyanî". Peyva ewlekariyê bi zimanê fransî "sécurité" tê wateya "Tu metirsî tune ne", heman wate di zimanê kurdî de jî diyar dibe ku ewlekarî tê wateye "netirsî"yê an ku rewşa ku tirs tê de nîne. Ji bo her diyarde yan çalakiyekê bergiriyeke ewlekarî ya taybet heye. Weke; ewlekariya pîşesaziyê, ewlekariya tenduristiyê, ewlekariya leşkerî, ewlekariya xwarinê, ewlekariya esmanî û hwd.

Di heman dema bipêşketina jêderên tirsê de, ramanên girêdayî têgeha ewlekariyê jî bi pêş ketin; di çarçoveya têkiliyeke erênî di navbera wan de, li gor rêzika "kar û karvedanê" û têkiliya diyalektîkî ye. Her wiha em nikarin wê yekê di çarçoveyeke cih û demê de sînor bikin, çimkî ew berhema berhevkiriyên hizrî ne ku ji serborî, çavdêrî û berwerdiyan tê, ew jî weke taybetiyeke bingehîn ya mirovê bihiş e û cewhera çanada wî ye. Ango piştî ku mirov karîbû bi giştî û heta astekê hin diyardeyên sirûştî kontrol bike, ew jî bi riya avakirina bendan û coyên avdana dexlûdanan, avakirina dîwar û malan, dadana êgir û dahênana qeyikan û çêkirina hin alavan, li gel kedîkirina hin ajalan û berfirehkirina çandiniyê û hwd; mirov tûşî jêderine din ên tirsê hat, ew jî yên weke; metirsî, berhingarî û arîşeyên nû yên ku bi kar, çalakiyên û avakirina wî çêdibin ku nikare wan kontrol bike yan jî bi rê ve bibe dema ku ji dest derkevin, ew jî ji ber sedemên şaştiyekê yan pêşbîniyeke nelicih an jî fişareke berdewam. Wekî mînak: Bendav tevî sûda wê ya mezin; heke birûxe dibe jêdera metirsiyê, agir dema ji dest derkeve û kontrol nebe gund, mewdan û dexlûdanan dişewitîne, ajalên kedîkirî dema ku dibin dilkêşî ajalên dirinde û diza, noqîna qeyikan, hilweşîna mal û dîwaran û hwd.

[2] Adil Ebd el-Hemze Tecîl; el-Emn el-Qewmî we el-Emn el-Insanî Dîrase fil-Mefahîm; Kovara el-Ilûm Esiyasiye; r 327. Lînk: https://www.iasj.net/iasj?func=fulltext&aId=120552

Bi ser ve zêdetir veguherînên avhewayê û bobelatên ku pê re rû dan, her wekî zuhabûn an lehî yan berfa zêde li deverên cuda yên cîhanê û çêbûna xela, nexweşî û koçberiyên mezin a newteweyan û çavbirçîtiya wan di dewlemendiyên civakên din de. Bi vî awayî bergirî, rêkar û ramanên ku mirov ji bo dabînkirina wan xalan bi kar aniye, handerên sereke yên pêşveçûna têgeha ewlekariyê de ye ku bi awayê xelekên rêzbûyî yan jî weke berhevkiriyên zanînî, ji serdemên dêrîn ve ta serdema me ya niha berdewam kiriye . Lewre dema ku peyva ewlekariyê tê gotin, tê wateya hebûna tirseke girêdayî metirsiyeke heyî yan jî pêkane. Em dikarin bibêjin ku tirs berî ramana lêgerîna li ewlekariyê tê. Dixuye ku ev mijar rê ji me re vedike ku em wateyeke din li dualiya "qencî û xirabiyê" raber bikin, ew jî dualiya "ewlekarî û tirsê" ye.

Çend war û astên ewlekariyê saz bûn ku êkildarî pergala ewlekariyê ya sabarên mirovî[3] ne. Ew jî bi jiyana kes, civak, welat û cîhanê bi awayekî rêz û çînî sînorkirîne. Her wiha rehendên taybet ên her beşekê çêbûne. Ewlekariya mirovî hîmê bingehîn yê ewlekariya civakî ye ku ew bi xwe jî palpişta ewlekariya niştimanî saz dike ku ewlekariya niştimanî roleke sereke di rewşa aştî û ewlekariya herêmî û nevdewletî de dilîze. Ev beş hev du bandor dikin û nearamiya beşekê ji wan dibe sedema hejîna pergala ewlekariyê ya sabarên mirovî. Dixuye ku dîtaneya "bandora perperikê" (The butterfly effect) a ku bi navê tewriya "Tevliheviyê[4]" jî tê naskirin ya girêdayî veguherînên avhewayê, têkildarî vê mijarê.

"James Gilck" xwediyê vê dîtaneyê, weha derbarê bandora perperikê de dibîne5

"... endamine heta astekê biçûk jî yên avhewayê, dikarin pêşbîniyên herî baş derbarê avhewayê de, nirxên wan wenda bikin. Kêmasî û bûyerên nepêkan dubare dibin, bi rêya rêzelihevketinan, bandorên wan kom dibin û

---


[3] Mebesta me ji sîstema ewlekariyê ya statûyên mirovî, ew e wateyên ewlekariyê yên girêdayî dabînkirina çalakiyên mirovî ji bo misogerkirina berdewamiya jiyanê bi vîneke azad yan lihevkirî li ser asta mirovekî yan komekê; her wekî çalakiyên siyasî, leşkerî, zanistî, aboriyî, civakî, çamdî, tenduristî, jîngehî û hwd.

[4] Kaosê (wergrevan)

[5] James Gilck; teoriya kaosê (zanista tiştên nepêşbînkirî"; wergera Ehmed Mexribî; çapa yekem; Weşanxaneya el-Saqî; Beyrût 2008; r37.

hev digirin û ji endamine xwemalî yên biçûk, digihêjin asta tevgereke ku parzemînan tevdigire û ji aliyê satelaytan ve tên dîtin...".

Di serdema me ya niha de ewlekariya niştimanî, têkiliyeke navkariyê di navbera ewlekariya mirovî û ewlekariya navneteweyî de çêdike. Ew jî bi rêya avakirina rewşeke hevsengiyê di navbera ewlekariya niştimanî û ewlekariya herêmî de; lewre ewlekariya niştimanî tewereya sereke ya ewlekariya cîhanî û pîvanek ji pîvanên wê yên girîng tê dîtin.




**- Astên Pergala Ewlekariyê Yên Sabarên Mirovî.**

Pergala ewlekariyê ya sabarên mirovî ji têkilheviya wateyên ewlekariyê yên girêdayî astên xwemalî, herêmî, û navneteweyî bi hev û din re pêk tê; çimkî bandoreke pevguhêr di navbera wan de heye. Bûyerên mezin ên ku li cîhanê rû dan, tekez kirin ku ne pêkan e astek bêyî yên din were destgiritin. Çimkî weke ku dibe nearamiya astekê, aramiya astên din bihejîne; dibe ku aramiya astekê bandorê di arambûna astên din de bike. Em vê yekê di peymana Neteweyên Yekbûyî û biryarên navneteweyî yên Encûmena Ewlekariyê de dibînin. Weke mînak; dema encûmenê bi fermî hin şer û pevçûn li hin navendên nearam li cîhanê şermazar kirin, ew weke "gefekê li dijî aştî û ewlekariya navneteweyî " bi nav kirin. Ev gav girîngîdayîneke giştî ya ewlekariyê li ser hemû astên xwemalî, herêmî û navneteweyî amaje dike. Herêma Rojhilata Navîn weke navendeke nearamiyê tê dîtin û

kirîzeke rasteqîn ji ber hevrikiya îdeolojî, nijadî û olî lê heye. Bandora vê yekê li ser ewlekariya navneteweyî û ewlekariya niştimanî ya welatên derdora vê herêmê heye. Her wiha bandoreke neyînî li ewlekariya mirovî dike. Encama wê jî jiyana di metirsiyeke berhevkirî de ye û ev yek dibe sedem ku çanda kîndariyê ya ku radîkalbûn wê han dide, mezin bibe, her wiha lipaşmayîn û xizanî berdewam bibin û pirojeyên geşepêdanê ji dest herin.

Ji bo têgihaştina ewlekariya niştimanî û rehendên wê, baş e ku astên pergala ewlekariya mirovî yên din û peywendiyên wan bi rewşa ciyopolîtîk[6] û erdnîgariya ramyarî ya her welatî re bên nasîn. Ast jî ev in:

**- Ewlekariya Mirovî:**

Her zindiyek bi awayekî cuda xwe diparêze. Ewlekariya mirovî ji destpêka mirovahiyê ve derketiye holê û wateya wê bi bipêşveçûna mirov re, hatiye guhertin. Ew jî pêwîstiya mirov a parastina hebûna xwe û dabînkirina pêdiviyên fîziyolojîk wî dixe vê tevgerê; ji bo bi wizeya herî hindik, misogeriya berdewamiya jiyanê bi dest bixe. Erk, çalakî û armancên me weke kes di jiyanê de, wateya ewlekariya mirovî bi awayekî yekser eşkere dike. Ango ewlekariya mirovî, bergiriyên ku mirov li gorî nêrîna xwe li jiyanê û helwesta wî li hember bandorên derdora wî ya ku hevtêkiliya diyardeyên ramyarî , civakî û xwezayî bi hev û din re tê de dibe, distîne. Ji aliyekî din ve dixuye ku têkiliya ewlekariya mirovî bi hestên mirov re bi awayekî yekser heye, ji ber ku di hestkirina kêfxweşî û dilniyayiyê de karîgereke sereke ye. Bi vî awayî ewlekariya mirovî wateyeke xwedî cewhereke biyolojîk, saykolojîk û sosyolojîk e û di heman demê de stûnê sereke yê ewlekariya niştimanî pêk tîne. Ev yek gotareke ku dibêjin Marks

[6] Kesê yekem yê ku têgîna ciyopolîtîk bi kar aniye, lêkolerê siyasî yê swêdî Rudolf Kjellen e, sala 1905an di pirtûka wî de "Dewlet Dîmenek ji Dîmenên Jiyanê". Kjellen tekez dike ku divê erdnîgarî di rajeya dewetê de be. Ev yek jî bi riya ku erdnîgariya dewletê, di milê derbirîna helwestên siyasî de bibe jêdera hêzê ji dewletê re. Ango erdnîgarî weke jêdera hêzê ji bo derbirîna helwestên siyasî bê bikaranîn û pêdiviyên siyasî yên ji bo mezinbûna dewletê derdibirîne... lê erdnîgariya siyasî, bandora erdnîgariyê li siyasetê derdibirîne... çimkî erdnîgariya siyasî têkilî û peywendiyên sedemî di navbera desthilata siyasî û erdnîgaiyê de bi riya bikaranîna dewlemendiyên welat, hêza xwezayî û mirovî û destnîşankirina siyaseta dewletê, amaje dike. Zanistnameya Siyasî; Ciyopolîtîk (Geopolitics); lînk: https://political-encyclopedia.org/dictionary/

gotiye, tîne bîra me: "Mirov komek ji peywendiyên aboriyî û civakî ye, ew peywendî bi ku ve herin, hizrê mirov bi wir ve diçe".

Li ser asta navneteweyî , li gor hin biryarên Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî[7], ewlekariya mirovî yek ji wan bingehan tê dîtin ku pêkanîna ewlekariya cîhanî xwe dispêre wan; ji ber ku ewlekariya mirov û gelan, ne ya dewletan, bingehên pêkanîna ewlekariya mirovî ne. Çimkî hin caran dibe ku dewlet bi ewle be, lê mirov di bin metirsiyê de bin, weke rewşên bobelatên xwezayî û pevçûnan. Japonya û Kanada dewletên pêşîn bûn ku piştgiriya vê wateyê kirin. Nêrîna Japonya ew bû rizgariya ji xizaniyê û dabînkirina pêdiviyên sereke yên mirov û parastina jiyan û rûmeta wî. Lê hikûmeta Kanadayî, nêrîna wê ew bû ku pêwîstî bi rizgariya ji tirsê û rêlibergirtina bikaranîna hêz û tundiyê heye[8].

Gelek pênaseyên ewlekariya mirovî hene. Wekî mînak; logoya Sabata Pêbawer ya Neteweyên Yekbûyî rêbaza ewlekariya mirovî amaje dike[9]; bi riya "rizgariya ji pêdivîbûnê, rizgariya ji tirsê, azadiya jiyana birûmet". Anku ewlekariya mirovî, parastina hemû mirovan û alîkariya wan ji bo rûbirûbûna xizanî, nexweşî, kirîzên dûdirêj, bobelatên xwezayî, rewşên rawestîna aborî û hwd dike. Bi giştî made û bendên Ragihandina Cîhanî ya Mafên Mirovan[10] ên ku Komeleya Giştî ya neteweyên Yekbûyî li Parîsê 10'ê kanûna pêşîn 1948'an xwe sparte wan, weke jêdereke sereke ku wate û rehendên ewlekariya mirovî û kelemên ku rastî wan tê derdibirîne, tê dîtin. Bi taybet ku kesên ku ew saz kirine weke nûnerên paşxaneyên cihêreng yên zagonî û çandî, ji cîhanê tevî, tên dîtin. Her wiha rehendên ewlekariya

[7] Ji bo dîtina van biryaran li rûpela Komeleya Giştî ya Neteweyê Yekbûyî vegere. Gera şêst û şeşan, benda 14 û 117an ji ajandayan; biryara ku Komeleya Giştî ya Neteweyê Yekbûyî di 10 îlona 2012an de girtiye. Lînk: https://undocs.org/ar/A/RES/66/290

[8] Xewle Mehiyedîn Yûsif – Dr. Emel Yazecî, el-Emn el-Insanî we Ebadehu fil-Qanûn Eduwelî el-Am, Kovara Zanîngeha Dîmeşqê ya Zanistên Aboriyî û Qanûnî, berga 28an, hejmara 2yan, 2012, r 529

[9] ji bo agahiyên zêdetir, li malpera Sabata Pêbawer ya Neteweyên Yekbûyî ya Ewlekariya Mirovî vegere; ewlekariya mirovî çi ye? Lînk: https://www.un.org/humansecurity/ar/what-is-human-security/

[10] Ji bo dîtina van bend û madeyan li Ragihandina Cîhanî ya Mafên Mirovan; malpera Neteweyên Yekbûyî vegere; lînk: https://www.un.org/ar/universal-declaration-human-rights/index.html

mirovî û ramanên din ên girêdayî wê ku dê werin qalkirin, bi xwe pênaseyên ewlekariya mirovî nîşan didin.

Li gel vê yekê, em dikarin bi kurtî ewlekariya mirovî weha binasînin; alîkariya mirov ji bo ku bikare bi ewle û azadî di çarçoveya nirxên exlaqî û rêgezên dadmendiyê de bijî.

- **Rehendên ewlekariya mirovî:**

Rehendên taybet ên ewlekariya mirovî hene. Bi riya van rehendan em dikarin metirsî, astengî û gefên ku ewlekariya mirovî rastî wan tê, destnîşan bikin. Geşepêdan û xurtkirina van rehendan roleke sereke di misogerkirina ewlekariya mirovî de dilîze. Rapora geşepêdana mirovî ya ku ji aliyê bernameya Neteweyên Yekbûyî ya geşepêdanê sala 1994'an hat ragihandin, heşt rehendên ewlekariya mirovî destnîşan kirin[11]. Rehend ev in: ewlekariya aboriyî, ewlekariya xwarinê, ewlekariya tenduristiyê, ewlekariya derdorê, ewlekariya kesayetî, ewlekariya civakî, ewlekariya ramyarî û ewlekariya parastinê. Gelek lêkolînan behsa van rehendan kiriye û li gor çawaniya civakên ku hatin lêkolînkirin û alîgirtinên hizrî, ew rehend şîrove kirine. Piştî em xwe bispêrin mijarên navbirî, em dikarin rehendên ewlekariya mirovî bi vî awayî destnîşan bikin:

**1** Ewlekariya aboriyî: Tê wateya peydabûna jêder yan dahateke sereke ya misoger, ji bo ku mirov bikare pêdiviyên xwe yên cuda dabîn bike, li ser asta xeta xizaniyê be û jiyana birûmet misoger bike. –divê pîvanê her welatekî ji bo destnîşankirina xeta xizaniyê hebin-.

**2** Ewlekariya xwarinî: Derfeta bidestxistina berdewam ya xwarina sereke û tenduristî. Du mercên sereke hene, ji bo ku ev yek pêk were, peydabûna xwarinê û karîna kirîn yan helberîna wê.

**3** Ewlekariya tenduristî: Peydakirina rewşên guncav yên ku asta herî jêr a parastina ji nexweşî, epîdemî û arîşeyên derûnî û sinirî misoger dikin. Her wiha dabînkirina derdoreke tenduristî ku sedemên nexweşiyan tê de nebin û mîkanîzmayek hebe ku baldariya tevgir di rewşên arîşeyên tenduristî yên dûdirêj de dabîn bike, ev yek jî bi riya avakirina pergaleke

[11] Tenduristî û ewlekariya mirovî; Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanî (Nivîsgeha Herêmî ya Rojhilata Navîn) – benda 9an ji ajandaya gera nod û çaran ya ku di tebaxa 2002an de hat lidarxistin, r 2.

dabîna tenduristiyê û karîna bidestxistina rajeyên tenduristî li her cihî û di her demê de pêk tê.

**4** Ewlekariya derdorê: Tê wateya dabînkirina rewşên biewle li her jîngeha ku mirov lê dimîne. Çi ya kar, an a civakî yan jî ya sirûştî û hwd be tenduristî û saxlemiya laş, derûnî û hizrî ya mirov, misoger dike. Bobelat, qirêjbûn, qerebalx, dîmenên kirêt, binesaziya neberbiheve û reftara bêberpirsyar weke astngiyên herî mezin yên li pêş ewlekariyan derdorê tên dîtin.

**5** Ewlekariya kesayetî: Tê wateya parastina mirov ji tundiya laş û derûnî û qedexeya binpêkirina mafên kesayetî û azadiya giştî ya di çarçoveya nirxên sincî û rêgezên dadmendiyê de sînorkirî. Heke tundî ji aliyê saziyên dewletê yan ji aliyê hin kesan ve pêk were yan jî ji hêla mirov bi xwe jî, her wekî xwekuştinê yan standina hişbiran an jî niyaza kirina sûcekî. Li kêleka vê jî divê mîkanîzmayên pêwîst ji bo misogerkirina parastina dewlemendiya kesayetî, xûdaniya hizrî û wekheviya kirina çalakî û karên cuda werin peydakirin. Li gel van tiştan dibe ku dilniyayiya berdewam ya kes pêk were.

**6** Ewlekariya civakî: Parastina nasnameya çandî ya kes di çarçoveya nirxên civakî yên civaka ku tê de dijî de misoger dike û rê li ber her tiştên ku dibe ku ziyanê li civakê bike yan parçe bike, digire. Vê yekê jî bi riya amadekirina rewşine civakî yên objektîv pêk tîne; dûr ji çanada kîndariyê, levnekirina nijadî, tundiya malbatî, kedxwarî, bidawîkirina siyaseta destdirêjiya atife yan hiş ya ku hewl dide hiş bi mijarên sêks, tundî, şer û siyaseta serçimandinê dagire. Li kêleka van jî parastina malxwêyê malê ji her siyasteke pîs ku hewl dide wî kedî bike û bixe di bin vîneke stemkarî yan xapîner de ya armancine ramyarî yan civakî yan neyarî. Dixuye ku ewlekariya civakî di civakên ku çîn di wan de hene, lawaz e û di civakên komînal û demokratîk de bihêz e.

**7** Ewlekariya ramyarî : Parstina mafên mirovan û azadiya wan misoger dike. Her wiha wî ji tundiya derûnî û ya laş ya ku dibe ku bi sedema bawerî yan raman an şêwazê derbirîna xwe bibîne, diparêze. Ev yek jî di çarçoveya nasnameya niştimanî û nirxên sincî de û rêlibergitina her tiştên ku gefê li hevgirtina ewlekariya niştimanî dixwe de ye. Wekî mînak; nezaniya ramyarî , piraniya bêdengiya ku her dem kar dike û li pey gepa nanê xwe dikeve, destnîşan dike, li gorî awayê ku payebilindên

stemkarî û malgirtinî destinîşan dikin. Payebilindên ku hewl didin heta ku karibin, mirov bixin di bin bandora hestan de û şiyana rexneyî[12] li cem tune bikin. Heke ajanda û pilanên van payebilindan bihatana nasîn, dê li hember wan derketibana û dê rewşa jiyanî bi awayekî dadmend bi bêş biketa û ev yek dê bandoreke erênî li civakê bikira.

**8** Ewlekariya parastinê: Bergirî, rêkar û navgînên ku geşepêdana mirovî û amadebûna ji sînariyoyên herî nebaş re bi riya danîna berî bi demekê ya plan û çareseriyan dabîn dikin, vedihewîne. Dixuye ku birêketina ber bi bipêşxistina çandên xwemalî û saziyên cuda cuda ve, ji geşepêdana mirovî re faktorekî girîng e.

Li aliyekî din, em dikarin bi riya naskirina pêpelaneke pêşkiyan li gor mirovên ku gelek dem ji wan re divê û gelek kedê didin ji bo wê pêk bînin, ewlekariya mirovî derbirînin; ji ber ku kêfxweşî û dilniyayiyê ji wan re pêk tîne. Her wiha "Abraham Maslow"yê[13] derûnnas pêşkî di pêpelanekê de rêz kirin û ew pêpelan bi "Pramîda Maslow"yê bi nav kir. Maslow dibîne ku heta mirov bikare bê depresyon, xem û nexweşiyên derûnî bijî ew pêşkî, ew pêdivî ne ku divê werin têrkirin. Têrnekirina van pêdiviyan, dê bihêle ku mirov piştre hewl bide bi awayekî ku ji hed derkeve, di derfeteke nêzîk de û bi her riyê, wan pêdiviyan têr bike. Li gorî Maslow ev pêdivî çar in[14]: Pêdiviyên fîziyolojîk, pêdiviyên ewlehiyê, pêdiviyên hezkirin û endamtiyê (pêdiviyên civakî) di nav de têkiliyên hestiyarî û malbatî û avakirina têkiliyên hevaltiyê (têkiliyên di çarçoveya kar de), daxwaza teqdîrê û avakirina xwe û navûdengekî kesane taybet bi wî, pê re rêzgirtina civakê bi dest bixe. Pêdiviyên ewlehiyê girêdayî cewherê ewlekariya mirovî ne. Amaje bi hin rehendên wê bû, lê baş e ku em bîr bibin ku xwespartina mirov li şiyanên kesayetî, dikare wî ji koletî û peyrewiyê rizgar bike. Ev bû ya ku rengê xwe li hestên mirovî veda, çimkî dema ku mirov bikare alav, xwarin, vexwarin, cil û cihê xwe peyda bike yan çêke, dê pêdivî pê nebe ku bibe kole, ji ber ku

---

[12] Şiyana rexneyî: Preoseseke hizrî ye ku dikare mijar yan nêrînekê bi şêwazekî objektîv dahûrîne. Şêwaza ku li ser rêgeza guman û dûrketina ji darizandina atifî û dogmatîk bi destnîşankirina aliyên neyînî û erênî û girtina bertekeke guncav, radibe

[13] Abraham Maslow; di sala 1908an de ji dayik bûye û sala 1970yî de miriye. Zanyerekî amrîkayî ye bi eslê xwe cihû û rûs e. Tişta bi navê Pramîda Maslow di teoriya xwe ya derûnî de "teoriya handera mirovî" şîrove kiriye.... Abraham Maslow; Wikipedia

[14] Saul McLeod, Maslow's Hierarchy of Needs, simply psychology, 2018, link: https://www.simplypsychology.org/maslow.html

dê bikare xwe biparêze. Tê zanîn ku asta biserkeftina rêjîmên stemkar, bi hejmara koleyên wan – ên ku bi stemkariyê razî ne- tê pîvan.

Bi gelemperî, behre û bîreweriya berfireh weke sedemên sereke yên ku dihêlin mirov di destê xwe de be, tên dîtin. Dixuye ku pergala fêrkirinê ya cureyî û pergala aboriyê ya hevbeş û civakî, rê li ber vê gavê vedikin.

Dixuye ku ramanên ku hatin pêşkêşkirin, girêdayî nêrînên dewletên bihêz in ên ku siyasetên navneteweyî û paşxaneya çandî û civakî ya derûnnas û civaknasan di destên wan de ne. Her wiha payebilindên olî û navneteweyî amajeyê bi wê yekê dikin ku desthilat, ewlekariya mirovî misoger dike, ji ber ku hêza hizrî û ya laş li cem mirov lawaz e. Berevajî helwestên serkêşên şoreşên civakî weke pêxember û ramangeran ên dibêjin û rijd in ku ewlekariya mirovî divê bi destê mirov bi xwe pêk were; li gorî şiyan û behreyên wî û tenê bes e ku payebilindên civakî û ramyarî rê li pêşiya mirov vekin û kelemên di riya wî de rakin. Ev mijar dihêle ku em nêrîn û ramanên serkêşên şoreşên civakî û ramyarî yên hemdem bişopînin, bi armanca naskirina nêrîna wan bi ewlekariya mirovî û rehendên wê. Ji ber ku ewlekariya mirovî ji armancên sereke bû yên ku ji bo wan şoreşên xwe di bin stemkarî, jankêşî, hovîtî û lipaşmayînê de pêxstin û plankirina stratejîk a wan şoreşan jî xwe dispêre vê yekê. Ramangerê navneteweyî Ebdullah Ocelan li devera me ji girîngtirîn serkêşên şorşan e ku karîbû veguherînên girîng di binasaziya çandî, civakî, ramyarî û aboriyî de çêke, ew jî bi riya raberkirina ramanaine nû, dixuye ku wan ramanan binkene stratejîk ji bo statu û ramanan çêkirin, ramanên ku ji pradîgmaya neteweya demokratîk ya ku wî pêşkêş kir, derketin.

Tevî ku rasterast behsa têgîna ewlekariya mirovî û rehendên wê nekiriye, lê piraniya ramanên wî li ser vê mijarê ne. Ew jî bi riya guhdana li ser pêşkêşkirina hêmanên ewlekariya mirovî ya ku dê jixweber pêdiviyên mirov û parstina wî di nava xwe de bihewîne. Ev yek jî bi riya pêşxistina pêşkiyên pêdiviyên mirovan ên weke parastin, pirbûn û têrkirina pêdiviyên kesane yên ku di civaka xwezayî de hebûn[15]. Girîngtirîn hêmanên

[15] Civaka Xwezayî: Sîstema komên mirovî ye. Sîstema ku qonaxeke civakî pir dirêj dom kir ku ji veqetandina mirovan ji malbata guhandaran ya sereke destpê dike û bi derketina civaka çînî bi dawî dibe. Carê navê qonaxa Palyolîtîk (Serdema Kevirî ya Kevn) û Nîolotîk

ewlekariya mirovî ev in: Demokratî û vîna azad di çarçoveya nirxên sincî û jiyana komînalî de, hemahengiya di navbera mirov û ekolojiyayê de, aboriya komînalî ya ekolojîk, xweparastin, moralên ku xwe dispêrin wizeya bîrbirinê. Ev hêman kakilê xweragir di statûya neteweya demokratîk de saz dikin.

Piştî xwespartina li rastiya civakên me yên xwemalî û dîroka wan a ramyarî û çanada wan a dêrîn û ji bo misogerkirina ewlekariya mirovî, ramanger Ocelan pêwîstiya rizgariya kes ji zoradarî û kedxwariya ku ji hêla kategoriyên desthilatdar ên civakî, ramyarî , olî û aboriyî pêk tên, piştrast dike. Ji malbatan mîna yekîneya civakî ya herî biçûk di çarçoveya zalîtiya hişmendiya nêrî ya desthilatdar, heta serkêşên civakî, aboriyî û olî û dawî lutkeya piramîda desthilatê. Ev yek jî bi riya van xalan pêk tê: hebûna navgîn û amûrên hilberînê yên pêwîst ku ew amûr ji hêla tu kesî ve neyên malgirtin, vesazkirina keda mirov ji dijî û kedxwariyê, redkirina bîrokratî û sermayedariya dewletê, parasrtina çînên kedkar bi riya zagonên ku ew çîn beşdarî sazkirina wan bibin, li kêleka wan jî redkirina ezezîtiyê, dûrketina ji bi tundûtûjiyê pêkanîna evînî yan hogiriyê yan alîgiriyê, Her wiha demokratî ne tenê di rêjîma desthilatdar de, lê di jiyana kes û civakê de bi riya xwespartina pergala komînalî bi cih bibe. Li kêlka vê jî dûrketina ji kolgirtina jinê û dûrketina ji givaşên ku ji cudahiyên mezhebî yan dijberiyên neteweyî[16] û çandî pêk tên. Divê di neteweya demokratîk de kes bi qasî azadbûna xwe, weha komînal be û azadiya xwe di komînalbûna civakê de bibîne. Anku jiyana bi awayê komên biçûk. Her wiha amajeyê bi pêdiviya kes bi endamtiya neteweyekê dike, neteweya ku weha wê pênase dike: "kombûneke ji kesên ku xwedî hişmendiyeke hevbeş in...", û neteweya demokratîk, neteweya herî nêzîk ji azadî û wekheviyê ye û hevbeşiya zihnî û çandî ya gel û civakan misoger dike[17]. Piştre pêvajoya jinûveavakirin û

---

(Serdema Kevirî ya Nû) li vê serdemê ya dîroka mirovî tê kirin... Ebdullah Ocelan; Parastina Gelekî; werger: Zaxo Rizgarî; çapa yekem 2005, bê weşanxane; r 21

[16] Ji bo agahiyên zêdetir li bergê pêncem ya pirtûka "Manfistoya Şaristaniya Demokratîk (Doza Kurd û Çareya Neteweya Demokratîk\ Parastina Kurdên ku di nav pencên qirkirina çandî de ne)"; Ebdullah Ocelan; werger: Zaxo Şiyar; çapa duyem 2014, Çapxaneya Azadî, bê weşanxane.

[17] Ji bo agahiyên zêdetir li pirtûka "Rijdbûna li ser Sosiyalîzmê Rjidbûna li ser Avakirina Mirov e"; Ebdullah Ocelan; çapa yekem 2003; weşanên Yekîtiya Ronakiyê ya Demokratîk; Çapxaneya Azadî; pirtûka 20an ji rêzepirtûkên erebî.

nirxandina mirov ji xwe re tê; ji aliyê ramyarî , civakî, çandî û aboriyî ve. Li gor wê vîna rizgarkirî, bi riya kesayeta ramanger û xwedîbiryar, ne ya kole û çêkirî. Ev yek jî bi riya meyla ber bi hesta rexneyî ve û bilindbûna zihnî pêk tê. Bêyî hebûna hêza hizir û aqil li cem mirov, jiyana praktîkê di çarçoveya bipêşketina mirovî bi pêş nakeve û bêyî hebûna hizir, aqil û hêza aşopiyê, jiyan ne pêkan dibe. Çiqasî jiyana mirov ji aliyê kesê ku wî xwedî dike ve heke xwediyê wî be yan hikûmeta wî be yan mal û milkên wî be dabînkirî be, nabe ku bê kar bimîne, ji ber ku ked, hilberandin û afirandin, bipêşketina mirovahiyê pêk tînin. Lewre divê mirov xwe ji bêkariyê tevî bipêşketina teknîkî biparêze, bi ser ve zêdetir divê kar heta asta peristinê bike. Çimkî nirxê pişkdariya kes di civakê de li gor behre û asta ked û helberandina wî dimîne. Moral wan xalên navbeirî gur dike, lewre pêdiviya mirov bi moralan heye. Yek ji mijarên ku di nava xwe de dihewîne, redkirina çanda kîndariyê ye ya ku Ocelan ew çand bi lawirî û hovîtî wesifand. Daketina moralan dibe sedema serweriya bêhêvîbûnê ku bêhêvîbûn kelema sereke li pêş bipêşketina mirovî û dibe ku mirov ber bi xwekuştinê ve bibe; xwekuştina fîzîkî bi riya mirinê yan xwekuştina çandî bi riya bişaftina di çandine din de yan xwekuştina civakî bi riya reftara jirêderketî yan xwekuştina ramyarî  bi riya serçimandina li hember stemkariyê yan jî xwekuştina aboriyî bi riya bêdiravî, bêkarî û xizaniyê.

Ji bo ku mirov berdewamkirina jiyanê û destkeftiyan bi awayekî dirust misoger bike, divê jîngehê bi riya xwespartina li ekolojiyê di hemû çalakiyên hilberandin û mezaxtinê de biparêze. Ji ber ku mirov bi xwe beşek ji prosesên pergala jîngehê ye, prosesên mîna rîaksiyona jîndar di navbera pergalên heyînên zindî û civakên ku ji wan pêk tên û pêkhateyên nezindî yên jîngeha wan. Lewre pêdivîyeke jêneger a mirov bi jîngeheke dirust heye û beşeke mezin ji berpirsyariya pêkanîna vê jîngehê dikeve li ser milê wî.

Ramanger Ebdulla Ocelan destpêkê pênc pêdiviyên sereke ji bo misogerkirina ewlekariya mirovî  û mirovê bîrewer û têgihştî bi hemû şiyanên xwe hewl dide wan bi dest bixe, amaje dike. Pêdivî ev in: pêdiviya bi vîna azad, pêdiviya bi xurtkirina kesayetê û pêşxistina wê ji aliyê hizrî, derûnî û aboriyî ve, weke sazgêriyên cewherî di xweparastinê de û pêdiviya bi moralên ku bi riya bîreweriya avaker û redkirina çanda kîndariyê tên

handerkirin ku dikarin jîrekiya atifî û civakî ya kes bi pêş bixe. Pêdiviya bi karê hilberînker û afrîner heye û pêdiviya bi jîngeh û derdora durist û paqij a xwezayî, civakî, ramyarî yan jî çandî heye.

Xalên ku hatine vegotin dikarin bandoreke erênî li ser civak, gel û neteweyê bike, da ku bandora wê li cîhanê tevî bibe. Ji ber ku mirov heybera avakirinê û wizeya jiyanê ya civakên cihêreng in.

Demokratî û vîna azad di çarçoveya nirxên exlaqî û jiyana komînalî de dimînin ew mertalên ku parstina mirov ji kedxwarî, stemkarî û binpêkirina azadî û mafên wî dikin, di heman demê de rê li ber vedikin ku heta astekê pişkdariyê di bipêşxistina bûnemendiyê û saziyên statûya desthilatdar de bi riya rizgarkirina ramanên xwe yên ramyarî û wizeyên îdeolojîk di çarçoveya nasnameya niştimanî de bike. Ango ne di bin siya statûyeke biewle de be ku rêgezên demokratiyê tê de peyda bibin û bikare welatiyên xwe ji metirsiyan biparêze, ewlekariya mirovî nayê dîtin. Lewre nebûna ewlekariya mirovî di asta sereke de girêdayî rêjîmên desthilatê yên zordar e. Rêjîmên ku mirov ber bi goşegîriya ji civakê dehf dide û wî dike zindiyekî neyînî, mezaxteker ne hilberînker an ji ber sûcekî ji rê derdikeve yan jî li kesayeta "zindiyê efsaneyî" (Centaure) vediguhere, kesayeta bi seriyekî lîberal û laşekî desthilatdar û zordar, bi rêgeza "bihêle bixebite, bihêle derbas bibe" tijî ye û hewl dide newekheviya civakî, cudahiyan û mijrên din ên ne di rê de[18] bi hêz bike. Dibe ku ber bi bijaredene din ve here, her wekî raperîna li hember desthilatê yan koçeberiyê yan jî xinziyê (dev ji nasnameya niştimanî berde). Şerê derûnî û ajadayên komploger, serê pêşîn guh didin rûxandina ewlekariya mirovî; ev kar jî yek ji pîvanên biserkeftina wan e.

Dagirkerî û şer, çekên nûkler û mayîn, gilobalîzasyona aboriyî û aboriya bazarê û germbûna goganî, Her wiha nebûna rêgezên demokratî, dadmendî û birêvebirina[19] demokratîk, nebûna geşepêdana domdar di

[18] "Zindiyê efsaneyî (Centaure): Zindiyek e ku li Amerîkayê hatiye afirandin û teşeyek ji teşeyên hizirandina efsaneyî ya amerîkayî ye ku dixwaze di çarçoveya globalîzimê de li ser cîhanê bisepîne...". Dr. Ismaîl Ebdilfetah Ebdilkafî; Zanistnameya Aboriyî û Civakî (erebî-îngilîzî); weşanger: Saziya Pirtûkên Erebî 2005, r 406

[19] Birêvebirin: Têgeheke nû ye ku sîstema birêvebirinekê amaje dike, ew sîstem di asta yekem de girîngiyê dide sincan bi taybet di aboriyê de tê bikaranîn. Wateya wê berfireh bû û siyast, leşkerî, perwerde û hwd tev girtin. Bi giştî ev sîstem komek rêzik, rêgez û rêkarên

hemû beşan de (pilanên ewlekariya parastinî) ji girîngtirîn astengiyên li pêşiya ewlekariya mirovî ne. Dibe ku hikûmetên xwemalî nikaribin wan tevan dabîn bikin, ji ber ku pêdiviya wan bi wizene gelekî mezin û demeke destnîşankirî heye.

**- Ewlekariya herêmî û navneteweyî :**

Hevrikiya herêmî, hin sînariyoyên bitirs bi pêş dixe. Heke handera li pey vê hevrikiyê projene îdeolojîk bin ku çanda kîndariyê belav dikin û di nav xwe de çalakiyên paqijkirina nijadî û guhertina demogirafî û armanceke stratejîk di desteserkirina dahetî û dewlemendiyên cihêreng de û kolgirtina gelan, dihewînin. Ewlekariya herêmî û navneteweyî , têgîn û wateyeke berfireh e, destnîşankirina wî bi hin rehend û marcên taybet de zehemet e. Hin kes ewlekariyê bi şiyana şer ve girê didin. Teoriya ketwarî di siyasetê[20] de, çend şîrove di vê derbarê de raber kirin, ew jî bi riya dîtina hevbendiyên di navbera dewletan de dikarin şiyana dewletê ya xweparstinê zêde bike, lê şertê ku dewletên hevbend xwe nespêrin hev û ne jî alîgiriya hev bikin. Teoriya ketwarî wê yekê dibîne ku mirov ji xêrê û karê baş hez nake, lê meyldarê şer û karê nebaş û qezenckirina hêzê ye. Dema ji asta mirovî diçe asta dewletê, ev sîfeta han zêde dibe. Her wiha amajeyê bi wê yekê dike ku rêgezên sincî di karê ramyarî de nikarin werin pêkanîn. Ji ber ku sinc, li gor vê teoriyê, ne ramanine beraqilî ne, ji ber ku li ser hestan ava dibe û dewlet bi xwe li ser hestan ava nabe. Dibe ku ev teworî heta astekê bi rewşa nearam a aştî û ewlehiya navneteweyî , nebûna baweriyê di têkiliyên navneteweyî de bandor bûbe. Bi vî awayî her dewlet dê karekî nebaş ji dewleta din re pêşbînî bike.

Danerên teoriya ketwarî sê rewşan ji bo aştiya navneteweyî û herêmî destnîşan dikin, ew jî ev in: Rewşa hevsengiya di hêzê de ango hebûna hêza jêvegerndinê (parastinê) ya guncav. Rewşa zalîtiyê: Hebûna

---

kuaramnca wan ev e: Pêkanîna rêkeftin û hevsengiyê di navbera xwediyên berjewendiyên dijber de, belavkirina maf û berpirsiyariyan di navbera wan de di çarçoveyeke giştî ya zelal û wekheviya derfetan, xurtkirina xweçavdêriyê, bixwegirtina hin pîvanan ku taybetiyên siyasî û çandî û teşeyên xwedîtiyê, bazar, darizandin, qedexekirina malgirtinê û parastina mezaxtker û jîngehê û zagonên baş û kar... û hwd di ber çavan re derbas dikin.

[20] Zanistnameya Cezairî ya Lêkolînên Siyasî û Stratejîk; lêkolînên stratejîk, teoriya ketwarî ya klasîk di têkiliyên navdewletî de; dîroka weşanê 10.6.2019; lînk: https://www.politics-dz.com

dewleteke bihêz ku zalîtiya xwe li ser pergala herêmî û navneteweyî , bê ku kontroleke tam bi dest bixe, bisepîne. Ev rewş di xet û komikên navneteweyî de tê dîtin; ên ku çend dewletên bihêz kom dikin û dewleta herî bihêz serkêşiya wan dike. Rewşa aştiya imperatorî: Rewşa kontrola yek dewletê ye ku di biwarên cihêreng de xwedî şiyanên zilhêz e, ew şiyan rê li ber vedikin ku dewltên din bi awayekî tam kontrol bike û vîna xwe li ser wan bisepîne.

Ev teorî ewlekariya navneteweyî û herêmî, ta bi ewlekariya niştimanî jî bi hêza dewletên leşkerî ve, weke misogeriya pêkanîna aştiyê, girê dide. Lê ya ku gumanê di rastiya vê teoriyê de çêdike, ew e ku gelek dewletên bihêz di pêkanîna ewlehî û aştiyê de çi li hindirê xwe yan li derve bi bin ketin; bi ser ve zêdetir hin dewlet ji aliyê leşkerî ve xurt bûn, lê niha ji holê rabûne.

Bi giştî, ewlekariya herêmî dikare were pêkanîn, heke proje û ajandayên ku gefan li ewlekariya niştimanî ya dewletên derdorê dixwin, werin redkirin. Yan jî çend dewletên ku ji yek herêmê ne, bigihên hev û ked û şiyanên xwe di hemû waran de bikin yek, ji bo parastina hevbeş da ku nehêlin hêzeke derveyî zalîtiyê li ser wê herêmê bike yan jî destwerdanê bi awayekî ku bandorê li berjewendiyên dewletên herêmê bike, di karûbarên wan de bike. Hin dewletan heta astekê dikarî ewlekariya herêmî pêk bîne, weke Yekîtiya Ewropayê û Encûmena Hevkariya Dewletên Kendavê (Mecils Eteawin el-Xelîcî). Ewlekariya navneteweyî , heke rêza dademendî û peyman û rêkeftinên Neteweyên Yekbûyî hebe, dê ewlekariya navneteweyî pêk were. Lê divê Encûmena Ewlekariya Navneteweyî li hember peymanên girêdayî vê yekê, zelal be û rêzê ji wan re bigire. Hêmana bingehîn ji bo parasrtina pergala ewlekariyê ya cîhanî, rêxistina Neteweyên Yekbûyî ye. Li aliyekî din têgîna kozmoplîtan[21] weke bijardeyeke stratejîk ji bo pêkanîan aştiya cîhanî tê raberkirin.

[21] Kozmopolîtîs yan kosmopolîtîs: Peyveke grekî ye ji "kosmos" anku cîhan yan gerdûn û "polîtîs" ya ku tê wateya hemwelatî yan kes, pêk hatiye. Peyv weha tê şîrovekirin, têgînek e ku hemwelatîbûna cîhanî ya ku sînorên yek nijadê, yek zimanî û yek bawê derbas dike, amaje dike. Ev yek li ser bingehê sinc û rêgeza rêzgirtinê radibe; di bin sîwana hikûmeteke cîhanî de.. Kozmopolîtan (Cosmopolitanism): Ew îdeolojî ye ku bawer dike ku mirov hemû endamê yek civaka cîhanî ne. Li ser bingehê sincên hevbeş yan têkiliya aboriyî ya hevbeş yan jî binyata siyasî ya ku neteweyên cihêreng tevdigire. Tê wateya aştiyê di navbera neteweyan de li ser bingehê hevtêgihiştin û lihevborînê... Hin kes wê weke rûyê geş yê

Pêkhatina ewlekariya herêmî û ya navneteweyî li ser projeyên stratejîk ên dewletan û planên geşepêdana tevgir û demdirêj disekine. Her wiha bandora wê li ser ewlekariya neteweyî ya dewletên cuda heye, yên ku li gorî ku bikare seredariyê bi xurtî bi sînariyoyên pêkan re yên ku di milê ramyarî û ewlekarî de li ser asta herêmî û navneteweyî çêbin, bike, stratejiyên xwe yên neteweyî saz dike. Projeyên îdeolojîk yên xwedî rengê neteweyî yan olî û projeyên emperyalîzm mezintirîn jêderên gefan yên li ser vê ewlekariyê ne. Ev yek gelek dewletan ber bi tiştê bi navê "hevsengiya tirsê" ve dehf dide. Dixuye ku sînor ji vê armancê re nînin û bandorên neyînî weke nemana ewlekariyê bi xwe re tîne.

Li aliyekî din, civak dikarin roleke sereke di pêkanîna ewlekariya herêmî û ya navneteweyî de bilîzin. Tevî ku civak di birêvebirina siyaseta derveyî û biryarên girîng yên gelek dewletan de beşdar nabin, lê redkirina çanda kîndariyê yan hevgirtina civakan yan diyaloga di navbera wan de dikare pişkdariyê di pêkanîna aştiya cîhanî de bike. Rêjîmên desthilatdar yên dewletî, ji bo bihaneyan ji kiryarên xwe yên êrîşker û hovane re bibînin û ajandayên zalîtiyê xurtir bikin, nakokî û kînan di navbera civakên cuda de çêdikin. Her wiha rêjîm bi armanca parçekirin û lawazkirina civakê, hewl didin wê gendel bikin; da ku kontrolkirin û birêvebirina wê li gor vîna desthilata zordar hêsan be. Lewre aştî di hindirê civakan û navbera wan de, dikare stratejiyên hovîtiyê yên ajandayên zalîtiyê di warên ramyarî , aboriyî û leşkerî de pûç bike. Her wiha ji erkên payebilindên civakî ye ku dadgehkirina civakî ji bo dozên hindirîn û derveyî misoger bikin.

Bi taybet ew ên ku ji bo armancên ramyarî û aboriyî tên bikaranîn. Çimkî wekî mînak, tevî siyaseta çewsandinê ya Dewleta Tirk der heqê gelê kurd de, lê nikarîbû dijminatiyeke kûr di navbera civaka kurd û tirk de çêke. Ji ber ku em pirî caran gelek payebilindên îdeolojîk yên mirovî di civaka tirk de dibînin, bervaniyê di ber doza gelê kurd de dikin û li kêleka wî tev li têkoşînê dibin. Her wiha Tevgera Azadiya Kurd li bakurê Kurdistanê, tu kiryarên êrîşker li dijî civaka tirk pêk nanîne. Li kêleka vê yekê jî rola civaka

sîstema globalîzasyonê ya ku weke têgeh piştî şoreşa hevpeywendiyan ya elektronîk derket, şîrove dikin. Weha tê şîrovekirin: Prosesa kontrolkirinê ye û danîna zagonan ku cîhanê dike gundekî biçûk. Herwiha bişaftina çand û nasnameyan û tinekirina cihêrengî û cuhdabûnê, ji ber ku her dem zalîtî ji yê herî bihêz re ye, bi taybet hêzên sermayedar...

kurd di dîroka ramyarî, aboriyî, çandî û leşkerî di çarçoveya serdema Osmanî û dewleta Tirk ya nûjen de. Dewleta Tirk nikarîbû şerê xwe bi Tevgera Azadiya Kurd re ber bi şerekî nijadî ve di navbera civaka kurd û tirk de dehf bide. Dixuye ku hewldana payebilindên herdu civakan li pey projeyeke aştiyê, dê erêkirineke giştî bi dest bixe. Mijara ku dê gelek şer û janan li Rojhilata Navîn bi dawî bike û dê bandoreke erênî li aştî û ewlehiya navneteweyî û herêmî bike. Heman xal ji bo civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê derbasdar e, ku nekete nav şerê di navbera komikên paşverû û desthilata navendî de şerê li ser desthilat û dewlemendiyê.